# FELSEFEVAN

## kovara felsefî, ramanî û zanistî

hejmar 3, sal 1, tîrmeh-tebax-îlon




**deng û rengê felsefe û zanyariyê**

**KOVARA FELSEFEVAN**

**Kovara felsefî, zanistî û ramanî**

Xwedî û berpirsiyarê giştî

**Ali Gurdilî**

*Chef Edîtor*

**Ali Gurdilî**

Hejmar 3, Sal 1

Tîrmeh, Tebax, Îlon 2015

Sêwirandina berg û rûpelan: Weşanên Felsefevan

Berg: Plato and Aristotle, Raphael

E-peyam: felsefevan@hotmail.com



# BIBE ABONEYÊ KOVARA FELSEFEVAN

Heke hewesa te li ser felsefe, civaknasî, psîkolojî, lêkolîn, mîtolojî, aforîzma, hevpeyvîn, zanist û hwd. hebe û bixwazî ku bi zarê xwe yê şîrîn û zimanekî herikbar haya te ji wan mijaran hebe, pêşniyazeke me heye; ji kerema xwe bibe aboneyê Kovara Felsefevan.

Abonetiya ji bo salekê/salewext (çar jimar) 40 TL û ji bo Ewropayê jî 40 € ye.

Bo têkilî: felsefevan@hotmail.com

Buhayê Kovarê: Li Kurdistana Bakur û Turkiyeyê: 10 TL û ji bo Ewropayê jî, 10 € ye.

facebook: https://www.facebook.com/KovaraFelsefevan

twitter: https://twitter.com/KovarFelsefevan

Malper: www.felsefevan.org

Hotmail adres: felsefevan@hotmail.com



*Eger destêm bighê çerxa felekê*
*Ez ê gelek tiştan bipirsim ji wê:*
*Te bi yekî daye sed cûre nîmet*
*Bi yê din nanê ceh, alastî bi xwînê.*

*Baba Tahirê Uryan*

**NAVEROK**

2- Ji Edîtorê Kovara Felsefevan
3- Di Nêrînên Foûcaûlt de, di Çarçoveya Têkiliya Îktîdar û Şîdetê de, Têgeha Girtîgehê| Mûrad Dildar
14- Thomas Hobbes| 1588-1679
15- Dewlet û Kurd| Ali Gurdilî
24- Empedokles| B.Z. 490-430
25- Perspektîfa Giştî a Hegel, Feuerbach û Marx| Çore Arda
35- Anaksîmandros| B.Z. 610-547
36- Afirandina Dinê| Zeynelabidîn Zinar
43- Demokrîtos| B.Z. 460-370
44- Veguherîn| Newaf Mîro
49- Anaksîmenes| B.Z. 585-525
50- Bi Kurtî Li Ser Etymologiya Dewletê| Sultan Arslan
62- Ibnî Xeldûn| 1332-1406
63- Di Dîrokê de Bêedebiya Saziya Siyasetê û Bêtalihiya Felsefeyê|Mahmut Ozçelik
75- Ibnî Sîna| 980-1037
76- Dewleta Neteweyî û Bidestxistina Mafê Çarenûsiyê| Bengîn Amedî
80- Mele Seîdê Kurdî| 1878-1960
81- Xweza û Dewlet| Orhan Agirî
85- Williamê Okhamî| 1285-1347
86- Têgeh û Pirsgirêkên Felsefeya Siyasetê|Ali Gurdilî
93- Felsefeya Siyasetê Çi Ye?| Kêmzan Bêwar
99- Ziman û Hizir: Du Regezên Pêkve Girêdayî| Tengezar Marinî
113- Hevpeyvîn bi Zeynelabidin Zinar re |Ali Gurdilî
134- Civaknasî: Pênase, Nûve û Taybetmendiyên Dewletê
133- Xoşewîst Augustînus| 354- 430
135- Psîkolojî: Sigmund Freud û Psîkanalîz
137- Ferhengoka Felsefeyê (3)

# JI EDÎTORÊ KOVARÊ

Merheba ji we re...

Bi hejmara xwe ya sêyem, em dîsa li pêşbêrî we ne. Di serî de, li ser navê xebatkarên kovarê; ji bo xwendin, piştgirî û xwedîlêderketina we, ez gelekî spasiya we dikim û dibêjim ku hûn her hebin. Niha em keyfxweşî û şanaziya weşandina hejmara xwe ya sêyem dijîn. Bi rastî jî, em êdî dikarin bibêjin ku Kovara Felsefevan, di kovargeriya kurdî de cihê xwe girtiye û dê karê xwe ê weşanê, bi berdewamî bidomîne.

Tu guman nîne ku ev yek, bi saya piştgirî û xwedîlêderketina we xwînerên hêja û kurdîhezan pêk hatiye.

Wekî zanîna we ye du (2) hejmarên me yên berê, me li ser navê *Weşanxaneya Na* ê dabû weşandin. Lê me biryar da ku em kovarê êdî li ser navê xwe biweşînin û berpirsiyariya wê ya fermî jî, bigrin ser xwe. Lewma jî, me dawî li hevkariya xwe ya *Weşanxaneya Na* ê anî û ji îro şûnde, karê belavkirina kovarê jî, dê em ê bikin.

Di vê hejmarê de, me cih da felsefeya siyasetê û pêdivî yan jî nepêdiviya dewletê û têkiliya kurdan ya bi dewletê re.

Di vê hejmarê de, gelek nivîskarên me yên hêja bi gotarên xwe yên xwerû beşdarê vê hejmara me bûn, mala wan ava. Di vê hejmarê de dîsa me cih da çend mijarên civaknasî û psîkolojiyê jî. Herweha, di dawiya kovarê de dîsa Ferhengokeke Felsefeyê cih digre û dê em ê, xebatên xwe yên bi vî rengî bidomînin.

Bi hêviya xwendin, têgihiştin û nirxandinên baş û serkeftî.

Heta hejmareke din bimînin di xêr û xweşiyê de...

# Di Nêrînên Foûcaûlt de, di Çarçoveya Têkiliya Îktîdar û Şîdetê de, Têgeha Girtîgehê

**Destpêk**

Di siyasetê de û girêdayî wê di felsefeya siyasetê de têgeha îktîdarê (desthilatî), têgeheke gelek girîng e. Bi wateya giştî di maneya 'bidestxistina hêzê' de ye û li her ciyê ku dewlet an pergaleke siyasî lê hebe ev têgeh derdikeve pêşberî me. Otorîte û pergala siyasî ya heyî, ji bo îsbatkirina hebûn û hêza xwe, îktîdara ku li ser 'bindestan' tê li dar xistin, di roja me de jî, hema bibêje di her qadê de û bi rêbazên cuda xwe dide hîskirin. Yek ji van rêbazan jî <şîdet> e. Îktîdar li ser navê 'terbiyekirina bindestan', tu carî ji bikaranîna şîdetê dûr nemaye. Di vê xebatê de, li gorî fikir û ramanên Foucault, îktîdar şîdetê çawa bi kar tîne, têkiliya îktîdar û şîdetê çawa ye, ev têkilî di kîjan pêvajoyan re derbas bûye, em ê hemûyan li ber çavan raxin.

**I. Îktîdar û Şîdet**

Îktîdar çi ye? Yek ji bersivên vê pirsê ev e: 'Hêzeke siyasî, huqûqî yan ehlaqî ye ku derfeta bikaranîna bandor an çalakiyan dide. Wek formel, ew hêz û qudret e ku A tiştê ku B naxwaze bike, bi B yê dide kirin.' *(Cevîzcî, 2005)*

Di vê pênaseyê de, têgeha bingehîn a ku tê destnîşankirin, têgeha 'hêz' ê ye. Di warê siyasî de, sebeba herî girîng a bikaranîna vê hêzê ya hêza rêvebiriyê bi dest dixin, yanî yên îktîdarê bi dest dixin, parastina hêza heyî û lêzêdekirina vê hêzê ye. Ji bo parastina vê hêzê rêya herî sereke ev e ku ji

holê rakirina ûnsûrên ‘xeternak’ an dikarin bibin xeternak, e. Ji bo ji holê rakirinê, rêya herî zêde tê zanîn jî şîdet e.

Weke rêxistineke siyasî, ji roja dewlet derketiye meydanê û heta îro, hema bibêje hemû îktîdaran şîdetê bi kar anîne û di bikaranîna vê rêbazê de tu astengî nedîtine. Girêdayî pênaseya ku me di paragrafa pêşîn de kiribû, îktîdar gava bixwaze bi zorê tiştekî bi kesên di bin desthilatdariya xwe de ne bide kirin, rêbaza herî pêşîn şîdet bûye.

Li gorî fama huqûqa dewra ku Foucault wê wek çaxa Klasîk bi nav dike (hema bibê ji nîveka sedsala 17an heta dawiya sedsala 18an didome) û kêm zêde bi pergala monarşiyê re li hev dike, taybetmendî û hedefa wî çi dibe bila bibe, sûcê li hemberî qanûnê tê kirin, di rastiyê de li hemberî hukumdaran hatiye kirin. *(Keskîn 1996)*

Sûc li ser vî asasî dihatin bicîkirin, sebeb jî ew bû ku di wê dewrê de yê ku qanûnan çêdikir hukumdar bi xwe bû. Qanûn û yê qanûnê çêdike bi vî awayî dibin yek, dîsa destnîşan dike ku avakarê qanûnan yanî hukumdar, li her ciyê ku qanûn lê derbas dibe heye. Bi vî awayî jî qada bandora hukumdar, yanî îktîdarê hatiye firehkirin. Ji ber ku qanûn û îradeya hukumdar heman tişt in, û ji ber ku hêza qanûnê bi heman awayî hêza hukumdar e, sûcdar hem bi awayekî kesî hem jî bi awayekî fîzîkî êrîşî hukumdar dike.

Ji ber wê jî înfazên li pêşberî gel dihatin kirin, dihat wê maneyê ku xisara gihîştiye îktîdarê dihat tamîrkirin û serdestiya îktîdarê dihat pejirandin. *(Keskin 1996)*

Sûcê li hemberî qanûnan, wek êrîşeke li hemberî hukumdar dihat qebûlkirin. Sebeba wê ya herî girîng ev bû ku gava te qanûnan nas nekira dihat wê maneyê ku tu îktîdara hukumdar jî nas nakî. Gava kesekê sûcek bikira û qanûnan binpê bikira, dihat wê maneyê ku hem hukumdar, hem qanûnên hukumdar hem jî îktîdara hukumdar nas nake.

Ji ber wê jî binpêkirina qanûnan, li dijî îktîdarê çalakiya herî xeternak e. Ji ber ku dewlet û hukumdar di heman wateyê de ne, divê cezayê sûc jî li gorî <mezinbûna> dewletê be. Di çaxa navîn de serên jêkirî yên mirovan bi dîwarê kelehan ve dikirin, bedenên kesên kuştî li meydanên bajaran nîşanî gel didan… û hwd. Mirov dikare bûyerên bi vî rengî wekî mînak nîşan bide. Ev rêbazên cezakirinê herçiqas nîşana sedsalên 17 û 18an bin jî, di roja me de jî hinek dewlet rêbazên cezakirina li meydanan bi awayekî berfireh bi kar tînin. Komara Îslam a Îranê, cezayê îdamê dide Kurdan, li meydanên bajaran li pêşberî qelebalixên mezin bi kar tîne, ev jî nîşan dide ku ev rêbaza cezayê hîn jî didome.

Meriv dikare xebata ***Foûcaûlt*** a li ser girtîgehan, ***Avakirina Girtîgehan***, wek dîroka şîdetê binirxîne. Ev xebat li ser sîstema cezaya modern a bi piştgiriya dewletê lêkolîneke dîrokî ye. *(Oksala, 2012)*

Berhema bi navê ***Avakirina Girtîgehan***, bi analîzeke li ser îşkenceyên li ***Damîensê*** sûîkastvan hatine kirin dest pê dike. Li gorî biryara dadgehê divê bi maşeyên sorkirî ji gelek ciyên canê ***Damîens*** goşt bên jêkirin, destê wî yê kêr girtibû divê bi sulfurê bê şewitandin, divê guleyên helandî, rûnê sorkirî, reçîneyên agirpêketî, şimayê helandî û sulfur bera ser ciyên

ku goşt jê hatibûn jêkirin bidin, divê paşê bedena wî bi hespa ve bê girêdan û bê parçekirin. Divê parçe bên şewitandin û wan bikin xwelî û herî dawîn jî divê xweliyê bidin ber bayê û tune bibe. *(Foûcaûlt, 2000)*

Ev cûreyên îşkenceyê ku li hemberî cezakirina bedenê mînakên herî dijwar in û mînakên cezakirina li pêşberî gel, piştî nîveka duyem a sedsala 18an hêdî hêdî kêm dibin. ***Foûcaûlt*** raçav dike ku, piştî nîveka duyem a sedsala 18an bi awayekî cîdî, li hemberderketina înfazên li pêşberî gel û îşkenceyan zêde dibin. Cezakirina ji îşkenceya li ser beden hatiye dûrxistin, yanî daxwaza nekirina îşkenceyê, li ser bingeha hurmeta <însaniyeta> girtî weke reformekê tê binavkirin. Li gorî Foûcaûlt, ev li hemberî qada cezakirina îktîdarê, sînoreke qanûnî ye. Bi vî awayî 'mirov' di heman demê de dibe sînorê îktîdarê. Di vê xalê de Foûcaûlt, lêpirsîna sebeba berteka li hemberî îşkenceyê û israra mijara ku divê ceza 'însanî' be, dike.

*Wateya rêgeza pîvana cezaya ku divê 'însanî' be çi ye?*

Bersiva vê pirsê, meriv encax bi têgihiştina pêvajoya tevgera reformê dikare bide. Di vê pêvajoyê de, sûc her çûye kêmtir şîdetê di xwe de hewandiye, li hemberî wê jî ceza nermtir bûne. Lê berdêla vêya ev e ku îktîdarê li ser civakê mudaxeleyeke xurt û kûr kiriye. *(Keskîn, 1996)*

## II. Avakirina Girtîgehan

Ber bi dawiya sedsala 18an ve, êdî rêbazên cezakirinê, di şûna ku li meydanên bajaran li pêşberî gel bê kirin, veguheziye ser rêbazên ku veşarî dihat kirin û wek dem jî

bikaranîna xwe li demeke dirêj belav dikirin. Ji bo bikaranîna van rêbazan jî mekanên herî musaît, bêguman girtîgeh bûne. Li gorî Foûcaûlt, girtîgeh cara pêşîn di vê demê de derneketine meydanê. Lê, di warê taybetmendî û armanca bikaranînê de, bûne xwediyê erkeke nupînû. *(Foûcaûlt, 2000)*

Bi girtîgehan re, rêbaza cezakirina îktîdaran jî guheriye. Rêbazên cezakirina li meydanên bajaran a bi bikaranîna şîdetê ya li ser bedenên mirovan vediguheze ser 'şîdeteke dîsîplînkar' a di nav girtîgehan de. Li gorî Foûcaûlt her çiqas di terza cezakirinê de ev guhertin çêbûbe jî, berê şîdetê ji ser bedenê veguheziye ser ruhê mirov. 'Êş û jana fîzîkî' ciyê xwe daye 'êş û jana ruhî.' *(Foûcaûlt, 2000)*

Berê şîdet û cezayê, ji bedenê ber bi ruh ve veguheziya. Ev rasterast bi xebatên wê dewrê yên psîkolojîk û psîkîyatrîk ve jî eleqeder e. Foûcaûlt îddîa dike ku, di serê sedsala donzdemîn de, gava psîkîyatrî tevlî nav qada huqûqê bû, di huqûqa cezayê de, giringî ji ser sûc hêdî hêdî vediguheze ser sûcdar. Yanî fikrê 'kesê xeternak' derketiye holê, ji bo kes dibe wek xeternakek potansiyel, ji ber wê hedefa sîstema cezayê êdî ne cezakirin e, ya herî girîng başkirina kes e. *(Oksala, 2012)*

Armanc ew e ku bi cezakirina bi êş û jana ruh û di girtîgehan de dûrxistina ji mirovên din, terbiyekirina ruhê mirovê sûcdar, baqilkirin û dîsîplînekirin e.

Foûcaûlt di axaftina xwe ya bi navê ***'Xeleqên Îktîdarê'*** de, avakirina girtîgehan wisa îzeh dike: *'Ez qesta sîstema girtîgehan dikim, bi derengî ava bûn, hema bibêje di dawiya sedsala*

*hîjdemîn de ava bûn. Berî dawiya sedsala hîjdemîn girtîgeh, ne cezayekî qanûnî bû. Ji bilî rewşên îstîsnaî, sûcdar; bi tenê heta doz li wan bihatana vekirin li wê derê dihatin girtin.*
*Yanî ne ji bo cezakirinê. Wek sîstemeke pêkutiyê girtîgeh bi vê hincetê hatin avakirin: Girtîgeh wê bibe ciyê sîstema ji nû ve perwerdekirina sûcdaran. Girtîgeh jî wê heman bibe wek saziyên eskerî û dibistanê, kesê di wir re derbas bibin wê bibin hurmetkarê qanûnan. Ji ber wê jî bi razandina girtîgehê, dixwestin kesên îteatkar derxin meydanê.' (Foûcaûlt, 2014)*

Mumkun e ku meriv li girtîgehên Tirkiyê jî rastî polîtîkayên 'kedîkirina di tîpa eskerî û dibistanan de' ya ku îktîdar di girtîgehan de bi kar tînin, were. Bi rêbazên îşkenceyên ku di salên 80yî de dihatin bikaranîn, girtîgeha Diyarbekirê ji bo vêya mînak e. Li Girtîgeha Diyarbekirê, ku pirraniya girtiyan Kurd bûn, her sibe talîma eskerî bi girtiyan didan kirin, marşên eskerî didan gotin, marşa Îstîklalê didan jiberkirin. Armanca wan ew bû ku bi vê rêbazê, Kurdên serî hildidan û li hemberî dewletê derdiketin bikirana 'welatiyekî/e baş yê/a Tirk.' Yanî bi gotina Foûcaûlt ew ê wan bikirana keseke hurmetkarê qanûnan.

Foûcaûlt di pirtûka bi navê ***'Çavê Îktîdarê'*** de, hîpoteza ku girtîgeh ji serî ve projeyeke ji bo veguhestina mirovan e diparêze: Bi giştî jê tê bawerkirin ku girtîgeh, xurdexaneyeke wisa ye ku ji sûcdaran pêk tê. Ji ber ku çiqas tê bikaranîn astengiyên vê xurdexanê derdikevin meydanê, her tim tê gotin ku divê ji bo girtîgehan reform bêne kirin, divê girtîgeh ji bo veguhestina mirovan bibin amûrek.
Ev ne rast e. Bername û diyarkirinên niyetan li pêşberî min disekinin. Divê di serî de girtîgeh jî wek dibistanan, wek

qişleyan, wek nexweşxaneyan bûbûna pergaleke teqûz û divê li ser kesan bi hûrgilî bisekiniyana. *(Foûcaûlt, 2012)*

Meriv dikare armanca ku, girtîgeh ji bo veguhestina mirovan pergaleke bêhempa ye, di hinek planên mîmariya girtîgehên navdar ên di pirtûka bi navê ***Avakirina Girtîgehan*** a Foûcaûlt de hatine belavkirin de bibîne. Ji planên mîmariyên van girtîgehan jî gelek eşkere xuya dibe ku, girtîgeh ne avahiyên ji rêzê ne. Xwestine ku îktîdar û pêkutiyê, di her quncikê van avahiyan de bi mirovan bidin hesandin. Qûleyên çavdêriyê, li nîveka hucreyên ku <sûcdar> lê dimînin, di xaleke serdestê hemûyan de hatine çêkirin. Ev sîstem û sîstema **<*Big Brother*>** ku Orwell di romana xwe ya **<*1984*>** an de behs dike, hema bibêje heman tişt in. Armanca wan ew bûye ku di avahiyên wisa de, bi mirovan bidin hîskirin ku her tim tên kontrolkirin û dibin çavdêriyê de ne.

Di van girtîgehan de, têkiliya mirovên ku di hucreyan de bi tenê dimînin, hema bibê bi "sûcdar"ên din re tune ye. Armanca wê jî ew e ku, mirovên di nav girtîgehê de him ji dinyaya derve qut bikin, him jî ji mirovên din ên girtîgehê dûr bixin û wan <dîsîplîne> bikin.

Li Tirkiyê jî di salên 2000î de hat xwestin ku, ji sîstema qoxûşan derbasî sîstema hucreyan bibin, lê ev biryar, rastî berxwedaneke cîddî ya girtiyên siyasî hat. Bi biryara Wezareta Adaletê, bi operasyonên bi navê **<*Vegera li Jiyanê*>** bi zorê ketin girtîgehan û girtî bi rêbazên dijî mirovatiyê, neqlî hucreyên yekkes û girtîgehên ***Tîpa F*** kirin. Di dema van operasyonan de, ji girtiyan hinek bi gazên jahrê hatin

kuştin, hinek jî bi awayekî zindî hatin şewitandin û 32 kesan jiyana xwe ji dest dan.

Li gorî Foûcaûlt, di dîroka pêkutiyê de, ji cezakirinê derbasbûna çavdêriyê demeke navendî ye. *(Foûcaûlt, 2012)*

Hêmana bingehîn a ku vê guhertinê dike navendî, di guhertina nêzîkbûna mirovan û rêbaza nirxandina mirovan a îktîdarê de veşartiye. Wek ceza taxrîbkirina bedenê û li ser bedenê bikaranîna şîdetê, şûna xwe dide rêbazên ku ji qûleyên çavdêriyê şopandina tevgerên mirovan. Ji bo vêya hewce nake ku mirovan têxin girtîgehê, têxin nav çar dîwaran jî. Di romana bi navê <***1984***> a ***George Orwell*** de ku wek mînakeke dîstopyayê ye, partiya ku serdest e, çavdêriya wext û tevgerên mirovan dike, çi wext ew ê çi bikin, bi biryara wan e. *(Orwell, 2000)*

**<*Biraderê Mezin (Big Brother)*>** ê ku di pirtûkê de behsa wî tê kirin, dîktatorekî wisa ye ku li ser her tiştî desthilatdariyeke mîsoger pêk aniye. Bi rêbazên ku bi kar tîne, yekane serok e û rejimeke otorîter a gelek tund ava kiriye. Bi wesiteya ku partiya ava kiriye, dixwaze teşe bide mirovan û bi vî awayî desthilatdariya xwe pêk bîne, pergaleke pir tund ava kiriye.

Rêgez û qanûnên ku hatine amadekirin, hinek car li gorî dîn, hinek car li gorî mantiqê hinek car jî li gorî zanistê hatine amadekirin. Hinek caran jî bi temamî li gorî hewcedariyên civakê hatine sêwirandin. Bi çi awayî dibe bila bibe, ev rêgez gelek tund in û divê herkes li gorî van rêbazan bijî. Li ser çi asasî dibe bila bibe, hemû ji îradeyekê yan jî ji ramanên kesên

girêdayî îradeyekê derketine û bi temamî ji bo civakê têxin nav qalibekê hatine avakirin.

Gava meriv li armancên wan dinêre, ya herî berbiçav, dixwazin pergaleke li gorî ku civak bê qeyd û şert, stûxwar bike amade bikin. Meriv dikare ji vê derê encameke wisa derxe: Daxwaza qanûnên roja me jî heman tişt e. Lê îro ev fam şekil guhertiye, şûna xwe daye armanceke ku zîhnîyeteke zana, lê serî ditewîne biafirîne. Zorê didin kesên di bin desthilatdariya wan de dijîn ku ji bo wan bifikirin, yan jî hewl didin ku li gorî fama rêvebiriyê tevbigerin, heta mafê fikir û ramana van mirovan jî tune.

Bi vî awayî hewce namîne ku mirov ji bo tu tiştekî serê xwe biêşîne. Lewra partî ji bo her tiştî di şûna mirovan de difikire. Partî mudaxeleyî jiyana rojane, rêgezên kar, sîstema dadê, tevna medyayê û têkiliyên di navbera mêr û jinê de jî dike ku ya herî balkêş jî ev e. *(Orwell,2000)*

Di vê romana ku îktîdar û raçavkirin bi awayekî herî tund tê vegotin, armanca îktîdarê ew e ku li ser mejû û bedena mirovan desthilatdariya xwe qewî bike û bi vê rêyê mirovan <kedî> bike û ji bo civakê mirovên îteatkar pêk bîne. Yanî welat veguheziye ser girtîgeheke mezin.

Li gorî Foûcaûlt bandora girtîgehan a li ser mirovan, bitenê li hundirê girtîgehê namîne. Gava yek têkeve girtîgehê, piştî wê demê ji bo wî kesî bikin yekî kirêt, di gavê de mekanîzmayek dixebite. Gava derdikeve jî, ji bilî ku mêla xwe bavêje ser sûcdariyê çareyeke din jê re namîne. Ji bêgavî

xwe davêje nava sîstema ku wê ew bike muxbîr an jî polês. Girtîgeh profesyonelan digîhîne. *(Foûcaûlt,2012)*

Ji ber ku civak kesên ji girtîgehê derdikevin nagire nava xwe, wan ji xwe bi dûr dixe, nîşanî me dide ku 'êş û jana ruhî' ya ku Foûcaûlt ji me re behs dike, ne bitenê di nav girtîgehê de, piştî ku ji girtîgehê derdikeve jî didome. Kesên ji girtîgehê derdikevin nikarin bi hêsanî kar bibînin, nikarin bi mirovan re têkiliyê deynin, nikarin di nav civakê de bi aheng bijîn.

Ev jî nîşanî me dide ku civak wî/ê kesî/ê mor dike. Ev jî nîşanî me dide ku girtîgeh ji armanca xwe ya avakirinê yanî ji <dîsîplînkirina kesan û ji nû ve qezenckirina ji bo civatê> çiqas bi dûr ketiye.

**Encam**

Têgeha Îktîdarê, têgeheke wisa ye ku li her ciyê ku rêxistineke siyasî lê hebe tê dîtin û derdikeve pêşberî me. Avakirina girtîgehan ku ji bo îktîdar hêza xwe nîşan bide û hêza xwe bide hîskirin ji qadên herî girîng yek e. Berî sedsala 18an rêbaza cezakirina mirovan li ser bedena mirovan bû, ji dawiya sedsala 18an û pê ve, îktîdarê di rêbaza cezakirinê de veguhestineke pêk aniye. Di vê veguhestinê de xala herî girîng, guhertina qada ku şîdet lê tê kirine. Berê li ser bedena sûcdaran şîdet dihat kirin û hewl didan ku sûcdar ji holê rakin.


Gava sûcdar ji holê rabûya wê sûc jî ji holê rabûya û wê cezakirin, bigihîşta armanca xwe ya herî rast. Lê paşê cezakirina ser bedenê berê xwe bi ser ruh ve guhertiye û bi gotina Foucault 'êş û jana bedenê' ciyê xwe daye 'êş û jana

ruhî.' xwestine ku mirovên li girtîgehan dicivandin, di bin çavdêriyê de 'dîsîplîne' bikin. Bi vî awayî îktîdarê xwestiye ku desthilatdariya xwe ya li ser 'sûcdar' an, hinek din demdirêj bike. Di roja me de jî, di xala ku em niha hatinê de, tê dîtin ku mekanîzmayên kontrola li ser mirovan a îktîdarê ne bitenê di nav girtîgehan de, di her qada jiyanê de derdikeve pêşberî me. Yanî her qada di bin desthilatdariya îktîdarê de, bûye weke girtîgeheke mezin.

**Mûrad Dildar**
muraddildar@gmail.com
18.06.2015

***Çavkanî***

***1-*** *Foucault, Michel (2000) Hapishanenin Doğuşu, wrg. Mehmet Ali Kılıçbay, Weşanxaneya Îmge*
***2-*** *Foucault, Michel (2012) İktidarın Gözü, wrg. Işık Ergüden, Weşanxaneya Ayrinti*
***3-*** *Foucault, Michel (2014) Özne ve İktidar, wrg. Işık Ergüden, Osman Akınhay, Weşanxaneya Ayrinti*
***4-*** *Keskin, Ferda (1996), Foucault'da Şiddet ve İktidar (Gotar), Kovara Cogito , Weşanxaneya Yapı Kredi*
***5-*** *Oksala, Johanna (2012), Devlet Şiddetinin Yönetimi (Gotar), Kovara Cogito , Weşanxaneya Yapı Kredi*
***6-*** *Orwell, George (2000) 1984, wrg.Celal Üster, Weş. Can*



Cîsima herî çêkirî, dewlet e. Dewlet, ji pêvçûna mirovan der çûye. Çimku, mirov xweperest e û herdem ji bo berjewendiya xwe têdikoşe. Jiber vê yekê jî, bi mirovên din re pev diçe û şer dike. Lewma jî, mirov, gurên hevdu ne.

Ji ber vê yekê jî, divê ku saziyeka hemû mirovan bîne rêzê, hebe û dewlet ji vê bêgavîtiyê derketiye holê. Tiştê ku ji bo dewletê bi kêr tê, baş e û tiştê ku bi kêr nayê jî, xirab e.

**Thomas Hobbes | 1588-1679**

# Dewlet û Kurd

Kurd, yek ji wan neteweyên cihanê ê kevnare ne û xwediyê mafê xwestina (bidestxistina) dewleta xwe ne. Dagirkirin û perçekirina Kurdistanê, rê li ber vê xwestek (felsefeyê) negirtiye û nagre jî. Fikra dewleta kurd, ne nû ye. Peymana ***Qesra Şîrîn*** ku yekem car ***Kurdistan*** bi vê peymanê hatiye perçekirin, ji aliyê nemir ***Ehmedê Xanî*** ve wiha hatiye zimên.

*Tasek ji vê ava zelal*

*Nadim bi hewza Kewserê*

*Levhatina Qesra Şîrîn*

*Jê nabînim tu meferê*

*Piştî roja me bû tarî*

*Mirin xweş e ji emberê.* (1)

Herweha, di dîroka siyasî û ramanî ya kurdan de, kesê ku cara yekemîn li ser pirsa avakirina dewleta kurdî rawestiyaye û pêwistiya vê yekê bi nêrînek zanistî raxistiye ber çavan, bêguman nemirê ***Ehmedê Xanî*** ye. (2)

Li ser pêdiviya desthilatdarî (dewleta) kurdan jî, nemir ***Ehmedê Xanî*** wiha gotiye:

*Ger dê hebûya me padişahek*
*La'iq bidiya Xwidê kulahek*
*Te'yîn bibûya ji bo wî textek*

*Zahir vedibû ji bo me bextek*

*Hasil bibûya ji bo wî tacek*
*Elbette dibû me jî rewacek*

*Xemxwarî dikir li me yetîman*
*Tînane derê ji destê le'îman* (3)

Wekî tê zanîn fikra dewleta netewî, bi taybetî piştî ***Şoreşa Fransî (1789)*** dest pê kiriye. Lê beriya gelek feylesof û ramangiran, nemir ***Ehmedê Xanî*** bala kurdan daye ser vê mijarê û pêdiviya dewleta kurdan, destnîşan kiriye. Kurdan, di seranserê dîrokê de xwesteka xwe ya avakirina dewleta milî/netewî ti caran wenda nekirine û ji bo vê yekê jî her dem têkoşiya ne. Bêguman divê meriv hêza dijminên kurdan jî, di vê xalê de ji bîra neke, ku kurdan li hemberî çar dewletên dagirker li ber xwe dane û hêjî li ber xwe didin. Nexwe, ti kes nikare sedan ferman, qirqirin, koçberî, îşkence, tahde û zordestiyan, bi sedemên cihê şirove bike.

Sedema bingehîn ya zilm û zordariya li kurdan hatiye kirin, vegirtina welatê wan e, xwesteka wan ya nîrxên xwe yên milî (netewî) ye. Li ser vê mijarê meriv dikare niha behsa bi sedan serhildanên kurdan bike, ku bi şîdet û xwînê hatine dewsandin.

Tenê, wekî mînak dixwazim behsa ramana ***Evdirehîm Rehmî,*** nivîskar û hozanê kurd bikim. ***Evdirehîm Rehmî*** di ***26/1/1919*** an de, di ***Kovara Jîn***, jimare 9, Rp: 15-16 ê de weha gotiye: *'Îroke di qelbê me hemîyan evînîyek heye, agirek heye ku em daîma bi wê eşqê, bi wê evînê disojin, diqelin û ji ber wî agirî*

*em ne xwedanmal in, ne xwedankur in, ne xwedanheyat in. Welhasil hemî tiştê xwe em hazir in di wê rêda bidin. Ew çi eşq e, çi evînî ye? Elbet ew evînîya welat e.'* (4)

Rast e ku kurdan ji bo welatê xwe bedelên mezin dane û hêjî didin. Lê beyî ku ez fikr û ramanên xwe yên derbarê dewletê de, bi berfirehî aresteyî we bikim, dixwazim hebekî dewletê pênase bikim û behsa dewletên kurdan bikim.

Wekî tê zanîn dewlet, saziya herî mezin û çalak ya civakî ye. Ji aliyê mirovên ku girêdayê desthilatdariyeka raser in û li ser axaka ku sînorên wê diyar in, tê avakirin. Erka wê ya herî mezin, parastina sazûman (sîstem) û serweriya civakê ye, bi taybetî jî li hemberî civakên din yên biyanî. Herweha, xwediyê yekîtiyeke hiqûqî û siyasî ye jî.

Dewlet, piştî ku mirov li ser axê bi cîh bûne û di navbera wan de têkiliyeka rêveberiyê destpêkiriye, derketiye holê. Di civakên hoveber de, ji ber ku navendeka hêza serpereştiyê (rêveberiyê) û desthilatdariyeka sîyasî tunebû, dewlet ne hatine avakirin.

Di eşîretan (êlan) de ku yekemîn civaka bicîhbuyî ne, ***prototîpa*** dewletê derketiye holê. Li bajaran jî, bi hemû saziyên xwe yên bingehîn û erkên xwe re, dewletên bajarî derketine holê.

Ji bo avakirina dewletê meriv dikare bibêje ku sê hêmanên (nûve/unsûrên) bingehîn pêwîst in, ku ew jî ***gel, welêt*** û ***serwerî*** ne. Gel, ew civatok in ku li hawirdorê desthilatdariyeke siyasî top bûne ne. Welat, ev der û axa ku gel, demekê dirêj li ser jiyaye, ye.

Serwerî jî, desthilatdariya sîyasî a ku li ser axa gel, serweriya gel temsîl dike, ye. Ev hêz, ji aliyê hiqûmetan ve têne bikaranîn.

***Taybetmendiyên Dewletê***

***1-*** *Dewlet saziya herî mezin, birêxistî û çalak ya civakî ye, ku berdewamî û sazûmana civakê diparêze.*

***2****- Serweriya xwe, bi riya bikaranîna sê wezîfeyan pêk tîne. Ev wezîfe jî* ***rêvebirin, zagonçêkirin*** *û* ***darazdanî*** *ne.*

***3-*** *Dewlet li hemberî xeteriyên ji hindûr û der, dikare hêzeka ku xwe dispêre darê zorê, bikar bîne.*

***4-*** *Dewlet bi nêzîkayîtêdaneka sazgêr; ji hêla sosyo-kulturî, siyasî, edalet, perwerdehî, pirsgirêkên hawirdorî û hwd. ve, jiyana civakî qontrol dike.*

***5-*** *Dewlet, têkiliyên saziyan sererast dike.*

***6-*** *Endametiya şexsan ya dewletê, tiştekî bivênevê ye û ev endametî bi rêya gurza hemwelatîbûnê pêk tê. Mafê hemwelatîbûnê dema ku rewş rê didin bi biryara rêvebirinê tê bidestxistin, an jî windakirin.*

Gelek texlîdên/cureyên dewletê hene; yên wekî dewleta unîter/yek dewlet, dewleta federal, demokratîk, teokratîk, laîk, otokratîk û hwd. (5)

Têkiliya kurdan ya ligel saziya dewletê, meriv dikare bibêje ku gelekî kevn e. Helbet dema ku em dibêjine dewlet, divê meriv ji vê gotinê rasterast dewletên îroyîn fêhm neke. Helbet, her dewlet wiha bi derbekî bi pêş nakeve û berfireh nabe. Bi demê re, dewlet xwe temam dikin û dibine weke saziyên mayende û hêzdar.

Di seranserê dîrokê de meriv dikare behsa qasî 25 dewletên kurdan bike ku jiyana xwe demekê dirêj berdewam kirine.

Ev dewlet jî yên wekî *Dewletên Hurrî (Ji dehan zêdetir bajardewlet-B.Z.2500-1400an), Dewleta Gutî (B.Z.2700-1070an), Dewleta Sûbarû (B.Z.4000-3000an), Dewleta Lûlû (B.Z.2800), Dewleta Mîtannî (B.Z.1500-1250), Dewleta Kassîd (B.Z.1595-1207), Dewleta Ûrartû (B.Z.860-580), Dewleta Medyayê (B.Z.727-550), Dewleta Komaganê (B.Z.162-17), Dewleta Bûweyhî (933-1062), Dewleta Bawendî (665-1349), Dewleta Ziyarî (927-1090), Dewleta Kengarî (916-1090), Dewleta Kekûyî (1008-119), Dewleta Eyûbî (1169-1400), Dewleta Şedadî (951-1174), Dewleta Rewadî (970-1071), Dewleta Hesenweyhî (959-1015), Dewleta Zend (1750-1797), Dewleta Gor (1030-1215), Dewleta Merwanî (372-478), Dewleta Dostikî (983-1085), Komara Kurdistana Mehabadê (1946-1947),* ne. (6)

Felsefeya kurdan ya aştîxwaz, mirov dikare bibêje ku ji aliyê ciranên kurdan ve, herdem bi awayekî xirab/neqenc hatiye bikaranîn. Pîlan û xwesteka serweriya welatê kurdan, her dem di bin kûmê biratiyê de baş hatine xebitandin û bûne sedemê hilweşandina dewletên kurdan.

Xwesteka kurdan ya avakirina dewleta xwe ya netewî, li gor bîr û baweriya min hêjî didome û ev yek, wekî felsefeya kurdan ya herî bingehîn xwe dide der. Heta meriv dikare bibêje ku hêviya wan ya herî mezin ev yek e.

Di rojeva kurdan de, niha jî nîqaşa *'gelo kurd dewleteke serbixwe dixwazin yan na?'* geş bûye û aliyên siyasî yên kurdan, derbarê vê mijarê de fikrên xwe bi eşkerayî tînin zimên. Helbet, ev nîqaş gelekî baş in, ku têne kirin. Lê ya xirab ew e ku kurd, dema ku li ser vê mijarê dikevine nîqaşê,

heqaretên mezin li hevdu dikin û ya hev bi xayîntî û nokeriyê sûcdar jî dikin. Bêguman, ev helwest ne helwestekê baş e û divê meriv, ti caran rê nede helwestên bi vî rengî. Çimku wê demê, rê li ber derbirîna fikran tê girtin û tewişandin dibe wekî ramaneka serwer ya civakê.

Di salên 1980 an de, pirraniya tevgerên siyasî yên kurdan, aligirê avakirina dewleta kurdan ya serbixwe bûn û vê yekê, bi awayekî eşkere dianin zimên jî. Belam, piştî darbeya 1980 ê îlonê, mixabin pirraniya wan hatin tesfîyekirin an jî wekî komên biçûk jiyana xwe berdewam kirin. Li gel partiyên xwe yên nefermî, bi rêya avakirina partiyên xwe yên fermî, têkoşina xwe ya li hemberî dewleta dagirkar domandin û ev têkoşîn, hêjî berdewam e. Partiyên wekî Hep, Dep, Hadep, Kadep, Hakpar, Bdp û herî dawî jî, Hdp hate avakirin. Tê gotin ku dê partiya BDP ê, piştî hilbijartinên heremî xwe tasfiye bike û tevlî Hdp ê bibe.

Helbet mafê wan e ku bi her awayî xwe birêxistî bikin û ramanên xwe bi eşkerayî bînin zimên. Kurd dê li gor fikr û tevgeran, nûnerên xwe siyasî binirxîne û deng/raya xwe jî, dê bi vî awayî bide. Berê, ji ber tahde û zordestiya dewleta dagirker, kurdan bi eşkerayî ramanên xwe nedigotin. Lê niha zagona partiyên siyasî, rê dide ku ew bi eşkarayî fikrên xwe bibêjin, bernameyên xwe deklere bikin û heta propaxandeya xwe, bi kurdî jî bikin. Bi awayekî zelal û eşkere, wê sûdewar be ku hemû partiyên siyasî fikrên xwe ji gelê xwe re bibêjin. Ev helwest, dê riya siyaseta legalî ya kurdan jî, ji hemû aliyên din re jî veke.

Di vê xalê de, dixwazim hebekî behsa gotina birêz Hatip Dicle bikim, ku beriya demekê hevpeyvînekê dabû Rojnaneya <Cumhuriyetê>. Wekî tê zanîn birêz Hatip Dicle,

nûnerê BDP ê ye û ji deh salan zêdetir e ku di girtigehê de ye. Birêz Hatip Dicle di hevpeyvîna xwe de wiha gotiye: *'Tu daxwazên birêz Ocalan û kurdan, ku zorê bidine yekîtiya Tirkiyeyê tune nin. Fikra dewleteka serbixwe, me ji zûve ye ku avêtiye serê sergoyan. Lewra 2,5 milyon kurd niha li Stenbolê dijîn, em Xwesriya Demokratîk ne tenê ji bo xwe, bo kurdên Stenbolê û tirkên ku li Meletê dijîn dixwazin.'* (7)

Helbet, rêza min ji birêz Dicle û ramanên wî re heye, ku wekî nûnerekî siyasî ramanên xwe bîne zimên. Belam, rast e ku niha nifûseke mezin yên kurdan li metropolên Tirkiyeyê dijîn. Hinekî ji wan karsaz in, karkir in, bazirgan in, mehmurên dewletê ne û hwd. Lê em dizanin ku kurd, wiha ne bi dilê xwe koçê wan deran kirine. Zilm û zordestiya li ser kurdan, têkoşîna çekdarî ya 30 salan û kiryarên dewleta dagirker, wisa kiriye ku kurd welatê xwe biteriqînin û herin bajarên tirkan.

*Di vê xalê de, têgihiştina sosyolojiya kurdan gelekî girîng e. Tevî rev û koça kurdan ya mezin jî, em dibînin ku nifûsekê mezin hêjî li welatê xwe dijîn û li benda avêtina hin gavên dewleta dagirker in.*

Ger derfeta meriv hebûya û dewletê rê bidaya vê yekê, meriv dikaribû ji piraniya kurdan bi awayekî zanistî bipirsiya ka bi rastî jî ew dewleteke xwe ya serbixwe dixwazin yanê na?

Lê em dizanin ku di bin zilm û zordestiyekê de û li devereka ku tirs lê serdest e, bi hêsanî meriv nikarin ramanên xwe bibêjin. Lewma jî, kurd ji bêgaviyê her dem xwe di bin kirasan de veşartine û gelek caran hatiye dîtin ku gotine *'Em aligirê, yekîtiya Tirkiyeyê ne, em ne dabeşkar in.'*

Lê divê neyê jibîrkirin ku welatê me kurdan hatiye perçekirin, zilm û zordarî li kurdan hatiye kirin û xwesteka

serxwebûna ***Kurdistanê*** jî nabe cudahezî an jî cudakarî. Belam, zordestiyeka wiha li kurdan hatiye kirin ku pirî caran kurd bêgav mane ku wiha bibêjin.

*Herweha, ji bo xwestina avakirina dewleta kurdan ya serbixwe, kurd ne mecbûr in ku dev ji metropolên tirkan berdin û berê xwe bidin Kurdistanê. Kurd, di heman demê de hemwelatiyên Tirkiyeyê ne û ji hemû mafên xwe yên komelî û takekesî bêpar in.*

Di avakirina Komara Tirkiyeyê de kedeka wan ya mezin heye û niha jî, xwediyê malhebûneke/sermayeyekê mezin in li Tirkiyeyê. Lê divê were gotin ku xwestin û rewşa rasteqîn jî, dibe ku ji hevdu cihê be. Lê ev yek, rastiya welatê kurdan ji holê ranake ku hatiye dagirkirin. Di demokrasiyên rasteqîn de ji xelkê tê pirsîn, ka ew çi dixwazin? Lê em baş dizanin ku li Tirkiyeyê demokrasiyek tune û rêveberiya Tirkiyeyêjî ne xwediyê wê wêrekiyê ku rabe ji tevahiya kurdan bipirse, ka *'ew çi dixwazin?'*

Xwezî, şert û mercên vê yekê hebûna û bi rêya rapirsîneke giştî, ev yek ji kurdan bihata pirsîn? Hingê, dê me karibûya li ser daneyên zanistî ramanên xwe berfirehtir jî bikira.

Mijar kûr e û sînorên vê nivîsarê jî hene. Lewma jî, dixwazim ku wekî gotina dawî vê hevokê aresteyî we bikim: *Axaka hevpar ya kurdan heye, dîrokeka wan ya kevnare jî heye û kurd, xwediyê hestên hevpar ên milî/netewî ne jî. Ya ku kêm e, ez dibêjim ku yekîtiya siyasî ya hêzên kurda ye, ku meriv dikare vê yekê jî wekî serweriyê binav bike.*

**Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

08.02.2014 / Îzmîr

**Jêder**


**1-** http://www.felsefevan.org/lihevhatina-qesra-serin-2.html

**2-** http://www.felsefevan.org/ehmede-xani-u-ramana-dewleti-2.html

**3-** http://eu.kurdistan-post.eu/yazarlar/klasikler/ehmede_xani/74-shgshnr.html

**4-** http://www.felsefevan.org/evdirehim-rehmi.html

**5-** http://www.felsefevan.org/penas-unsur-u-taybetmendiyen-dewlete.html

**6-** http://www.felsefevan.org/diroka-kurdan

**7-** http://www.cumhuriyet.com.tr/koseyazisi/36117/Hatip_DicleTek_silah_patlarsa_Erdogan_yerinde_kalamaz_.html


*Hezkrina ji zimanê dagirkeran ê kûjer, koletiyeke dilxwaz e û armanca vê hezkirinê, di hiş û dil de meşrûkirina zimanê serdesta ye.*

*Hişmendiya meriv bi tehde û zordestiyan tune nabe, lê bi meşrûkirina zimanê dagirkeran dikare tune bibe. Heta meriv di hiş û dilê xwe de zimanê serdestên xwe meşrû neke, meriv nikare jê hez bike.*

***Ali Gurdilî***

Çar madeyên bingeh hene ku ew jî ax, av, hewa û agir in. Madeyên din, ji tevlîbûna wan têne holê. Ango, madeyên cur be cur ji tevlîhevbûn yan jihevçûna van çar madeyan têne holê. Ango, hebûnê. Çêbûn, jihevçûn û tevlîhevbûna van madeya ye. Encax, ji bona ku ev çar made bikaribin madeyên cûr bi cûr biafirînin, ji wan re tevger divê. Ango, hêzeka tevgerî pêwîst e.

Made, bêqeyd û bêmerc mirî ye û di naveroka xwe de livdariyê (tevgerê) nahewîne û hilnagire. Heke tevger di naveroka wê de tunebe, yek rêyek jêre dimîne ku ew jî alikariya hêzeka ji derve ye. Û ku ev hêz jî, pêwîst e.

Ji bo yekbûn û jihevçûnê, du hêzên dijber pêwîst in; ku ew jî viyan/hez û buxz/kehr in. An jî, aheng û ne aheng in. Viyan û buxz, du hêzên cismî ne. Çawa ku viyan mirovan nêzîkê hevdu dike, buxz jî wan ji hevdu dûr dike.

Ev rastî, ji bo cisman jî wiha ye. Ev du hêzên mirovî, şeklê kişandin û dahfdanê ne, ku xwe di van şeklan de nîşan didin, an jî xwiyakirina wan in ku, ev girêdanî berawajî jî dibe.

Çêbûna dinyayê, lixweveger e, bêdestpêk e û bêdawî ye. Belam, ji bona hebûnê destpêk pêwîst e û ev niqte jî, sfer ango, girover e. Di wê giroveriya ewilî de, ev çar made bi temamî di bin bandûra hevdu de mane û tevlîhev bûne. Herweha, av ji hewayê û hewa jî ji axê bêferq e.

**Empedokles | B.Z. 490-430**

# PERSPEKTÎFA GİŞTÎ A HEGEL, FEUERBACH Û MARX

## HEGEL

Divê di destpêkê de em hebikekî têkiliya Kant û Hegel li ber sifra çavên xwe raxin û em derbasî Hegel bibin. Wekî em dizanin ku  Kant gava ku dest bi felsefeya xwe dike, bi feraseteke aqlî tevdigere û li gor êqil jî avahiya xwe didamezirîne. Kant berê berê bireserê û kirdeyê  ji hev vedigetîne. Li gorî  Hegel,  Kant xwe asteng kiriye, mîna ku Locke xwe bi kirde ve mahkûm kiribû, yanî ji dêvla berî ku 'bizanibe', çûye li ser  alava 'zanînê' lêkolînê kiriye ev yek jî astengkirineke, wekî em dizanin ku Kant 'Numen û Fenomenê'  ji hev cuda dike.

**NUMEN**: Rasteqîn welew rasteqiniya zanînê.
**FENOMEN**: Li gorî  fenomolojiyê  cihoka felsefeyê xetimiye û divê çareseriyak jêre bê dîtin, loma jî metafizîkê red dike û di dewsa wê de tiştên şênber (berbiçav) datîne holê, li ser kirdeyê û bireserê radiweste û ji hêlkê ve jî him piştgiriyê daye Pozivîtîzm û Ampirizmê û ji helkê jî li hember wê helwestek daniye.

Kant di tixûbê fenomenalê û teqeziyê (mûtlaqiyet) de  dileqe, lê Hegel dikeve dewrê  û bi benê derziyê di  navbera  zanîna fenomenalê 'teqeziyê' de dirûtinekê pêk tîne ango di navbera herduyan de girêdayînekê çêdike.

Zanîna Fenomenalê, jixweber  berê xwe bi zanîna teqeziyê (mûtlaqiyetê) vedike, lê ji bo ku di  cihokê de biherike ango

pêşve biçe divê qulpa fenomenolojiyê neyê berdan û divê ev tevger bi hişmendî bêne kirin. Hegel, bireser û kirdeyê wekî Kant ji hev venaketîne û herduyan jî dike heman tişt ango wekhev dibîne (ozdeş), lê di serî de em bi vî tiştî nizanin, dûre em pê dihesin. Belam di fenomenolojiyê de ango di perspektîfa hişî de heyber û kirde cuda ne. Belam, Descartes jî kirdeyê di pêş ve diajo. Hegel, dibêje fîlozofê yekemîn ê nûjen Descartes e, ji ber ku Descartes feraseta xwe li ser Ontolojiyê girê dide, yanî Descartes kirdeyê derdixe pêş ango bi 'ez' ê dest bi felsefeya xwe dike. Loma jî nûjenekî Rasyonalîst e, heta destpêka Rasyonalîzma Nûjen jî bi wî dest pê dike.

Hegel, dibêje ji bo ku meriv bikaribe ji kirdeyatiyê derkeve û bibe heqîqetek, gereke xwezanînek bi xwezanînekî dinê re têkeve têkiliyê, encax bi vî hawî heqîqeta mirov ango ya kirdebûnê/kirdeyatiyê derkeve holê. Gava ku têkîlî pêk hat, şûnde civak diafire û bi zêdebûna têkilayan jî êdî şerrê xwezanîna (ozbîlînç-kirdeyan) dest pê dike, hewceye ku êdî yek, yekî/ê têk bibe, an na qebûlkirina yên hember pêknayê, divê muhaqaq ji terefekî hewceye têk biçe, piştî têkçûnê jî êdî serdestî û koletî dest pê dike ango ji vê saetê şûnde êdî têkiliyeke deshilitdarbûnê-kolebûnê dest pê dike.

Bi vî hawî xwezanîn an jî xweqebûlkirin diwelide. Dîrok, bi vî rengî hişcivakiyê diafirîne û diyalektîka Hegelî ya dîrokî jî bi vî rengî dizê. Belam Hegel diyalektîka xwe li ser pîramîda însanetiyê radiwestîne, divê xwestekê mere gerek însanî be, loma jî xwestekên însanî jî mirov azad dike.

Bi xêra xwestekên însanî hişmendiyeke dîrokî bi xwe'r dizeyîne. Xwestekên heywên jî hene vana jî ji têrkirina zik û ewlehiyê pêk tên, lê ew xwestekên wan bi awayekî dozînî pêk tên, loma jî divê xwestekên însên gerek mirovahî be, ên nemirovahî be gerek bên nirxandin û rexnekirin, piştre jî bên neqandin û yên nebaş bên terrikandin. Ger em bi mirovahî tevnegerin, ewcax herb ê pêk were.

Feylosofên beriya Hegel 'xweza û hişmendiyê' wekî du têgehên li hemberî hev dipejirandin. Di vir de tevahî însan wekî li hember xwezayê, yekî biyanî û însan jî, li hember xwezayê tavahî yekî pasîf bicîh kirine. Mînak, di ramanên Descartesî de mirov tevahî ji derveyî xwazayê ye tû hevbeşiyeke dabeşkirî ya mirov li ba xwezayê tune ye, ji hêlkê ve xweza bi tevahî hatiye bêruhkirin û xavîkirin ango xweza bûye heyînek bêruh û xavî û ji hêlkê ve jî însan daxistiye asta yekî/e ji hişmendiyê (fikirînê) û ji Empirîzmê ve dûr e, bi gotineke din; însan, tenê yeke fikirdar e.

Lê Hegel wisa li jiyanê ango li hişmendiyê û li xwezayê nanêre, bi tevahî welew bi çavên diyalektîk lê mêze dike. Feraseta herî mezin ya Hegel li ser 'Ramanên Azad' e, hemû perspektîfên xwe li ser wê fikrê hildide jor. Ya ku berî wî bi dîrokê vedike û giloka dîrokê dihûne, dîsa ev nêrîna wî ye.

## FEUERBACH

Feuerbach, du salan li ba Hegel li bajarê Berlînê dersa felsefê werdigire. Bandora wî li ser Marx gelekî çêbûyê-çêdibe, lê pirrtir bi exlaqê xwe ya mirovperwer (hûmanîst) tê nasîn. Gelemperî rexneyê xwe ango berê tifinga xwe dide Teolojiyê û di pêşketina Antropolojiyê de xwedî roleke

mezin e. Feuerbach di kitêba xwe ya ku bêîmze hatiye weşandin de ango di berhema xwe ya ***'Li Ser Fikrên Mirinê û Nemiriyê'*** de li hemberî nemirtiya kesayetiyê dertê û wilo vedibêje: *'Nemirtiya qalîteya-hêjayiya însên, ji nûve gereke bi xwezayê re bêne kelandin, ango bêne lehîmkirin yan cebirrandin.'*
Dîsa 1839an de di berhema xwe ya ***'Li Ser Felsefê û Xiristiyaniyê'*** de wiha dibêje: *'Xiristiyanî ji zûve ye ne tenê di aqlê însên de, di jiyana wî de jî hatiye rakirin, welew hatiye hilanîn û tenê ji hingofekê (çikilînekê) pêvtirkê bi pêşve neçûye.'*

Feuerbach angaşta xwe wiha berdewam dike, 1841an de di berhema xwe ya ***'Cewherê Xiristiyaniyê'*** de vê ramîna xwe didomîne, angaşta xwe wiha diparêze û berdewam dike: 'Biresera ramîna însên dîsa însan bi xwe ye', bi vî hawî olê dadixe hişmendiyek bêsînor. Yanê li gorî Feuerbach ol, ji hişmendiyek bêdawî pêvtirkê ne tû tiştekî din e, ev tişt jî bi xêra hişî pêk tê. Kitêba wî ya ***'Cewherê Xiristiyaniyê'*** bandorek mezin li ***Marx*** kiriye. Di beşa ewilî a wê kitêbê de Feuerbach

'Cewherê Xiristiyanî û Rasteqîniyê' tehlîl dike, di beşa duyemîn de jî sextekariya olê derdixe holê û dibêje *'Xweda ji dervî însên hatiye pejirandin, loma jî însan baweriya xwe bi pîrozbahî û wehiyê tînin, ji ber vê yekê jî gelek nexweşî ji vê baweriya kor dizê.'*

Li gorî van fikrên xwe jî Feuerbach xwe yekî Ateîst nahesibîne, Feylosofê me dixwaze xwe bera binê bîra baweriya heqîqî bide û baweriya rast nîşanî me bide, loma jî li gor gotina wî mere dibêje qey ateîstek e, lê bêhna ateîzmê jî jê tê.

Dibêje ku Xiristiyanî û Xweda îluzyon in. Feuerbach, li hemberî olperestên bêşiûr ango yên bawerhişk (çors) helwestekê datîne, loma jî gelek şoreşker ji Feuerbach pirr hezdikin. Feuerbach, felsefeyê dixe hemêza xwezayê û Antropolojiyê, dibêje însan perçeyeke xwezayê ye, loma gereke mere mirov fambike û li ser lêkolînan bike, divê bi xêra çanda însên mere xwezaya însên nas dike. Feuerbach serokê Pozîtîvîzmê jî tê qebulkirin û helwesta wî a li hemberî însên jî natûral e.

Feuerbach ne yekî tam Materyalîst e û ne yekî tam îdealîst, fîzyolojîst û derûnas e, rastî tenê yekî Antropolog e. Belam ew weke Descartes û Hobbes bi awayekî mekanîk li xwezayê nanêre, ew xwezayê weke organîzmayeke mezin dibîne û laş (beden) û ruh jî tekbûneke vê organîzmê dibîne. Loma jî perspektîfa wî ya li hemberî dinyayê natûral e, ango xwedî nerînek xwezayî ye.

Feuerbach di derheqê fikirandinê de wiha vedibêje: 'Ji ber fikirandinê tenê mere nikare însên û heywên jihevveqetîne (cûda bike), a ku wî ji heywên vediqetîne hemû cewherê wî bixwe ye, encax yekî ku nefikire jî ne însan e. Sedema vî tiştî jî ne ji ber nefikirandinê ye, ji ber ku fikirandin encama hewcedariya xwezayiya wî ye.

Heywan bisînor in, lê însan bêsînor in, ango mirov bêtir azad in. Însan ne weke heywên tîkel in (cuzî) ne berovajî wê însan cewherekî tevahî ye (tumel) e, encax tevahî, bêsînorî û azadî jî jihev venaqetin. Belam, ev tevahî (tumelî) jî ne di vînê de ye, azadî jî ne di hêza fikirandinê de ye, ango ne di hundirê taybetiya êqil de ye di tevahiya cewherê însên de ye.

Vehesînên heywên bihîzyar (hestewer, hesas) in, mînak însan nikare weke kûçikan û qijalkan bêhn bike. lê ev bêhna taybet e ango di hertiştî de vehesînên wan wisa ne xurt in. Yanê bisînor in, lê yên însên ne werê ye, berfireh in, azad in û tevahî ne (tumel) in.

Li gorî Feuerbach Teolojî, Antropolojiyeke veşartî ye û dibêje gerek Antropolojî bibe zanistiyeke navnetewî, yanê Feuerbach dawa felsefeyeke nû dike. Feuerbach heqîqeta cewherê însên dipejirîne, loma jî li hember feraseta Hegel dertê.

Hegel dibêje ku  hemû însan ji hêla êqil ve bi awayekî wekhevî bi hev girêdayî ne û di têkiliyekê de ne. Hegel, cewherê bireserê têgeh dihesibîne û gomê zanînê jî, li ser bena têgehê hildide, lê rastî ne wisa ye, rastî bi xêra têgihiştina vehesînan derdikeve holê. loma jî beden (laş, cisim) di mirov de  di plana ewilî de ye, ruh di plana dudiyan bicîh dibe, ruh û hiş di mejî de bi cî dibin.

Lewma Feuerbach pirsa dinyaya cisman (laşan) çawa çêbûye napirse û hewcedar jî nabîne, ji ber vê yekê jî Feuerbach berê guleya pirsa xwe wiha nîşan dike: Mirov, xwe çawa digihîjîne têgehan û îdeayan? Ev pirs, xwiya ye ku Feuerbach dike yekî Materyalîst.

Di Feuerbach de Teolojî veduguheze-dadigere Antropolojiyê. Bi peyvek kin cewherê însên ên heqîqî, bixwehesandina hişmendiyê, xemxuriyê û di hundirê laş-bedenê de tevahiya ruh û bedenê ye. Yanê weke Hegel nabêje cewherê însên ên esîl di fikirandinê de ye ango ramîneke Xwedayî de ye, bi

gotineke din feuerbach weke Hegel fikirandinê nake ramîneke Xwedayî.

Feuerbach di derheqê civakiyê wiha dibêje, tenê însanên civakî însan in û dibêje ji ber 'te' û bi te re bûnê 'ez' dibim ez. Feuerbach, qedexebûna zewaca keşeyan jî wekî sûcekî dibîne, heta dibêje ev tewanbarî sûcekî zagonî ye. Feuerbach, divê em hêna di malzaroka dê de em girêdayî hev in, em mecbûrî hev in. Yanê tiştên bo jiyanê hêna di serî de em mecbûrî hevin û em bi hevdu re parve dikin, heta şîrê dê ê ewilî başiyê û exlaqê di xwe de dihewîne û bi vî şiklî em hêdî hêdî dibin xwedî exlaqek. Yanê gava ku zarok her carê pêsîrê dimêje ewcax hêmayê exlaqê jî dimêje.

Di derheqê başiyê de wiha dibêje: 'tiştên baş û exlaq heman tişt in.' Feuerbach hiqûqê û exlaqê jî, bi hev re girê dide, cehdek wî ya wisa heye. Li gorî Feuerbach, başî exlaq e. Heke tu ji bo ên li hemberî xwe başiyê bixwaze wê çaxê tu baş î, belam ev nayê vê maneyê ku tu ji bo xwe jî başiyê naxwaze. Exlaq, ew tişt e ku divê tu ji bextewariyên-xemgîniyên kesên din re jî bikaribî hevhestpar bî û tu piştgiriyê bidî wan kesan. Lê feylosofê me dîsa jî hişyariyêkê dike û dibêje talî egoyeke (ez) însên heye, lê divê ger haya te ji ez a te hebe ewcax pirsgirêk tune.

Feuerbach, Antropolojiyê dike disîplîneke felsefeyê û gava însên dike mijara xwe, weke Hegel ruh nake navenda dinyayê, ne jî weke Descartes û Kant, êqil nake navenda dinyayê, Feuerbach însên tevahî dike navenda dinyayê. Feuerbach cewherê Teolojiyê, Antropolojiye û esasê felsefeya Spekulatîfê jî, Teolojî dibîne.

Feuerbach felsefeya Spekulatîfa modern; Spînoza dihesibîne, ji nûve zîndîbûna wê felsefeyê jî Schelling e û temamkerê wê jî Hegel dihesibîne. Li gorî Feuerbach, teolojiya gelemperî nêrîna-dîtina însên vediguzîne nêrîna Xwedê, beramberî vê, Teolojiya Spekulatîf jî nêrîna (dîtina) Xwedê vidiguhezîne (dadigerîne) nêrîna (dîtina) însên, welew ramîna fikirdaran. Welhasil, Feuerbach feraseta xwe li ser însanetiyê (humanîzmayê) didamerizîne û dibêje keysa êqil dîsa însan bixwe ye, pîvana rasyonalîzmê dîsa însan bixwe ye. Heqîqet û rastî jî, ev e.

**MARX**

Marx, di bin bandora Hegel de maye, lê ji ber ku Marx bêtir li ser tiştên şênber (berbiçav) rawestiyaye, loma jî hêdî hêdî ji bin bandora Hegel derketiye û piştî vê yekê, ramanên Feuerbach baştir dikevine serê wî. Marx, diyalektîkê ji hemû îdealîstan û mîstîsîzman vediqetîne, ango li bêjingê dixîne û yeko yeko dineqîne û piştre berê xwe bi materyalîzma dîrokî û diyalektîkê vedike.

*'Kêmasiyên hemû metaryalîstên berî min yên herî mezin, bireserî, rasteqînî û heyînê, tenê bi awayekî, ango bi çavekî bireserî û pêhesî-têgihişî fam dikirin, heta feuerbach jî yekî wisa ye. Belam, divê bi kirdeyî lê bê mêzekirin.'*

Li gorî Marx, guhertinên ku di dîrokê de diqewimin, giştik ne bi xêra îdea û ruh in, bi saya çalakiyên însên û çalakiyên berhemên wan in. Marx, pêşketinê û peresanê bi îdeayê û ruh ve girê nade, ew dibêje bi saya însên û tevgerên wan ên şênber (berbiçav) pêk tên. Pêşketin û peresanê, li ser vî esasî dibilindîne. Li cem Marx, hiş berhemeke dîrokî ye, yanê

weke Hegel ew hişê nake kirdeyeke dîrokî. Ango Marx, hişê berhemek (berek) dîrokî dibîne, Hegel jî bereke kirdeyî dibîne (dihesibîne). Li gorî Marx, tiştê ku rewşa însên dinasîne keda wan e.

Feuerbach digot însan ya pêhesîn e (duyusal) ya jî madeyeke bireser e, Marx jî di Tezên li ser Feuerbach jî wiha dibêje: Însan pehesîn/şênber an jî çalakiyeke madî ye. Berî hertiştî însan heyîneke çalak e, lê di hin şerdan (şert û merc) de û bi hin alavan û di hundirê esasê civakî û dîrokî de, heyîneke çalak e. Ger ew şerdan (şert û merc)  bêne jibîrkirin ewcax însan dibe heyîneke razber, ango nedîtbar. Marx  di derbarê însên û heywên de wiha dibêje; çi çaxa ku însên dest bi hilberînê kirin, ango berek (berhemek) zayandin ji wê çaxê şûnde êdî însan û heywan ji hev vediqetin (cûda dibin), yanê li gorî Marx ya ku însên dike însan ked e û têkiliya navbera însên û xwezayê jî, bi vî awayî dest pê dike.

Ji ber pêdiviya hilberînên însên hewcedariya mirov bi xwezayê re çêbûye, bi vî awayî têkiliya wan pêkhatiye, ango ji pêdiviyê welidiye. Dûre însên xweza li gorî xwestekên xwe û pêdiviyên xwe dirûvê girtiye. Bi demê re însanan, xwezayê li gorî pêdiviyên xwe guherandine (veguhezandine, dagerandine) û bi vî awayî deshilatdariya xwe ya li hemberî xwezayê pêk anine, lê gava ku xweza (dinyayê) diguherînin, wê çaxê însan jî bi vê guherînê diguherin (dadigerin, vediguhezin) mîna diyalektîkê.

Marx dibêje, di dîrokê de ji însanên ewilî bigirin heta a niha, sê hêlên  çalakiya civakî hene, ya ewilî bo ku însan jiyana xwe berdewam bike divê alavan bidest bixin, bo ku bijîn

pêdiviya wan bi xwarin, vexwarin, cil û kincan hene; û ji bo van jî alav lazim in. Bo ku alavan bikaribin bidest bixin, divê alavan hilberînin, piştî hilberînê hin pêdiviyên din jî çêdibin ku ew jî pêdiviya dudiyan e, ya sisiyan jî gava însan cewherê jiyandina xwe pêk tîne; şûnde, hewcedariya wî bi yeke din re çê dibe, yanê ji bo ku nijada xwe bidomîne. Lê însan bi hilberandinê xwe diafirîne, wê çaxê pêdiviya wî bi hin hilberînên din jî çêdibe.

Marx dibêje; her hilberînek, hilberîneke din bixwe re dizeyîne û her pêdiviyek, pêdiviyak din bixwe re diwelidîne. Marx û Engles, di derbarê hiş û ziman de wiha dibêjin; ziman û hiş, ji pêdiviya (bêgaviya) ku em bi însanên din re têkevin têkiliyên aborî û pevrejiyandinê derketinin holê; hiş, ji berê de berekî (berhemeke) civakî ye, heta ku însan jî hebin ew dê berên civakî jî bidomin. Yanê ziman û hiş jî, pêdiviya têkiliyê ye. Bi kurtasî Hegel, felsefa xwe li ser têkiliyên xwezanînê damezrandiye, Feuerbach hertiştî bi Antropolojiyê ve girê daye û Marx jî, li ser têkiliyên xweza, ked û însên rawestiya ye. Helbet, di gelek xalan de jî, ji hev cuda dibin.

**Çorê ARDA**

30.05.2015

**Sûdegirtin**

Di dîroka felsefeyê de pirsgirêka însên, weş. İLYA, N, Dr. Mustafa Gunay.

Made ango cosmîk/arche tişteke bêsînor e, di gerdûnê de cîh digre û belav dibe. Ger made tiştekê bisînor bûya, wê demê madeyên bêsînor û bêhejmar jê zêde nedibûn. Madeyên bisînor, çaxê ku dema wan tê diqedin û xilas dibin. Made tişteke ne sehekî ye, naxwiya û nedîtbar/abstract e.

Heyînên/beîng ku di gerdûnê de hene, yeko yeko xwediyê rûçikên cewaz in. Heyîn: Jihevçûn, beranberî, berçewtî û ji dabeşbûna apeîronê çêdibin. Dinya, xwe di nava beranberiyan/dijberiyan de nîşanî me dide û berçewtên bingeh, germ û serma, ziwa û ter in. Berçewtî jî, gişk ji apeîronê çêdibin. Apeîron madeyekê jihevneçûyî ye û jiber vê yekê, apeîron madeyeke bêgewşîn/bêşekil e.

Madeyên din, yeko yeko ji berçewtiya apeîronê têne holê. Herwekî: terî/şilî û serma, ser rûyê erdê ava dikin û ev jî, di navenda gerdûnê de ye. Germahî û ronahî jî, hewayê tînin holê. Serweriya madeyên berçewt, herdem dest diguherîne.

Herwekî: madeyên germ, carinan madeyên cemidî/sar dixin bin bandûra xwe û raserî wan dibin. Ew madeyên ku demekê di bin bandûrê de dimînin, carekê din dizivirin apeîronê. Lewra, her tişt (celeb, cor, heyber, made) xwediyê jiyanekê kurt in û çaxê ku dema wan diqede, vedigerine apeîronê.

**Anaksîmandros| B.Z. 610-547**

# AFIRANDINA DINÊ

Bi çend milyar sal berî niha hêj ev extera ku em lê dijîn nebû, carekê Xwedayê li banî xwe bi xwe fikirî, ramiya û sêwra çêkirina hin tiştan kir. Piştre xwe bi xwe got: 'Hewqas valayî li ber min heye û hemû malê min e, tu hevalbend û ortaxine min jî nînin, nexwe divê ku ez hin tişt biafirînim û piştre jî wargehekê ava bikim û tê de hin cûre mirov û sewaline pirtexlît biafirînim.

Ew wargeh dê bi wan afirandinên min wisa xweş û şên bibe ku hempayên wê hîç nebin. Eger ew mirov wê wargehê ji xwe re xweş bikin dê pir geş bibe, yan eger ne xweş bikin dê pir ne xweş bibe. Lê ez hîç têkilî navbera wan jî nabim; divê ku ew xwe bi xwe xwe ragirin û wekhevîtî, biratî û perwertiyê têxin mabeyna xwe û bi jiyaneke dilovan bidomînin.'

Piştî sêwirandina bo afirandina wan tiştan, Xwedê bi qasî çengekê ji nûra xwe girt û gotê: 'Ya nûra min, bibe xweşiya min!'

Piştî wê gotina Xwedê, ew nûra pîroz dest bi ricfê kir, hem jî lerizî û li wê reqs û lerzê domand, domand heta ku di ser re 624 hezar sal bihurîn. Piştî hewqas salên dirêj, Xwedê ji wê nûra xwe ya ricfok re duwazdeh wargehên nazenîn çêkirin. Lê belê ew wargeh her yekê ji ya din delaltir û xweşiktir bû, piştre jî Xwedê her yekê wan navek lê danî.

Ew nav ev in: Şênîtî (Qudret), Mezinatî (Te´zîm), Dilovanî (Minnet), Qencîkiroxî (Merhemet), Başîtî (Se´adet), Tîjîfehmtî (Keramet), Şeref (Menzîlet), Rêrastî (Hîdayet), Peyambertî

(Nubuwwet), Perestinî (Ta´et), Mehdertî (Şefa´et) û Xweşribserî (Rif´et).

Ew nûra ricfok, di her yekê ji wan duwazdeh wargeyan de gelek sal hêwirî û ji Xwedayê mihrîban re zikr û perestiniyan kir. Piştre îcar Xwedê ji wê nûra xwe re çar deryayên mezin afirandin û her yekê navek lê danî. Navê yekê Deryaya Alîkariyê, ya din Deryaya Qenciyê, ya dîtir Deryaya Şaneşîntiyê û ya dîtirkê jî Deryaya Xwenasînê.

Ew nûr piştî ku ji wan wargeyên xwe derket, îcar bi rêzê kete wan deryayên mezin û tê de gelek sal zikr û perestinî kir. Piştre Xwedê wê nûra xwe ji Deryaya Xwenasînê derxist derve. Ewçax ji nûra pîroz 124 hezar dilop daweribîn û wê xist şûfê cewherekî, piştre lê niherî û awirne tûj danê.

Cewhera nazenîn li ber awurên Xwedê semax nekir; lerizî, werpixî û di nava xwe de keliya, hinbihin berfireh bû, valahiyeke mezin dagirt û piştre ji fihêtan teqiya û bû du şeq. Wê hingê Xwedayê mezin îcar li şeqeke wê cewherê bi çavine mexof û li nîvê din jî bi çavine dilovan nihêrî.

Ew nîvê ku lêmêzekirina mexof lê çêbûbû, ji tirsan xwe ranegirt û liviya, rihilî, lerizî û di şûna xwe de reqisî... Wê, kir û nekir xwe ranegirt û di nava xwe de şewitî, peritî, perpitî û weke lehiya êtûnê herikî û çû. Ew av û alav hin bi hin ruhn bû, li hev geriya û serobinê hev bû, kef û kunc pê ketin, dû û dûxaneke reştarî jê hilkişiya û hilf û gulfa wê li dora hev hate lefandin.

Ha wisan gelek sal bihurîn, ew êtûn hin bi hin hênik bû û di şûna xwe de sekinî; ruhn bû, tenik bû û bû aveke sar û cemidî. Ewçax kefa wê bû ax, ava wê bû derya û ket rewşeke girover, lê bêsekan dîsa li dora xwe sergeşte zivirî, reqisî û li hawîdorê xwe pergar çêkirin. Ew dûmana wê jî li jorê pehn bû, piştre mîna çoçikê kon bû û rengekî heşîn girt, di şûna xwe de hişk bû. Piştre navê wê giroveriyê bû dinya, navê ava wê bû zerya, navê kada (erd) wê bû bej û navê wê hêşînayiya hişk a li jor jî bû asîman. Ew nîvê cewhera nazenîn a ku Xwedê bi dilovanî lê niherîbû, jê çar tişt afirîn; Erş, Kursî, Qelem û Lewh.

Îcar hin bi hin nêz dibû ku gelek tişt bêtin holê û ji êkdu biafirin. Piştre Xwedê fermaneke tûj da Qelemê, ku dest bi nivîsandinê bike. Lê belê Qelema jar li ber wê fermana Xwedê semax nekir û şermizar bû; bêhiş ma û di şûna xwe de mîna vizikê serserkî geriya.

Di wê navê re demeke pir dirêj bihurî, hêj nû Qelem bi hişê xwe ve hat û rabû dest bi nivîsandinê kir. Wê, ew fermana ku Xwedê dabû, bêkêmasî bi cih anî û her tişt nivîsî. Piştre jî Qelem hema ji nedî ve nepenî bû. Ha ji wê demê ve heta îro, êdî dengê Qelemê hîç nehatiye bihîztin û behsa wê nehatiye kirin.

Piştî afirandina wan tiştan, îcar Xwedê xwest ku mirovekî çêbike, da ku ji dola wî zêdeyî çêbibe, nifş bi nifş û qor bi qor mirov werin holê, da xweza bi wan geş û şên bibe. Wê hingê Xwedayê hêzdar fermaneke xweş da milyaketê xwe Cebraîl da ku here çengek axa sipî ji nav cergê dinyayê bîne. Cebraîl heman çû û çengek xwelî anî.

Xweda got: Wê xweliyê bi gulavê bike hevîr.

Cebraîl ew xwelî bi gulavê hevîr kir, erçiqand û jê gilokeke mîna cewherê fîq-sipî derxist. Piştre Cebraîl ew gilok bire bihiştê û çend caran di avê de niqo kir û deranî, dû re jî bir li çarnikalê dinyayê gerand, û dîsa şûnde vegerande bihiştê, ew nixumand da ku bimeye. Ha bi wî awayî hezarsaline dirêj bihurîn, heta ku ew hevîr rind meyiya û xamîtî jê derket.

Piştî wê yekê, Xwedayê hêzdar ji wê giloka hevîr buteyekî pir delal çêkir û bi pifê piçek ji giyana xwe xist navê. Bi wê pifkirinê Bute zînde bû û giyan ketê, xwe livand û rabû ser nigan. Ewçax Xwedê ew Bute bi ADEM navdar kir û piştre jî wî avête nêv bax û bostanên Bihiştê. Adem bi tena serê xwe di nava Bihiştê de geriya; her cûre fêkî xwar û avê vexwar. Xwedayê comerd destûra Ademî li her tiştî dabû, tenê xwarina berê dara genimî lê qedexe kiribû, yan jî xwarina sêvê... Wekî din wî çi bixwarina, çi vexwarina û bi çi awayî kêfa xwe bikirina serbest bû.

Li bihiştê Adem bi tena serê xwe bû, ji ber hindê hedana wî nedihat. Wî diviya ku jê re hevalek jî hebe. Gava ku Xwedê ew vîna di dilê wî de ferq kir, ji binçenga wî ya rastê hemcûnekê afirand û navê wê danî HAWA.

Li bihiştê Adem û Hawa bi hev re geriyan û kêfa xwe kirin. Îcar evîna Ademî ji Hawê re çêbû û dil ketê. Piştre fermana bo zewaca bi Hawê re hat. Daweta wan dest pê kir; govendgêrriyên dawetê hemû milyaketên bijare bûn, berbûrî horî û perî bûn. Bûk û zavê di nava xişr û zegeran de xemilandin û li gor sazûmana yezdanî mehra wan hate

birrîn. Milyaketan bûk û zava li nava koşk, sera, bax û bostanên bihiştê gerandin û şahiyeke mezin kirin.

Adem û Hawê li wirê çi tiştê ku dixwarin, tev dibû xwîdan û bi bihneke mîna ya misk û mawerê di laşê wan re diavêt derve. Tu nabêjî ew xweşjiyana Adem û Hawê pir li zora Ebrehemî diçû û wî ji wan zikreşî dikir. Ebrehem rojekê xwe bi xwe got: Heçîka ez im, ez ji êgir afirîme. Adem, ji axê afiriye. Çima ew li cem Xwedê pîroz e û rûmeta wî heye, lê ya min nîne?

Ebrehem dixwest ku siqûmatekê bîne serê Adem û Hawê. Lê wî nikaribû rasterast û eşkere bi wan xirabî bikira. Îcar wî xwe bi dostanî nêzê wan kir. Ha bi wê dostaniya xasûktî Adem û Hawê hatin xapandin û çûn berê dara genimî xwarin. Gava Adem û Hawê berê dara genimî xwarin, pêre-pêre xişr û zegerên bihiştê ji wan hilfiriyan û hemû nepenî bûn. Dû re Xwedê ferman da, ku wan ji bihiştê bavêjin.

Ji ber ku piştî xwarina genimî diviya ku wan destava xwe ya mezin bikira. Li bihiştê jî cihê destava mezin nebû. Milyaketan ew ferman bi cih anî. Adem, Hawê, Mar û Ebrehem ji bihiştê avêtin derve. Çaxê ku Adem ji bihiştê hate avêtin, li ser girava Serendîba di nav Deryaya Hindê de li erdê ket. Jina wî Hawa jî li ser girê Erefê yê di çola Erebîstanê de li erdê ket.

Gava Adem li erdê dikeve, heta diguliyê tê re diçe xwarê û diçike. Lê ew ne dikare derkeve û ne jî kesek hebûye ku wî jê derxîne. Ewçax Adem ji belengaztiya xwe re digirî û hewar û feryad dike. Ha bi wê şîn û girînê gelek sal dibihurin,  heta

ku ji ber ruhnikên Ademî herî çêdibe û di erdê de dar û giya şîn dibin. Piştre Xwedê li Ademî tê rehmê û wî ji wê derê difilitîne. Adem bi hişê xwe ve tê, xwe ji wê erdê derdixe û li jina xwe digere. Lê wî ew Girav serobin kir, jina xwe nedît. Piştre biryara xwe da ku ji Giravê derkeve û here bejahiya mezin, bi umîda belkî ku jina xwe bibîne.

Adem da nêv ava Deryaya Hindê re çû, kete ber pêlan, ha ku dît li bejayîyeke sîlekan rast hat. Lê belê wî ne deverekê dinasiya û ne jî dizanibû ku wê here kurê. Hema berê xwe çolebir da wê deşta bi sîl û çû.

Tu mebêj çaxê ku Hawa jî li ser Girê Erefê ketiye, weke şûyê xwe ew jî bêhiş bûye û demeke dirêj wisa maye. Çaxê ew bi hişê xwe ve tê û Ademî li cem xwe nabîne, radibe lê digere. Lê ew newêre ku xwe ji Gir bera deştê bide. Wek mesela ku dibêjin: ‘Dema ku li te bû tengasî yan xwe bavêje bextê zilamekî çê, yan jî pişta xwe bide çiyayekî asê.’ lê hatibe.


Adem bi wê deştê ve diçe û her qasê carek-didu navê Hawê hildide, gazî dike. Ha wisan rojek, didu, sisê... Adem diçe ha ku dibîne digîje quntara çiyayekî û li wirê rûdine. Lê pirî ku westiya ye, êdî ji rêveçûnê ketiye û nikare rabe ser nigan. Hawêya jina wî, çaxê ku li ser Girê Erefayê dengekî bi şewat ji jêr ve dibihîze, pêre-pêre dinase ku ew deng yê Ademî ye. Îcar ew xwe li dengê wî digire û berjêr diçe, diçe heta ku digîje wî. Li wirê herdu hev dibînin û bi hev şad dibin û dest bi jiyaneke nû ya bi şeq û deq dikin...

**Zeynelabidîn Zinar**
Stockholm 1993

**Têbinî:** Ev çîrok şiroveya Mewlûda Mele Ehmedê (Hiseyn) Bateyî ye. XWENÇE-VI, Beş: IV-V. PENCÎNAR. Weşanxaneya Çanda Kurdî Stockholm 1993. Herweha ev, di hejmara pêncan ya kovara NÛDEMê de jî hatiye weşandin.

*Bêguman meriv bi çi zimanî bipeyive, meriv suxreya çanda wî zimanî dike. Meriv bi çi zimanî binivîse, meriv xizmeta çanda wî zimanî dike.*
*Ji ber ku dema meriv bi zimanekî dinivîse, meriv hewl dide ku peyvên nûjen û hevokên sazbend tê de bi kar bîne. Hingê bi wê xebata meriv, bi wê keda meriv, ew ziman dewlemendtir dibe û berepêş diçe.*

***Zeynelabidin Zinar***



Ger made heta têra xwe perçe bibe, wê demê em ê rastê perçeyekê herî biçûk werin, ku ev perçe êdî napelijin û ji hevdu cuda nabin. Atom, şeklê madeyan yê herî dawî ye. Ji aliyê hejmaran ve bêsînor in û pir hûr in. Ji ber vê yekê jî; ji aliyê sehekan ve (bi çav, guh, dest, ling û çerm) nayên dîtin an bihîstin.

Ji bilî çend îstîsneyan, tu rûçikên atoman tune nin. Ew jî, hişkbûn û bêbandorîtî ye. ji ber ku bêrûçik in, veqetandinên di navbera wan de jî; veqetandinên hejmarî ne.  Li gorî hevdu, hinek biçûk û hinek jî mezin in. Ji aliyê şekil ve jî, di navbera wan de ferq heye.

Atom, bêrûçik in û hemû obje ji cewaziya rêza wan û ji cîhgirtina wan tê. Sedemên cewaziya wan, ji cewaziya rêzgirtin û cîhgirtina wan tê. Atom, ne di bin bandûra tu tiştî de ne û hişk in. Di naveroka xwe de bisînor in û di navbera hevdu de cuda ne. Ji bo ku em bikaribin tişteke ji tişteke din binasin; pêwîst e sînorekê wan hebe.

**Demokrîtos| B.Z. 460-370**

# VEGUHERÎN

Guherîn û veguherîn, du prosesên xwezayî ne. Her tişt xwe vediguhere. Çawa sal û demsal tên û diçin, wûsa jî nebat û her tiştê bi babetê siruştî xwe vediguherinîn. Heta ew qalibê ku mirov têde ye, tête guhertin. Erê mirov pê hayedar nabe, ku çawa laş xwe herroj vedigure, lê piştî demekê mirov dikare bi hêsanî veguherînê bibîne. Helbet ne tenê laşê meriv, hizrê meriv jî li gorî derfet û karê pêre mijûl dibe, tête veguhertin. Ne tenê mirov û rengê xebata wî jî, xwe vediguhre. Bi amûr û teknikên nû, babet û berhemê xebatê têne veguhertin.

Mirov dikare weke heyamê salê bibîne. Çawa bi demsalê re xwarin, vexwarin û kincê mirov jî li gorî tên veguhertin. Helbet ne mirov tenê lawir û ajalên bejî û kedî jî xwe, li gorî demê û derfeta vediguherînin. Heta berê hatina salê mirov bi hatina quling, hechecik û legê nas dikir. Ne dûrî aqila ye, ku mirov salname li gorî hatina ajalan saz kiribe. Lewma jî navê gelek meha li gorî hatina ajala ye û bi wan tête binavkirin. Weke Kewçêr, Gulan û Mijdar.

Em mirov dikarin, bi çavê xwe gellek tişta <berrî>, <bejî>, yan jî weke peyva herî zêde tê bikaranîn; <heywanî> bibînin. Lê ma mirov hêjî dikare bi qasî mêşhunguv afirêner be? Ew cewhera ku ew di hundurê xwe de diparêze fêm bikin, yan jî biafirînin?

Yan jî bi qasî darake ku temenê wê bi sedsala ye, em dikarin li ser piya bimînin? Yan jî fêmbikin, ku çawa çêlikê beqa, çima berê bi cûreyê masiya di nav avê de zêde dibin? Her weha, germaya erdê û ya ezman bi xwe veguherîn e.

Çawa nebat li zivistana di bin erdê de, şax vedide û li bihar û havîna li ser erdê. Her heyîn, bi xwe di nava prosesekê guherîn, veguherîn û mayînê de ye. Yan jî cotbûn û hevpariya kevoka, ku çawa bi dorvedan li ser hêkê xwe vedidin. Gelo berpirsiyariya ku kevok, li hemberî mêkewê û çêlikê xwe pêktînin, em mirovên xwe <biaqil> dibînin, dikarin pêkbînin?

Em werin ser zewaca ku em pîroz dibînin. Gelo em dikarin bi qasî ajalan dilsozê zewacê bin? Yan jî ji bilî hem afirdê xwe, bi ajalan re têkiliya seksê, li cem mirov ne tiştekî ecêb e. Rast e mirov di xwezaya xwe de, nêçîrvan e, şêr jî nêçîrvan e. Lê şêr naçe nêçîra şêra, û nêçîra hem heyî yên xwe nake. Lê mirov hêjî, nêçîra mirovan dikin, bêyî ku goştê wan bixwun. Mirov ne ji bo qût, mayîn û jiyanê, ji bo tunekirinê nêçîrê dike. Lewma jî têgeha mirovînê ku ji suruştê, yan jî ji pîvanê suruştî û ji aştiya bi suruştê re dûr, karesata ku li ser rûyê erdê rûdide <mirovî> tîne.

Çima mirov li dij veguherînê ye?

Mirovê ji rewşa xwe qayîl, yan jî yên pergal li gorî berjewendiyê wan helbet veguherînê naxwazin. Heta kêliya ku pergala heyî, li gorî berjwendiyê wan be, bi pergalê re ne. Lê gava ew pergala ku heyî dikeve rewşeke metirsîdar, yên desthilatdar û nîv desthilatdar dikevin nava girseya veguherêner. Çend ku wan bi desthelatdariyê re nanê xwe xwarine û ew xwe zana û mezinê civakê dibînin. Lewma jî ew pêla nû dikeve nav destê şarezayê desthelata berê. Êdî ew pergala nû, berdewama ya kevn e. Lewma jî her tiştê heyî, berdewama yê kevn e.

Ev di felsefeyê de jî wûsa ye. Di olê de jî wûsa ye. Lewma jî qala sedûbîstûçar hezar nebî yan pêxemberan tête kirin. Yek berdewamiya yê berê ye. Di serdemên berê de, bi hêza hizr ev yek dihate veguherîn, lê bi destpêka desthelata olên siyasî re, ev yek hate girêdan. Gava Nebî û pêxember bûne xwedî hêza leşkerî, her weha pirtûkên <pîroz> êdî ol ji hêza hizrî û ayînî bêhtir bû ya siyasî. Pîrozkirin, dibe mertal û kirasekî ji tabûyan. Her weha ji her cûre rexne û pirsa re jî girtî ye.

Pîrozkirina olê, ji aliyekî din ve fermîkirin e. Bi fermîkirinê, mêzîna ola fermî û ya neferimî têk diçe. Lewma ol yan jî hêza desthilatdar, herdem li hemberî veguherînê bûye.
Veguhrînên li gorî berjewendiyê xwe, pêkanîne. Lê ma kengê berjewendiyên desthelatdaran û yên hejaran bûne yek? Gava berjewendî û nêrîna qesab û berxikê bibe yek, wê yê dagirker, desthelatdar û hejar û bindestan jî bibe yek.

Veguherîneke çawa?

Çawa her zindî û nebat berdewama yê beriya xwe ye, wûsa jî her qewm, ol, çand û ziman berdewamiya yê beriya xwe ye. Lewma jî her tişt bi demê re, li gorî demê û derfeta tê guhertin. Erênî, ya jî neyînî, her tişt bandora xwe, aktîf, yan jî pasîf li ser her tiştên me bandora xwe dileyize. Çawa gava mirov, qala dîrok û serpêhatiyên kurdan bike, bêyî şerê di dîrokê de ê bi neyarê olî û netewî, nabe.

Dîroka kevn û nû jî, ji bo hişmendiya kurdan nehatiye vekolan û nebûye babeta vekolînê. Lewma jî kurd hêjî kula vê kêmasiyê dikişînin. Lê dîroka nû meriv nikare, bêyî Helebçe, Şengal û Kobaniyê fam bike û nabe. Wûsa jî di

wêjeyê de jî, bêyî Mem û Zîn, Siyabend û Xecê û Dewrêş û Edûlê nabe. Pêre jî ajalvaniyê û çotkariyê bandoreke mezin, li ser qerwekl, qerf, û hemû babetên zimên kiriye. Lê mirov dikare bi hêsanî bibîne, ku tevn û babeta mijarên çandî û yê olî jî ne hizrek, yan jî veguherîneke ku kurdan bi xwe kiribe. Yê hatine kirin jî weke berhemek ji yên êrîşkaran û bertekeke li dijî êrîşkarên welat û axa wan bûye. Heta ku derfet nedîne, ku bi aliyê hizrî û derûnî, veguherîneke li dijî veguherîna ferz û fermî jî biafirînin.

Çawa her derman li tena her mirovî nayê, wûsa jî her pergal û hizr, li bejn û fesala her civak û kesî nayê. Lewma jî divê berê taybetmendiyê civakê, di ber çava re werin derbas kirin. Çawa her çep ne hevalbendê kurda ye, wûsa jî her rastgir jî ne dijminê wan e. Gava mirov bi rêbazên klasîk nagihijê armanca xwe, pêwîstî bi rêbazê û asoyên nû heye. Her mirov û rêkxistin bi hin kesan geş dibe, lê yên ku meriv dibin serkeftinê, asoyên nû ne. Ne her kesê ku tiştekî dibîne yan jî didamezirînê dibe xwedî, destheldar û serdestê wî.

Gava meriv temenê mirovekî bide ber çava, hew çend salên wî hene, yên çalak û tije enerjî. Lê piştî çend ezmûn û destkeftiya, ew pêre dibe paraskarê destkeftiyên xwe. Naxwaza destkeftiyê xwe winda bike, lê bi vê yekê re jî di astekê de dimîne. Lewma jî, pêşketineke berbiçav zehmet dibe.

Veguherîn bûyereke siruştî ye, yê neyê guhertin ne siruştî ye. Yê ne siruştî, weke bedeneke mirî ye. Heta bedena mirî jî xwe vediguherîne, lê beropaşî. Meriv çawa berhema siruştê ye, wûsa jî a dema xwe ye. Lê dem û dewran dizivire. Yê

xwe li gorî derfet û demê neguhere, ji mirin û têkçûnê re amade ye.

**Newaf Mîro**
newafmiro@gmx.de
11.03.15

*Tê zanîn ku pirraniya berhemên kurmancî, wêjeyî ne: Ferheng in, roman, helbest û çîrok in. Pirr kêm weşanger giraniyê didin mijarên ji derveyî wêjeyê. Mixabin wêje bi tena serê xwe nikare hizr û bîr û baweriyan ava bike.*
*Aliyên din ên zanistî hene pirr pêwist in ku hebin û bi kurmancî ne bi zimanekî din.*

*Ji bo ku mejiyê min bi kurdî birame, divê ez pirtûkên derbarê rexneya edebî de bi kurdî bixwînim, divê ez felsefeyê bi kurdî bixwînim, divê ez pirtûkên gerrokan bi kurdî bixwînim, bi kurtî divê pirtûkên kurdî bibin neynika pirralîbûna jiyanê, ne ku tenê em bi romanan û dîwanên helbestan dilê xwe xweş bikin.*

***Jan Dost***



Hewa apeîron e û bêsînor e. Yekîtiya laşê mirov jî bi alikariya hewayê zindî dimîne, hewa dibe giyan û xwe dormedor li dinyayê radipêçe. Herweha, hemû heyînan dixe bin bandûra xwe û dikeve nava wan. Hewa, xwediyê rûçikên bigewşîn e, heta dawiyê li fezayê belav dibe û dilive. Xwe bi xwe ango bi serê xwe, xwediyê hêza xwe ye û ev hêz, di naveroka wê de veşartî ye. Tiştê ku cosmîkê diafirîne jî, hewa bi xwe ye.

Cosmîk, ji hewayê bi du şeklan diafirin: Bi tîrbûnê/condensation û bi bi firkbûnê/dilute. Hewa, herdem bi van herdu maweyan dilive; tîrbûn mîna serma û firkbûn jî, mîna germê ye. Lewra, hewa bi serê xwe xwiya nake. Belam, bi van herdu pêvajoyan re dibe agir û xwe wiha nîşanê me dide. Tîrbûn, di destpêkê de dicemide û hişk dibe. Piştre, dibe av, ax, ewr û kevir. Herweha, hemû cosmîkên gerdûnî di bingeha xwe de ji bilî hewayê, ne tu tişt in.

**Anaksîmenes| B.Z. 585-525**

# Bi Kurtî Li Ser Etymologiya Dewletê

Dewlet çi ye? Li ser peyva dewletê gelek teorî hene. Di salên 1900an de pir lêkolin li ser dewlet û girîngiya dewletê ji aliyê zanyaran ve hatine pêşkeşkirin. Ji destpêkirina mirovayetî heta niha dewletên ku hatine avakirin di dîrokê de herdem guherîne, karakter û şêwazê desthilatiya sîyasî jî li gor demê bi pêşve çûye. Tê gotin ku piştî civakên hoveber, dewlet derketine holê û dewlet ji bo têkiliya rêveberiya civakê pêk hatiye û hêza xwe her zeximtir kiriye. Ji roja ku dewlet derketiye holê ta îro, dewlet ji bo civatan bûye wekî instrûmenta saziya herî bilind a birêveberiyê.

<*Bi kurtî meriv dikare bibêje ku dewlet saziya birêxistî, otorîter û çalak ya civakî ye*>. [1]

Ji destpêka damezrandina xwe ve dewlet, wekî dewletên bajarî hatine avakirin. Lê şêwaza dewleta bajarî êdî têra miletan nedikir û karakterê dewletê bajarî piştî demekê diviyabû biguhere. Bi derketina dewletan û birêxistina dewletan bajarî yên ku derketine holê diviyabû xwe li dijê civakên din, ji bo berjewendiyên xwe dewletê biparêzin û sermayeya xwe dewlemendtir bikin.

Ji ber wê jî her dixwestin ku cihê warê xwe berfirehtir bikin. Sermaye û dewlemendî, bi xwe re dewletên mezin ên desilatdar peyda kirin û herwiha ku ev yek bûye sebebê qonaxeke hesûdiyê di nav jîyana mirovayetiyê de û her alî

[1] Hvad er en stat, Mogens Herman Hansen. Det Kongelige Danske Videnskabernes Selskab - The Royal Danish Akademy of Sciences and Letters, 2014.

çavê xwe berdane welatên hevdu û bûne sebebê şer û pêvçûnan ku dixwestin erd û sermayeya xwe berfirehtir bikin.

Kêm û zêde di nav wan civakan de şerên mezin bi demê re berdewam kirine û bi zerarên mezin gihîştine wê astê ku piştî şerên Napolyon Bonapart yên li Ewrûpayê, dewletên mezin hewl didin da ku bi rêbazên aştiyane, meseleyên ku di navbera miletan de peyda bûne çareser bikin. Prosesa aştiyê, bi çavderiya hin welatên desthelatdar û bi kongreya aştiyê, li bajarê Vîyanayê dest pê kir.  Lê tu carî ne karî li ser rêbazên aştiyane problemên navbera dewletan çareser bike. Li gel hewldana rêbazê aştiyane, şer û zererên mezin di navbera dewletan de heta şerê cihana duyem berdewam kiriye û piştî şerê cîhanê a duyem, karakterê dewletên Ewrûpayê jî di binî ve hate guhertin. Welatên Ewrûpayê êdî ketin ser rêya aştî û dîalogê û sermayeya xwe bi awayek din dixwestin ku birêve bibin û berfirehtir jî bikin.

*<Têgihîştina mirovayetiyê, heq û hiqûk bi pêşve çû  û herwiha bingeha avakirina dewletên lîberal a demokratik li Ewrûpayê dest pê kir>.*[2]

Kurdan di nav vê pêvajoya dewletan de çi rol leyistine gelo? Li gor hin dîrokzanan miletê kurd di dîrokê de xwedî desthilatdar bûne û tecrûbeyên wan ê birêvebirina <dewletê> çêbûye, lê belê qonaxekî dirêj jî navber dane û wan tecrûbeyê xwe ê rêvebirtiya desthilatdariyê jibir kirine. Tê gotin ku kurd di dîroka mirovayetiyê de, bûne avakarê  dewletên wekî  <*Dewletên Hurrî (Ji dehan zêdetir bajardewlet-*B.Z. 2500-

[2] Statsdannelse, regimeforandring og økonomisk udvikling, Jørgen Møller, Hans Reitzels Forlag. 2012.

*1400an), Dewleta Gutî (B.Z. 2700-1070an), Dewleta Sûbarû (B.Z. 4000-3000an), Dewleta Lûlû (B.Z. 2800), Dewleta Mîtannî (B.Z. 1500-1250), Dewleta Kassîd (B.Z. 1595-1207), Dewleta Ûrartû (B.Z. 860-580), Dewleta Medyayê (B.Z. 727-550), Dewleta Komaganê (B.Z. 162-17), Dewleta Bûweyhî (933-1062), Dewleta Bawendî (665-1349), Dewleta Ziyarî (927-1090), Dewleta Kengarî (916-1090), Dewleta Kekûyî (1008-119), Dewleta Eyûbî (1169-1400), Dewleta Şedadî (951-1174), Dewleta Rewadî (970-1071), Dewleta Hesenweyhî (959-1015), Dewleta Zend (1750-1797), Dewleta Gor (1030-1215), Dewleta Merwanî (372-478), Dewleta Dostikî (983-1085).>* [3]

Ji dîroka nêzîk jî kurd pê dizanin û hê jî nehatîye jibîrkirin ku ***Komara Kurdistana Mehabadê*** di sala 1946an de avabû û salekê karibûye ku li ber xwe bide.

**Dewlet û Kurd**

Ez pirî caran bûme şahîdê axaftina di nav kurdan de ku digot in, roja ku dewleta kurdî ava bibe, dê qiyamet rabe. Ev gotin beredayî di hişê miletê me de çênebûye. Di nav vê gotinê de mirov bi asanî dikare bibîne ku miletê kurd di dîrokê de şikestinek mezin xwariye û ew şikestin hem bi aliyê civakî de û hem jî di psîkolojiya miletê me de, rûxandinekî mayînde ava kiriye.

Herwiha ev şikestin di hişmendiya netewa kurdî de bêmeferî û bêhêvîtiyê pêkaniye. Her çiqasî dewletên kurdan, heta roja me ya îroyîn nehatibin jî, hêviya wan her xurt maye. Wekî gotinek din jî di nav miletê me de digere û gelek watedar e, tê gotin ku 'di dilê her kurdekê de Kurdistaneke serbixwe

[3] www.felsefevan.org, Ali Gurdilli, kurd û dewlet.

heye'. Ev gotin jî remza wê hêviyê ye ku kurd her çiqasî hatine wêrankirin û parçekirin û daxwazên xwe yên xwezayî a avakirina dewletekî serbixwe parastine û heta îro jî, berdewam kirine.

**Dîroka Kurdan**

Di sedsala 11an de Selçukiyan berê xwe dabûn rojhelata navîn û di navbera sala *<1042an de, Selçukiyan piraniya beşên Kurdistanê îşgal kirin û kirin axa dewleta xwe ya fireh>*.[4] Li gor dîrokê jî mirov dibîne ku Selçukiyan bi piştewaniya kurdan karibûne hikûmdariya xwe berfirehtir bikin û gelek navçeyên rojhelata navîn bixin di bin kontrola xwe.

Gelek eşîrên kurdan bûne balpiştên Selçukiyan û alîkariya wan kirine. Eynî demê *<beşek mezin ji eskerên Selçukiyan, li Asya Biçîk ku hejmara wan digihîşt 250 hezar kesan, ji eşîrên Kurdistanê pêkdihatin, bi taybetî jî ew eşîrên ku li Amed û der û dorê dijiyan>*. [5]

Şerê Çaldiranê a binavûdeng, di hişê miletê kurd de ye, hêj nehatiye jibîrkirin. (1514) Di navbera Osmanî û Iraniyan de şerê li ser Kurdistanê demekê dirêj berdewam kirîbû. Di sala 1639an de, Osmanî û Sefewî li hev hatîn û li bajarê ***Qesra Şîrîn*** civiyan û peymana ***Qesra Şîrînê*** îmze kirin. Pistî vê peymanê, navçeya Erdelan ketE destê Iraniyan, herêma ***Mukrî*** û ***Şehrezur*** ku ***Silêmanî*** jî nav de kete destê Osmaniyan.

---

[4] Çend rûpel ji dîroka gelê kurd, Dr. K. Mezher Ehmed, Stokholm 1991, Çap û weşanxeyna Apec.

[5] Çend rûpel ji dîroka gelê kurd, Dr. K. Mezher Ehmed, Stokholm 1991, Çap û weşanxana Apec.

Lê şer û dabeşkirina Kurdîstanê bi xwe re serê birakujiyê jî anîbû ku eşîrê kurdan bibûn dijminên hevdu û li dijî hevdu şer dikirin. Aliyekî ve jî dagirkeriya Osmanî û Iraniyan li ser miletê me jî berdewam dikir. Kurdistan êdî hatibû parçekirin û dagirkirina welatê me di nav miletê me de jî bû sebebê perçokandinê. Prosesa peymana ***Qesra Şîrîn*** heya sala 1831an berdewam kir, ku dijminên me bi her awayî biserketin û Kurdistan bi tevayî kete bin destê wan û di navbera wan de hate dabeşkirin û bû du parçe.

Kurdan her çiqasî di nav jîyana Osmaniyan de hin statû peyda kiribin jî, ew desthelatî zêdetir mihelî bû û kurdan heta Şerê Cîhana Yekem dîsa derfeta afirandina dewletbûyînê bi dest nexistine. Yeknebûyîna kurdan, nîfaqî û şerê navxweyî ya di nav kurdan de, her car bûye sebeb ku kurd nekarin derfetê peyda bikin da ku ber bi dewletbûyînê ve biçin. ***Peymana Lozanê*** jî li ser navê hin kurdan pêk hatîbû û dijminên me karîbûne kurdan bixapînin û li ser navê wan, hin sozan bidin û biçin heta Lozanê û bi peymana Lozanê Kurdistanê parçe parçe bikin.

Li Başurê Kurdistanê serhildana ***Şêx Mahmûd Berzencî*** di sala 1919an de dest pê kirîye û ***Şêx Mahmûd*** qralîyeta xwe jî ragihandiye. Qralîyeta ***Şêx Mahmûd Berzencî*** profîla dewleta kurdî bû, lê prosesa qiraliyetê ji serî heta dawî bi şer berdewam kiribû û bi trajediyeke dawî lê hat. Ew trajediya ku hate serê wan, naye terîfkirin jî. Piraniya wan hatin kuştin û sirgûnkirin û dîsa hêza kurdan têrê nekiriye ku desthilatiya xwe biparêzin.

*Herwiha <Malbata Berzencî ji salên 1850an ve ii herêma Suleymaniyê û derdora wê, pêşevaniyê dikirin. Bavê wî Şêx Saîdê Suleymanî jî piştî serhildana 1908an hatibû bidardakirin.>* [6]

Di sala 1946an de derfetek nû peyda bû li Rojhelata Kurdistanê û ***Komara Kurdistana Mehabadê***, bi serokayetiya pêşewa ***Qazi Mihemed*** hate avakirin. Komara Mehabad salekê karibûye bijî û ku hilweşandina ***Komara Mehabadê*** trawmayekî nû xist nav miletê me. Trajediya ku hate li ser ***Komara Mehabadê*** û bidarvekirina pêşewa ***Qazî Mihemed*** û hevalên wî li meydana ***Çarçira*** a ***Mehabadê*** li ser kurdan û di hişmendiya neteweyê kurd de birînek mezin vekir û fikra serxwebûyîna Kurdîstanê, carekê din hate hilweşandin.

Tevgera neteweya kurd li Rojheta Kurdîstanê, piştî rûxandina şahê Îranê derfeteke nû afirand ji bo kurdan û bi serokayetiya ***Dr. Evdirehman Qasimlo*** tevgera kurd dîsa bi hêviya ku statûyekî ji bo miletê kurd re ava bike dest pê kir. Lê herdu serokê kurdan jî, li Vîyanayê hatin kuştin.

Li Bakurê Kurdistanê serhildana kurdan piştî ***Peymana Lozanê*** jî berdewam kir, ji bo ku kurd bikaribin bibin neteweyeke serbixwe, serî hildan. Piştî ***Serhildana Şêx Said*** bi dehan serhildanên kurdan li Bakûrê Kurdistanê çêbûn. Di serhildana Şêx Seîd de Kurd bi hestekî niştimanî rabûn ser piyan, lê <*di eynî wextê de beşek biçûk ji derebegên kurdan, balişta*

[6] Kovara bir 13 Mart 2015.

*xwe bi Îngilîzan ve girêdan û xwestin pêşiya berfirehbûna ve şoreşê bixitimînin*> [7]

Herwiha li ser serhildana sala 1925an dijminê me karîne tevgera serhildanê wekî tevgerekî kevneperestiyê nîşanî dinyayê bidin. Piştre bi hezar fêlbazî û sozdariyan xwestin kurdan bixapînin, heta belavokan li navçeya ***Colemêrgê*** û ***Araratê*** jî belav kirine ku di wan belavokan de wiha gotine: <*Hevwelatîno! Hukûmeta Komara Tirkiyeyê bi temamî qerardar e kû hemû pêwistiyên şaristaniyetê di welatê xoşewîstê me yê Kurdistana Tirkîyê de belav bike. Rê û dirbên we dê bên qîr kirin. Gund û bajarên we de bêdibistan û mamoste nemînin, di jîyanekî gelek xweş de xezanên we dê şad û bextîyar bin, asayîş û qanun dê bibin sebebê pêşveçûn û berfirehbûnên me di bin parêzgerîya rasteqînî û dilsozî ya qanunên komarê de nin.*> [8]

Di 29ê hezîrana 1925an de li taxa ***Deriyê Çiyê*** ya ***Amedê Şêx Seîd*** û hevalên wî hatin darvekirin. Li darvekirina ***Şêx Seîd*** û hevalên wî, trajediyek bû û di nav kurdan de û herwiha di nav miletê me de tirs, panîk û trawmayeke pêkanî û hêviya kurdan, bi her awayî hate şikandin.

Di salên 70 û 80an de jî gava me bi kurdan re diaxaft û digot kurd divê bibe yek û dewlet, gotina gelek kesan qet ji bîra min naçe ku digotin 'ma we aqlê xwe xwariye û hûn jî dixwaz in ku bila karesata Şêx Seîd were serê we.'

---

[7] Çend rûpel ji dîroka gelê kurd, Dr. K. Mezher Ehmed, Stokholm 1991, Çap û weşanxaneya Apec.

[8] Çend rûpel ji dîroka gelê kurd, Dr. K. Mezher Ehmed, Stokholm 1991, Çap û weşanxaneya Apec.

Komkujî, jenosid, asimilasyon êdî bûye jîyana me ê rojane. Qetlîama ***Geliyê Zilan***, ***Helebçe***, ***Enfal*** û bi sedan ew cure gelkujî, hatine serê miletê me. Di nava tu miletan de hewqasî serok nehatine kuştin, darvekirin û sirgûnkirin û zîndankirin.

Cînarên me bi sedan sale kurdan talan dike û bi sedan sal e ku li ser miletê me gelkujiyan pêk tîne û ji birîna komkujî û jenosîda ku li ser kurdan ve hatî, hêj jî xwîn têt û em hemû kurd, bûne şahîdên bûyera ***Şingalê*** jî û li ber çavê me, komkujiyek din hate serê me kurdan.

Ev travmaya ku hatiye serê kurdan, ev e sed sal in ku li ser nifşên nû bûye trajedî û bîrhatinên gelek tehl û tijî. Piştî jenosîda ku bi sedan sal e ku li ser kurdan berdewam kirîye û ew asîmîlasyona ku hatiye serê kurdan, bûye sebebê du bendî û li hev ketina kurdan di nav xwe de û heta îro jî ev trajediya bêhêvîtî û rûxandinê, di nav nifşên nû de berdewam kiriye. Em hemû kurd bûne şahîdê karesata Şingalê jî ku piştê karesata Şingalê, du bendî û li hev ketina kurdan dîsa derket holê û kurd nekarin bi hevdu re hemahengî û hişmendîya netewî ava bikin.

Di nav wan trawmayan de miletê kurd xistine haletêkî sendroma nexweşiyê û dijminên me, bûne pispor li ser serê kurdan û ligel fêl û fêtlên xwe, bi asanî dikarin kurdan bixapînin. Ew hunera sîyaseta dijminên me bûye jîyana rojane û bi wan fêlan, rê li ber fikrandina netewa kurdî her roj li ber çavê me tê perçiqandin. Kurd hewqasî ketiye ku, êdî bi menfîetên/berjewendiyên biçûk mijûl dibe û gava tiştekî bi

dest dixe, ku li gor miletên din qet ne nirxdar e jî; wekî ji esmanan hatiye xwarê lê dinêrin.

**Rewşa Kurdan ya Îro**

Rewşa dinyayê, ne weke berê ye û gelek hatîye guhertin û kurd jî dikarin ji wan derfetan sûdwerbigrin. Piraniya welatê dinyayê, berê sad salan berê xwe dabû miletên biyanî, da ku dagir bikin û bi vî şiklî, dixwestin ku hikûmdarîya xwe bihêztir bikin. Lê wijdana mirovayetiyê, îro êdî wan kiryar û kirinan naperijîne û ji demên berê zêdetir, girîngiyê didin miletê bindest û li ser heq û hiqûqê miletan, zêdetir hestyar bûne.

Heq û hiqûqê miletan piştî hilweşandina ***Sovyeta*** berê, zêdetir derket holê û gelek miletan piştî wê qonaxê, dewleta xwe ava kirine. Ew miletê ku bêdewlet mane, gelek kêm bûne û hema heman ne mane. Di raya giştî a dinyayê de êdî hatîye fêhmkirin, kurd mezintirîn milet e ku nebûye xwedî dewlet. Bi dîtina min dinya amadeye alîkariya kurdan bike, lê kurd bi xwe hêj ne amade ne û di nav xwe de jî, nakok in.

Li Bakurê Kurdistanê piştê serhildana PKKê ku eva bû sih salê zêdetir berdewam dike, potansîyelek mezin afirand. Kurd ji demên berê zêdetir, bi rêxistin bûne û çalaktir bûne, lê belê hestê netewayetiyê li gor rewşa îro gelek lewaz e û daxwaziya wan jî, ne li gor pîvanê şerê sih salî ye. Li Bakurê Kurdistanê miletê me ketîye pêy guherandina destûra (makezagona) dagirkeran û bi wan rêyan, dixwazin ku rewşa xwe baştir bikin.

Li rojhelata Kurdistanê bêdengî durust bûye û piranîyan wan ketine pêy farisan, ka yê çi bidest bixin. Li Rojavayê Kurdistanê derfetek zêrin û dîrokî ketiye destê kurdan û dikarin rewşa xwe ya desthelatdariyê bihêztir bikin û ber bi dewletbûyînê ve gav bavêjin. Lê ew derfeta mezin a ku ketiye li destê wan, nizanin çawa bikar bînin û hewl didin ji bo ku deskeftiyên xwe, bi miletê din re parve bikin û ketine di bin fîlozofiya demokrasiya Rojhelata Navîn.

Li Başurê Kurdistanê rewş li hemû deman baştir e û şert û zirufê dewletbûyînê gihîştiye wê astê ku dikarin dewleta kurdî ragihînin, lê çavê wan li ser Bexdayê digere û hem ji tirsa neyekbûna kurdan û hem jî tirsa metînkaran, nikarin biryarê bidin. Kurdên ku belav bûne li vê dinyayê û bûne penaber û koçber, piraniya wan di bin şertên giran û zehmetiyan de dijîn û çavê wan li ser welêt e û ku dilê wan ji bo Kurdistanê dişewite. Kurdên dîasporayê, di nav wan welatan de wekî hemwelatiyên tirk, îranî, iraqî û sûrî têne naskirin û gava kurd tê gotin, wekî kêmnetew dibînin û rastê gelek zehmetiyan tên, gava nasnameya xwe didin naskirin.

Ji ber wê ye, divê kurd karên xwe bikin...

Hedî-hêdî divê ber bi xewna xwe a hezaran salan ve bimeşin û ji bo heviyên xwe têbigoşin, xewna xwe bi cîh bînin. Ew roj jî, nêzîk e. Gelek zanyar jî bal kişandine, ser miletên ku bêdewlet in, ku di nav wan miletan de şerê navxweyî, nenasî, zordarî û hêzdariya kesayetiyê rû dide. Filozof ***Thomas Hobbes*** (1588-1679) *dibêje; <di nav miletê ku bêdewlet in,*

*di demekê kurt de tenhayî, gelemşeyî, zordarî û feqîrtî têne dîtin*.> [9]

Miletê dinyayê li ser dewletan ava bûye û tenê dewlet dikare bikire û bifiroşe û bikeve bazara dinyayê. Her tişt û îmkan, bi destê miletê ku xwedîdewlet in bireve diçe. Tenê miletên xwedî dewlet dikarin beşdarê civînên ***Welatên Yekbûyî*** bibin. Tenê miletê ku dewletên wan hene, dikarin axa xwe baş biparêzin. Miletê bê dewlet, wekî kêmnetew tê hesibandin û heq û hiqûqê wan jî, li ser kesan e. Mirov dikare bi hezaran mînakan nîşan bide ku dewletbûyîn çi maf û feyde dide milletan.

Li ser gotina dawî ez dixwaz im behsa gotina birêz Mesût Barzanî bikim ku dibêje, 'eger hûn alîkarî bidin min û piştevaniya min bikin, ez amade me dewleta kurdî ragihînim.' Mesût Barzanî jî dîroka kurdan, ez bawerim ku agahdar e û dizane ku tenê yekbûyîna pêkhateyên kurdan dikare parastina Kurdistanek serbixwe bike. Eger dewleta kurdî bête avakirin, hin dimenê çanda kurdan niha ve nîşan dide ku, dewleta kurdî , di warê heq û hiqûqê mirovan û kêmneteweyan de, ji piraniya welatê ereban û ji hin welatên Afrîkayê û Asyayê dê pêşdetir be. Mirov dibîne û rêvebertiya hikûmeta Heremê Kurdistana Başur jî nîşan daye ku piranîya kurdan aligirê welatekî sekuler, demokrat û pirdeng in.

Îcar çi dibe bila bibe û dawiya derbederiya me jî wekî, gotineke ***Sartre*** heye ku dibêje <dojeh, serhildan e>, bila dewleta kurdî ava bibe û ku qiyamet jî rabe û ji bo xêra

[9] Magt og Menneske, Historie på tværs, af en gruppe forsker, Gldendal, 2013.

avakirina Kurdistaneke serbixwe ye û wekî hemû miletan, miletê kurd jî layiqê wê serweriyê ye û ne tenê daxwaz e, lê heqekî xwezayî ye ku kurd bibin xwediyê desthilatdariya xwe. Ew dewlet dê bibe bingeheke nû, di hişmendiya kurdan de deftereke nû biafirîne û ew deftera spî dikare li ser Bakur, Rojhelat û Rojavayê Kurdistanê jî tesîrê bike, da ku kurd bi giştî bigihêjine armanca xwe; çawa ku tê gotin, di dilê her kurdekî de Kurdistana serbixwe heye.

**Sultan Arslan**
29.05.2015, Copenhagen

***Çavkanî***


***1-*** *Hvad er en stat, Mogens Herman Hansen. Det Kongelige Danske Videnskabernes Selskab-The Royal Danish Akademy of Sciences and Letters,2014.*

***2-*** *Statsdannelse,regimeforandring og økonomisk udvikling, Jørgen Møller, Hans Reitzels Forlag. 2012.*

***3-*** *www.felsefevan.org - Ali Gurdilli, kurd û dewlet.*

***4-*** *Çend rûpel ji dîroka gelê kurd, Dr.K.Mezher Ehmed,Stokholm 1991,Çap û weşanxana Apec.*

***5-*** *Kovarabir 13 Mart 2015.*

***6-*** *Magt og Menneske, Historie på tværs, af en gruppe forsker, Gldendal, 2013.*

***7-*** *Statsdannelse,regimeforanring og økonomiske udvikling, Jørgen Møller,2012, Hans Reitzels Forlag*

***8-*** *Filosofi, Politikens bog om politiske ideer, Paul Lübcke, politikens forlag 1995.*

***9-*** *Demokrati som styreform og som ideologi, Morgens Herman Hansen, Museum Tusculanus Forlag, Københavs Universitet 2010.*



Avakirina dewletê, hewcedariyeke jiyana civakî ye û ji bo mirov zarorî ye. Mirov bi afîrina xwe, bi aqil û hêza xwe meyla wan li ser qenciyê ne.

Mirov bi hêzên heywanî yên ku bi wî re ne, meyla xwe didin ser xirabiyê. Lê ji ber ku mirov mirov e, bêtir meyla wî li ser qerncî û xêrê ye. Ji ber vê yekê: dewlet avakirin û bi siyasetê re bilîbûna wî ji mirobûna wî tê.

**Ibnî Xeldûn| 1332-1406**

# Di Dîrokê de Bêedebiya Saziya Siyasetê û Bêtalihiya Felsefeyê

Dema mirov li tevahiya dîroka mirovahiyê dinihêre heyamên bi gelek dijwariyan derbasbûyî beşek mezin werdigire. (% 98 ji hemû jiyana mirovahiyê). Ev heyamanan wekî heyamên paleolîtîk û mezolîtîk têne bi navkirin ku demên dişibin jiyana ajalî û barbariyê ne. Di vê beşa mezin ya demjiyana civakan de, mirovan tenê bi komkeriyên ji xwezayê re debara xwe kirine. Paşê nêçîrvaniyê li vê komkeriyê zêde kirine û di qefên zinaran de, qul û qewêrên dar û şikeftan de vehewiyane. Ji ber nebûna zanîn û agahiyên derbarê xweza û jiyanê de, bi sed hezar salan wekî birran (keriyan) jiyana xwe bi komî û koçberî domandine. Lê bi ezmûnên ji jiyanê û bi çavdêrîkirina xwezayê re hin bi hin agahiyên wan zêde bûye, di nava zindiyên xwezayê de bûye tekanê zindiyê ku 'qisedan' pê dibe û 'aqil' bi kar tîne. Bi vê behreya ku ji ajalên din vediqete re dibe zindiyek polîtîk. Pê re jî ji bo mirovan heyama ku Arîstotelesî dibêje 'mirov, ajalek polîtîk yê ji candarên din cûda dijî' dest pê dike.

Bi herka dem û dîrokê re mirov êdî dibin xwedî ezmûnan ku bikaribin mifayê ji erd û zeviyan werbigirin. Ev pêşveçûn dawiyê li jiyana wan ya koçberiyê tîne û hêdî hêdî li dora erd û zeviyên xwe; ji heriyê, ji kevir û daran holikan (kokeleyan) çêdikin, hin ajalan kedî dikin û bi çandiniyê re bilî dibin. Ev rewş wekî şoreşa neolîtîkê tê bi navkirin û 'berî zayînê' li dora deh hezar salî rû dide.

Bi derbasbûna demê re hevkarî û hevpariya di karê rojane de, cihê xwe hêdî hêdî dide hêzê, hin kom dixwaze bibe xwedî ‘par’ a zêde û bi vê re jî mulkiyeta taybet pêş dikeve, hevpariya xwezayî ya di nav civakê de têk diçe û desthilatiya dewletokan dest pê dike. Her ku diçe gelheya wan zêde dibe û bi vê re jî cihê lê hêwirîne ji gundbûnê ber bi bajarîbûnê ve teşe digire. Di van hemû pêşveçûnan de ‘sumerî’ ji mirovahiyê re pêşengitiyê dikin û bingehê gelek îcatan diyarî mirovahiyê dikin: Wekî îcatkirina nivîsê, saziya siyaset û dewletê, zagon û hiqûqa nivîskî, bajarbûn, perestgeh, mîtolojî, teolojî û hwd. (1)

Zêdebûna nifûsê û jiyana rojane ya tevlihev, pêwîstiya dewletê bi xwe re tîne. Dewlet jî bi zagonan serweriya xwe didomîne. Zagon jî di demek direj de dikemile û wekî ‘makeqanûn’ dibe parçeyeke dewlet û civakê. Yasa û makeqanûn ji hêla ramanger, fîlozof û siyasetmedaran ve yan têne amadekirin yan jî têne pêşniyarkirin. Bi vê riyê xwestine ku sazûmana civakî pêk bînin, ewlehiya civakê, û aramiya (bêdengiya) civakê pratîze bikin.

Di Serdema Seretayî û Serdema Navîn de demokratîkbûna zagonan ne girîng e, ji ber ku li gelek aliyên dinyayê kom û xanedanên ku xwe dispartin ‘hêzê’ desthilatî û rêveberiya dewletê bi dest xistibûn û tenê li berjewendiyên xwe û yên hin komikan difikirîn. Ji ber vê çendê dewleta hiqûqê tunebû tenê ‘dewleta qanûnê’ hebû. Guherîn û veguherîna civakê tevî gelheya zêdebûyî, bi xwe re mecbûriyeta rêveberiyekê jî tîne û ev rêveberiya bivênevê, rê li ber polîtîkayê jî vedike. Serweriya polîtîk bi saya artêşê, bi talihî re, bi hêz û hebûna zanatiyê re tê bi destxistin. (5)

Bi pêkhatina vê yekê re êdî siyaset/polîtîka jî dibe parçeyek herî girîng ya jiyana mirovan. Ji civakê 'mirovên kone û xwedîhêz' erka desthilatiyê werdigirin û desthilatî di dîroka mirovahiyê de her ku diçe geş dibe, bi vê geşbûnê re jî desthilatiyên cur bi cur derdikevin holê, her yek ji hêlek ve ji bo ewlehî û bextewariya civakê dibe xwedî rol û ristê.

Monarşî, arîstokrasî, olîgarşî û demokrasî desthilatiyên herî bi nav û deng in ku di dîrokê de hatine sepandin. Lê ji ber ku mirov ji pêwîstiyan zêdetir xwedî xwestekên mezin in, tu carî ewlehî û bextewarî bi qasî ku dibe armanc pêk nayê. Çimkî dawiya xwestekên mirovan nayê. Bi qasî ku digihêje armanceke xwe, hêj bêhn negirtiye dikeve pey armancek mezintir û ev rewş jî herdem dubare dibe. Ji bo ku mirov di nava aştî û aramiyê de bijî, her heyamê siyasetmedar û hêzên desthilatdar ketine pey 'dewleteke îdeal' û ji vir pê ve jî felsefe têkilî pirsgirêkên civakî bûye û bi hin pêşniyazên xwe xwestiye ku rê li ber siyaseta xitimandî veke.

Mirov dikare siyasetê/polîtîkayê wekî 'hunera birêvebirina dewletê' bi nav bike. Felsefe jî beyî Xweda û zagonên olî tev li karê xwe bike, bi rê û rêbazên aqlî fêhmkirin û şirovekirina civakê, jiyanê, xwezayê û gerdûnê ye. Felsefeyê bi fikirîna azad xwestiye ku pirsgirêkên civakê an ji holê rake an jî ji bo jiholêrakirina wan bibe alîkar û rênîşander.

Ji van pirsgirêkan yek jî ew e ku kî an kîjan kom dê dewletê bi rê ve bibe, ye. Bi gotineke din pirs ev e: *Divê hêza serwer ya dewletê di destê kê de be? Gelo baş e ku tenê mirovekî (kral) an padîşahekî di hemû mijaran de xwedî erk/payeyek mutleq be?*

Yan jî pirs ev e: *Gelo desthilatiyek ji hêla mirovê herî baş ve an ji hêla qanûnên herî baş ve birêvebirin baştir e?* Li hêlekê dewlemend, li hêlekê zadegan/arîstokrat, li hêlek mirovên qenc/baş û şareza, li hêla din piraniya gel.

Ev komana di nava hev de tim di têkiliyeke dualî de bûne ku carinan di nava rikeberiya bi desthilatiyê re û carinan di nava lihevhatineke demdemî de bûne. Felsefeyê jî bi vê serê xwe êşandiye da ku riyek herka birêvebirina civak û dewletê hêsantir dike, bibîne. Tişta ku piraniya zana û fîlozofan li hev kiriye jî ew e ku diviya mirovê siyasetmedar ‘pirzan’ be.

Machiavelliyê îtalyanî ku di Serdema Nû de jiyaye û di pirtûka xwe ya navdar ku navê wê ‘Prens’ e de gelek taybetmendiyên desthilatdaran aniye zimên. Ji wan taybetmendiyan yên herî balkêş karekterên hikûmdaran yên di dilqên şêr û roviyan de ne. Ji bo bi guran re serî bê kişandin divê ew wekî şêran bin, lê ji bo ji dahfikan xwe rizgar bikin jî, divê wekî roviyan nehs û kone bin.

Bi gotinek din divê birêvebirên dewletê wekî şêran hov û jakaw, wekî roviyan jî fenok û hişyar bin. Şêr hem hêz e hem tirs e, rovî jî hem hiş e hem dek û dolab e. Di vê rewşê de tê dîtin ku divê desthilatdar tirsê jî di dilê gel de bi cih bike, lê dema vê yekê dike divê baldar be ku kîn û nefreta gel arasteyî xwe neke. Ji ber ku faktora sereke ya hikûmdar ji rêveberiyê bi dûr dixe kîn û nefreta gel e ya ku arasteyî wî dibe. (5)

Di vê mijarê de felsefevan Spînoza di pirtûka xwe ya ‘Lêkolîna Polîtîk’ de dide xuyakirin ku divê desthilatdar ji bo

qenciya dewleta xwe ligel tirsê hurmet, xelat û hêviyê jî bide gel da ku xwe ji kîn û nefreta gel biparêze û temen dirêj bijî. Spînoza dema vê ‘tirs û xelatê’ pêşniyar dike desthilatdaran şiyar dike ku divê ev tirs ne ji bo hemû gelî, lê divê ji bo mirovên xerab be: <*… ger ev tirs hem welatiyên baş û hem welatiyên xerab bigire bin bandora xwe, wê çaxê dewlet bi talûkeya herî mezin re rû bir û dimîne.*> (6)

Ji ber ku ev xetere rû nede divê qanûn çêker jî hewl bide ku bi ‘qanûnên baş’ welatekî ji mirovên bextewer û dewlemend pêk tê, biafirîne. Çimkî çawa ku Spînoza jî bilêv dike ***‘zagon ruhê dewletê ye.’*** Xerca wan çiqasî ji aqil û hestên hevpar yên civakê pêk were, dê ji hêla welatiyan ve ewqas jî were parastin. Lê ev jî rastiyek e ku armanca hemû mirovan bidestxistina jiyanek baş û bextewar e, mixabin beşek ji mirovan vê armanca xwe pêk tînin û beşek jê jî bi ser nakevin û têk diçin.

Ji bo ku mirov bibin mirovên hêj qenctir û baştir amadekirina planan, ji bo bidestxistina jiyanek baş wergirtina hin biryaran, peywirên sereke yên zagon çêkeran e. Divê neyê jibîrkirin ku fikirîna tiştên ‘divê bibe’ hêsan e, lê pratîzekirina wan gelekî zor e.

Di vir de pirsek nuh dertê holê ku gelo wê mirovê qenc çawa bigihêje? Pê re jî girîngiya ‘aqil’ û ‘perwerdehiyê’ jixweber dertê holê. Plansaziya vê yekê jî divê bi destê siyasetmedaran çêbe. Çimkî di avakirina civaka ku tê xeyalkirin de perwerdehiya zarokan û ciwanan xaleke bingehîn e.

Di vir de jî dîsa pirsa ‘perwerdehiyek çawa?’ dibe sedema nîqaşan. Ji bo tercîh û pergala herî guncan jî felsefe û siyaset bivênevê dê alîkariya hevdu bikin. Çimkî armanca herduyan jî bextewarî û başiya civakê ye. Li cem mirov de ‘hest û dil’ heye lê di zagonan de ‘aqil’ heye. Bi saya felsefeya siyasetê dê hest û aqil tevahiyekî pêkbîne û civaka ku tê xwestin dê derkeve holê.

Di vê biwarê de hin fîlozofan ji bo rêvebirina dewletek îdeal fikrên xwe derpêş kirine. Mînak Platon ji bo çareserkirina pirgirêkan wekî çareserî wiha gotiye: ‘Divê jin, zarok û mulkiyet hevpar be.’ (2)

Dîsa hin fîlozofan jî gotiye ger <maldarî/serwet> û <ax> bi awayek wekhev li civakê were parvekirin, dibe ku dewleta tê xeyalkirin derkeve holê. Bi serkeftina pêvajoya ku ewlehiya li jiyanêmayinê mîsoger dibe pê ve, ji bo mirovan heyamek nû dest pê dike.

Armanca destpêkê –çaxên paleolîtîk û neolîtîkê- ya mirovan tenê li jiyanêmayîn bû, lê piştî bi destxistina hin derfetan êdî jiyanek qenc û çak dibe armanca wan. (2) Ji bo vê armancê jî, divê mirovên xwedî hêz û vîn, bi riya polîtîkayê civakan bi rê ve bibin û jiyanek xweş û qenc bexşî wan bikin.

Bi vê daxwaza mirovan ya tenê ne jiyanek rût û bêtahm lê jiyanek hêj baştir û qenctir re, têkiliya siyaset û felsefeyê jî dest pê dike: Belê me li jor qala pêşveçûna pêvajoya civakîbûn û dewletbûnê kiribû. Bi zêdebûna mirovan ya di nava tixûbên kifşkirî de, civak bivênevê pêwîstiyê bi qanûn û makeqanûnan dibîne û ev rewş jî hin pirsan bi xwe re tîne:

***Makeqanûna herî baş kîjan e? Ger tu astengî tunebûya û me bixwesta makeqanûnek amade bikin, me yê ew çawa çêbikira?*** Lêkolînkirina van mijaran karê zanist û felsefeya siyasetê ye. Ji ber ku 'felsefeya siyasetê, bi piranî li ser şêweyên dewletan, desthilatdarî û desthilatdaran, civak û kesayetan, rêvebirin û rewabûna pergalên rêvebirinê û hwd radiweste.' (3)

Dîsa pirsa ***'gelo kîjan makeqanûn ji bo kîjan gelî guncan e?'*** jî peywira vê zanistê (zanista siyasetê) ye. Çimkî carinan gihîjtina 'ya herî baş' ne mumkûn e. Di van rewşan de divê zagon çêker û siyasetmedarên rastîn hem ya 'herî baş a mutleq' û hem jî 'ya herî baş a ji bo şert û mercên heyî' bizanibin. Dîsa li derveyî vanan, makeqanûna di halê hazir de dê çawa were başkirin/guhertin jî peywira siyaseta zanistê ye. Ji ber ku li her cihê civak lê heye bêyî zagon jiyîn ne gengaz e. Bi vê jî namîne divê pratîzekirina makeqanûnan jî pêkan be.

Di armanca esasî ya her dewleta nûjen de, li hember hemwelatiyan tevgerîna wekhev û adil heye. Lê dema ku hin kom û grub bizanibe ku edalet û wekhevî tenê ji bo hin kes an komikan e, wê demê jî pê vardiqilin ku ji hêla feydedîtin û edaletê ve hatine xapandin, bi vê re jî li hemberî serwerî, yasa û makeqanûnan serhildan dest pê dike.

Çimkî di bingeha xwesteka guherînê de 'newekhevî' heye û ev rewş piştî nerazîbûnan, bi guherîna desthilatiyê an jî bi guherîna makeqanûnê bi dawî dibe. Ji bo komên qerebalix yên ji gel serî hilnedin û ji desthilatiyê re nebin talûkeyek

mezin, desthilatdaran hin ‘meclîs’ ava kirine û ji gel jî nûner ji bo vê meclîsê hilbijartine.

Bi saya van hilbijartinên sembolîk yên hatine lidarxistin û bi bikaranîna rey/dengî re agirê siyasetê yê di dilê girseyên mezin de hatiye vemirandin û wan wisa bawer kiriye ku ew jî hevparên desthilatdariyê ne.

Mînak gava cotkarek an şivanek çar salan carê ji bo mebûsek hilbijêre diçe ber sandoqa dengdayînê, bi dengdayînê re wisa difikire ku ew di nava siyaseteke pir aktîf ya dewletê de ye û ev rewş ji bo rêveberên dewletê derfeteke zêrîn diafirîne da ku pergala xwe ya heyî bidomînin. Çimkî êdî ew komên cotkar û yên wekî wan, hetanî demek dirêj dê ji bo rêvebirina dewletê nebe talûke. Felsefeya siyasetê ji bo ku ev rewşa ku em behs dikin dernekeve holê, mecbûre ku serê xwe bi rêveberiyek qenc ya pêkan re biêşîne û ji bo pratîzekirina wê, peywirên hin saziyan bi aşkerayî kifş bike. Wekî saziyên birêvebirinê, rêzikdanînê/qanûnçêkirinê û darazê ku her yek bi peywirek bingehîn ya dewletê ve hatiye erkdarkirin.

Disa mirov dikare bibêje ku di hemû heyamên dîrokê de, rêveberên dewletê ji bo demjiyana desthilatiya xwe dirêj bike û bi hêza zagon û makeqanûna heyî re pergala xwe bidomîne diviya xwedî hin dek û dolaban be. Ev dek û dolab çawa ku me li jor behskir rol û karektera wan ya rovîtiyê jî eşkere dike: Nehsî û xapandina gel.

Hin ji xapandinên desthilatdaran ku li hemberî gel pêk tînin, mirov dikare wiha rêz bike: Wekî oldarên pak û paqij xuyakirin, ji bo memnunkirina gel pêkanîna hin tiştan -wekî

bi destê xwe xelatkirina yekê şareza, lê dema xetereya hin kesan ji bo desthilatdariyê xuya bû jî an bi hêza hin kesên din an jî bi hêza dadgehan bêbandorkirina wan- xuyanîbûna li gor zagonan tevgerîn, qabiliyeta rêvebirina komên ji desthilatiya heyî hez nake -wekî bi pîjkirin û sorkirinê derxistina hin aloziyan di navbera komên bi hev re nakok û bi vê şêweyê bêbandorkirina wan- astengkirina hêrs, kîn û nefreta hin kom û komikan ku dike ku desthilatiyê bihejîne.

Li hember van neyîniyên dibe ku polîtîkaya desthilatdar dimeşînin bi dawî bibe, desthilatdar carinan jî di dilqên siyasetmedarên xwedî rewanbêjiyê de gel bi gotinên derewîn dixapînin. Nola ku Arîstotelesî di 'Retorîka' xwe de qal dike, ev siyasetmedarên ku 'pisporên pê dan bawerkirinê' ne bêyî ku xwediyê zanayiyek rast bin, tenê ji bo raserî û desthilatiya xwe tiştên li xweşa girseyên gel dihere tînin zimên.

Siyasetmedar bi vê helwesta xwe jî dibin koleyên azweriya desthilatiyê û bi tevahî di nava sazûmana nirxên sexte de karên xwe dikin. (4) Bi gelemperî qala pêşerojek sexte ya waedkirî dikin. Ji siyasetmedarên wisa re ***demagog*** tê gotin ku kar û barê wan tenê bi *'hunera xapandinê ya bi gotinê'* gihîştina armaca xwe ye. Armanc tenê bidestxistina desthilatiyê û domandina wê ye.

Hêzên desthilatdar û siyasetmedarên kone, ji bo hin kêmnetewokan bi desthilatiya xwe ve girê bidin û xwe bi wan şîrîn bidin xuyakirin, hin derfetên dewletê pêşkêşî wan dikin. Jê hinek wekî karmend, jê hinek di asta duyem de wekî rêveberê hin saziyan tên peywirdarkirin û bi vî hawî desthilatiya xwe qewîn û domdar dikin. Ev xisletên rêzkirî û

yên wekî wan dike ku saziya siyasetê carinan bi bêedebiyê jî were wesfandin. Lê li hember vê, ji ber ku felsefe jî berjewendiyên hemû kom û komikan di jiyanek bextewer, hatî naskirin û fêmkirin de dibîne, tenê li dû rastiyê ye carinan bûye hedefa hin desthilatdaran û pêşveçûna felsefeyê asteng kirine, nehîştine ku ajdana xwe bidomîne.

Li cihê ku; li aliyek xwediyê ***'pergala koledar'*** dixwaze her peyva ji dev derdikeve wekî vîn û zagona xweda were fêhmkirin û qebûlkirin; li aliyê din jî pergala mirovên kole ku hêj nikarin xwedîtiyê li siya xwe jî bikin û tenê wekî alav û amûrên hilberînê tên bikaranîn hebe, wê felsefe jî jê xisarê bibîne. Vê rewşê bi qasî sê hezar salan zîhniyeta mirovahiyê tevlihev kiriye. (1) Ev jî bûye sedem ku felsefe wekî şaxek zanistê ya bêtalih/bêsiûd were dîtin.

Felsefeyê, ji 'siyasetê' hezar salî şûnde şert û mercên guncan yên ajdan û geşedanê dîtiye. Ev şert û mercên guncan jî ji krîz û kaosa pergalên koledariyê welidiye. Mirov dikare welidîn û serdema felsefeyê ber bi dawiya Serdema Seretayî *-bêrî zayînê sedsala 5an û piştî zayînê sedsala 5an-* bibîne. (1)
Ji ber ku wê çaxê ji Hindistan û Çînê hetanî Anatolîa û Yûnanistana Antîk hemû pergalên heyî di nava tevliheviyan de ne û ji her herêmê filozof derketine, ji bo çaredîtina pirsgirêkên civakan nêrînên xwe pêşkêş kirine. Wekî li Kurdistan û Îranê ***Zerdeşt***, li Hindistanê ***Budha***, li Çînê ***Konfîçyus***, li Yûnanistanê ***Thales***, ***Phitagoras***, ***Herakletîos***, ***Parmenîdes***, ***Sokrates***, ***Eflatûn***, ***Arîstoteles*** û yên din. Ev mirovên ewilîn yên li ser felsefeyê rawestiyane wekî ***'pêxemberên felsefeyê'*** têne binavkirin. (1)

Lê mixabin siyasetmedaran *(desthilardaran)* xebatên felsefeyê ji bo xwe wekî xetere dîtine, ji olên demê yên derbasdar sûd wergirtine û di bin siya xwedayan de polîtikayên xwe meşandine. Saziyên dewlet û siyasetê bûne mîna ûrên pençeşêrê, bi pest û pêkutiyan, bi alîkariya ramanên skolastîk *(doxmayên hişk)* hebûna xwe domandine.

Bi vê jî nemane pêşengên felsefeyê hinekan kuştine *-**Zerdeşt, Manî û Sokrates***- an sirgûn kirine *-**Arîsto***- û di encamê de felsefe dîsa bê nefes hatiye hîştin, tarîtiya Serdema Navîn dest pê kiriye. Vê tarîtiya ku felsefe bê henase hîştiye piştî zayînê ji sedsala 5an hetanî piştî zayînê sedsala 15an nêzîkî hezar salî domandiye (1) û bi destpêka ronesansê bi dawî bûye.

Mirov dikare bibêje ku ji ber bi 'desthilatiya ewilîn' ku berî zayînê nêzî 3500î li ser rûyê dinyayê li Mzopotamyaya Jêrîn, li welatê Sumeriyan dest pê dike, di demek kin de vediguhere desthilatiyek rahîb-dewletê ya polîtîk ku bi mîtolojî û teolojiyê dagirtî û bi xwe re pergala şaristaniya koledariyê dide sazkirin. Felsefe jî ji bo ajdanê bi hezar salan şûn de li axa ku derfeta fikirîna azad lê pêkan e -Yûnanistana Antîk- bi her cureyê xwe ve aj dide û ev ajdan û geşedan carinan were astegkirin jî, li dinyayê belav dibe û hetanî îroj didome.

**Mahmut Ozçelik**
firatt_muratt@hotmail.com
11.06.2015

***Çavkanî:***
***1.*** *Abdullah Öcalan, Sümer Rahip Devletinden Halk Cumhuriyetine Doğru, Mem yayınları, Cild I, 2001*
***2.*** *Aristoteles, Politika, Say Yayınları, Birinci Baskı, 2013*
***3.*** *Kovara Felsefevan, hejmar 2, sal: 1, 2015*
***4.*** *Aristoteles, Retorik, Yapı Kredi Yayınları, 2015*
***5.*** *Niccolo Machiavelli, Prens, Say Yayınları, 2015*
***6.*** *Spinoza, Politik İnceleme, Dost kitabevi Yayınları, 2012*

*Ew fîlozofên ku dê werin ser karê dewletê, dê wan şerefên rojanê yên ku hemû xelk îro li pey wan in, dê wan jêr bibînin. Dê ev fîlozof pêkanîna erkên xwe, ji hemû şerefan bilindtir û hêjatir bibînin. Lewra ew fîlozof, rastî û başiyê, ji hemû tiştî girîngtir dibînin û bi vê dîtina xwe re jî, dê ew di bin xizmeta gelê xwe de bin. Dê rastiyê şîn bikin û yasayên civakê jî, li hev bînin.*

***Platon | B.Z.427-347***



Hemû heyîn, ji Xwedê der çûne. Di destpêkê de bi tenê Xwedê heye. Ji Xweda yê ku heyînek rasteqîn û bivênevê ye, giyanek saf der diçe. Ev giyan, sebebê pêşîn e. Ji vê sebeba pêşîn jî, hemû giyan û laşên ku di gerdûnê de hene der çûne. Ev yek jî, aqilê çalak e. Mirov di asta pêşveçûna rih ya dawî de hilika heyînan dibîne û têdigihêje wan. Bextewarî jî, xwepakijkirina rihê mirov û ber bi aqil ve qesidîna mirov e.

**Ibnî Sîna| 980-1037**

Ibnî Sîna li rojavayê bi navê **<*Avicenna*>** tê naskirin û li cîhana îslamê jî jêre dibêjin <Şeyhûl Felasife- ango, Şêxê yan jî serokê Fîlozofan> tê gotin. Ibnî Sîna jî wekî Farabî li ser dozîneya Arîstoteles ya **<*Madde û Formê*>** rawestiya ye. Navê wî yê rasteqîn: ***Ebu Ali el-Hüseyin ibni Abdullah ibn-i Sina el-Belhi*** ye.

# Dewleta Neteweyî û Bidestxistina Mafê Çarenûsiyê

Netewe, heyîneke çandî û etnîkî ye û xwediyê ziman, dîrok, nirx û armanceke hevpar e. Dewlet jî, heyîneke polîtîk û jeopolîtîk e. Bêguman, di navbera saziya dewletê û netewetiyê de jî, têkiliyek xurt a berbiçav heye, ku meriv dikare dewletê wekî saziya yan rêxistina herî gewre, xurt û mezin a civakî binavîne. Li gor hinek çavkaniyên civaknas û dîrokzanan, dewletên neteweyî ji layê neteweyan ve hatina afirandin, li gor hinekên din jî ku meriv dikare wan kesan wekî aligirê modernîzmê binavîne; nasnameyên netewî encamên siyaseta dewletên ku hebûne derketine holê.

Ligel vê yekê wusa tê pejirandin ku dewletên neteweyî, di dewra ***Şoreşa Fransî*** de derketine holê û di vê dewrê de, civak ji feodalîzmê derbasî kapîtalîzmê bûne. Dewleta neteweyî, ew dewlet e ku meşrûiyeta xwe ji neteweyê xwe a ku li erdnîgeriyeke kifş dijî werdigre. Lewma jî, mirov dikare bibêje ku dewleta netewî, netewe û dewletê, ku heyîneke polîtîk e; li erdnigeriya xwe lihev tîne û bi vî wesfê xwe jî, ji dewletên berê xwe cihê dike.

Bervejiya şeklên dewletên berê, di dewleta netewî de welatî xwediyê nirx, çand û zimanekî hevpar in. Di dewleta netewî de, parastina ***bidestxistina mafê xwe yê çarenûsiyê yê neteweyan,*** esas e û ramana mafê otonomiyê jî diguncîne. Bi vê wesfa xwe ya berbiçav, ji bo gelek tevgerên neteweperest bûye çavkaniya hêvî û îlhameke mezin. Çawa ku berê jî me anî zimên, fikra dewleta netewî, di dema ***Şoreşa Fransî*** de

derketiye holê û di wê dewrê de, civak ji asta feodalîzmê derbasî asta kapîtalîzmê bûne. Di dewleta feodal de, çavkaniya meşrûiyetê monarşî bû. Lê çîna burjuvaziyê a ku piştî Şoreşa Fransî xurt bû, ji bo ku bikaribe serweriya (desthilatdariya) xwe ya polîtîk pêk bîne, bêgav bû ku piştgiriya girseyên civakî bidest bixe. Ji ber vê çendê jî, ji bo dawîlêanîna hêz û sîstema monark û pêkanîna desthilatdariya gel, tevgerên netewî hatine bihêzkirin û rê li ber, fikra serweriya netewî hatiye vekirin.

Şoreşa Sanayiyê ku di sedsala 19an de rûdabû, rê li berfirehbûn pêşveçûna çapemeniya nivîskî û perwerdehiyê vekir û girêdayî van rûdanên pêşverû, ziman, nirx û kulturên hevpar li cîhanê bêtir belav bûn. Bêguman, tevahiya rûdanên ku me behsa wan kir wiha kirine ku, dewletên netewî bêtir werin damezrandin.

Damezrandina dewletên neteweyî, a niha hêjî berdewam e û her netewe, dixwaze ku bi awayekî azad bijî û serweriya (desthilatdariya) xwe jî bila di destê xwe de be.
Mesela kêm zêde di 20 salên dawî de, li Ewropayê 16, ji Yekîtiya Sovyetan û Federasyonên Yugoslavyayê jî 16 dewletan serxwebûna xwe ragihandine. Dewletên wekî Kosova, Makedonya, Karadag û Slovenyayê û hwd. Bêguman, rûdanên dawî jî destnîşan dikin ku heyama netewe dewletan hêjî derbas nebûye û wer xwiya ye ku dê demekê dirêj berdewam jî bike.

Kurdistana ku berê mêtingeha çar dewletan bû û niha jî, sê perçeyên wê mêtingeh in, dagirkerên wê rê nedane ku li Kurdistanê şoreşa sanayiyê pêk were û çîna burjuvaziyê ya

kurd derbikeve holê. Ji xwe ta radeyeke, meriv nikare behsa çîna burjuvaziya kurd jî bike; lewre çîna ku bi navê <burjuvaziya kurd> tê binavkirin, li nasnameya xwe ya neteweyî xwedî derneketiye û bûye nokerê dagirkerên welatê xwe. Ligel vê yekê, meriv dikare behsa çîneke bazirgan ya kurd bike, ku ew jî xwediyê sermiyaneke biçûk in û ne xwediyê derfetên mezin in, ku rabin û xizmeta neteweya xwe bikin yan daxwaza dewleta xwe ya neteweyî bikin.

Hasilê, jiber ku Kurdistan mêtingeh e, dagirkeran rê nedane ku gelek rûdanên cîhanê yên pêşverû û civakî, li Kurdistanê derbikevin holê û hemû çavkaniyên welêt, yan hatine talankirin û yan jî hatine tunekirin. Lewma jî, gelek rûdanên xwezayî û civakî yên ku li deverên cihêreng hatine dîtin, li Kurdistanê pêk nehatine û Kurdistan, ji wan bandûran hatiye îzolekirin.

Devletên Dagirkerên Kurdistanê ola xwe jî bi gotina <em birayên hev yên heman olê ne> herdem wekî alavekî bikar anîne û bi vê yekê xwestine ku rê li ber hestên kurdan yên netewî bigrin. Lê bi derengî be jî, meriv dikare bibêje ku kurd jî êdî têgihiştine giringiya hêza netewî û dixwazin ku hemû mafên xwe yên neteweyî bi dest bixin.

Kurd, bi sedê sal in ku di bin zilm û zordestiya dagirkeran de ne û fikra dewleta kurdî ya serbixwe hêviya wan ya herî mezin e. Lewma jî çi dibe bila be, tu carî divê em xwe bêhevî nekin û herdem doza dewleta xwe bikin.

Wekî gotina dawî jî, dixwazim ku bi gotineka zimanzan û feylesofê ***Noam Chomsky*** vê gotarê biqedînim: < Ti caran, dev ji fikra Kurdistana yekgirtî û serbixwe bernedin. Çimku sînorên ku ji aliyê emperyalîstan ve hatine destnîşankirin, niha ji holê radibin û encama vê yekê jî, ne diyar e.>


**Bengîn Amedî**
bengino@hotmail.com
05.06.2013

***Çavkanî***

***1-*** *www.felsefevan.org*
***2-*** *Abdulvahap Akinci, Modern Devletlerin Doğuşu, Dumlupınar Üniv. Sosyal Bilimler Dergisi, sayı 34, Aralık/2012*
***3-*** *Ozan Erözen , Ulus-Devlet, Dost yayınevi, Ankara/1997*

*Ti caran ji bîr nekin! Demokrasî, karekî perwerdehiyê ye. Ger hûn bi girseyên neperwerdekirî demokrasiyeke ava bikin, ev yek dibe olîgarşî. Di rewşeke wiha de, demagog hasil dibin û ji demagogan jî, dîktator/zorker dertên.*

***Platon - Eflatûn***



Her heyînek, neynikek e ji bo navên îlahî. Mirov dema ku ayetên bi devkî dixwîne, divê ji aliyê din ve jî mirov ayetên xwiyakirî yên ku di gerdûnê de hene jî bixwîne. Lewra ew hevdu rave dikin û dibin piştgirên hevdu.

Zanist xizmeta dîtina navên îlahî dikin, ku di gerdûnê de bi awayekî xwe dane der. Hemû zanistên ku hûn wan dixwînin û fêr dibin, afiranderê we nîşanê we didin. Ne mamosteyên xwe, belam fen û zanistê bişopînin.

**Mele Seîdê Kurdî | 1878-1960**

Zanyarê îslamê yê kurd. Alim. Nivîskarê ***Rîsaleyên Nûr***. Xwe bi xwe gihandiye. Ji alimên kurd û yên Stenbolê teqdîrê sitandiye. Nasnavê ***Bediuzzeman*** lê kirine ku di wateya **<*Yê herî delal ê zeman*>** de ye. Di hemû jiyana xwe de hewl daye xwe ku bikaribe ***'heqîqetên îmanê'*** belav bike. Derheqê zanist û felsefeyê de xwediyê zanîneke kûr bû. Rexneyên dijwar li fîlozofên madeperest girtiye.

# Xweza û Dewlet

Xweza, weke derbirîna heyîbûna tevahiya heyîtiyê, ew yekûna hemû qewimînên dîtbar û nepenî ye ku temamî rûdan têde li ser binateyek hevkarî-pevçûneke bêrawestan pêk dihên. Tevahiya hêman û fonksiyonan (wek pirtik/partîkulên elemanter û çar hêzên bingehîn) li ser esasek dijberî-hevkariyê, dibin bireserîtiya temamî kirûyên xwezayê.

Astrofîzîknasê Kanadayî profesor ***Hubert Reeves*** dibêje: Li gorî teoriya Big Bang, *(ku li gorî wê, Gerdûn beriya 13-14 milyar salan, bi teqîna 'cih û temtêl' ek bêdawî hûr, bêdawî tîr ve xuriciye)* di serdema xwe ya ewil de Gerdûn di bin serpereştiya germahiyek bêhed de bû.

Di gerdûnê de bûjen *(made)* û dijbûjen *(antîmade)* bi rêjeyek wekhev hebûna xwe didomandin, û di her li hevûdu qelibînekê de partîkul û dijpartîkulan hevûdu tine dikirin, ji vê yekê tenê roniyek xwerû dihat holê. Astofîzîknasê rus ***Andrei Dmitrievitch Sakharov*** bi pîvanên ezmûnî da nîşandan ku di saya ferqek zor zor kêm a rêjeyî de, ji milyarekê yek partîkul pêrgî dijpartîkulek nehatiye û bi vî awayî binateya qewimîna gerdûna me ya îroyîn saz bûye. (1)

Her waha ***Hubert Reeves*** di wê baweriyê de ye ku xweza pêvajoyek ji 'tesaduf û pêwistî' yê ye. û ji bo vê yekê mînakek waha dihîne : « Şeş milyar mirov ji lay heman zagonan *(pêwistiyê)* ve dihên afirandin, lê ji aliyê xûy û rûçikan ve ji hevûdu cudabûna 6 milyar mirovan hilbera tesadufê ye.»

Lê li pişt vê têgeha 'tesaduf' ê bixwe jî pêvajoyek tijî raz û pirsên neçareserkirî li kar e, sebaret derbarê mijarên ku xwe têkilî çarenûsa mirovî dikin de, yên wek ziman, nijad, zayend, reng... û ger mirov bihîne bîra xwe ku xweza ji bo ku

xwe ji kaos û aloziyek bêserûbin biparêze mecbûrê hebûna hin pîvan û kêşeyan e, ew çax derdikeve holê ku têgeha tesadufê ne ewqas zêde tesaduf e.

Hemû heyîn û heyber, ji ber mekanîzmek determînîst a xwezayî, hêj di destpêkê de bi hawayekî kategorîzebûyî derdikevin bal hebûnê. Anku bi nasnameyek diyar ve xwe-kifşkirin, bi xwezayê re yekemîn dayîn-standina heyînan e ku jê nirxên otantîk çêdibin. Îfadeya herî bilind a vê dayîn-standinê zayend, nijad û ziman e li cem mirovan. Lê karê kemalet, parastin, pêşvexistin, rûmetdarkirin, geşepêdana van nirxan bi temamî dikeve ser milê behremendiyên wek xîret, xebat, wêrekî û zîrekiyê.

Kesayetên ku mezintirîn şayîşa wan, tevgerîna li gorî van qalîteyan e, anku, kesên ku hêjatiyên wek heşmendî, wêrekî, xîret û zîrekiyê hildabin navenda jiyana xwe, bivê-nevê xwe digihînin asta têgijek *(şuûrek)* ku ji bo pirraniya beşine civakê yên mayî nebeled, biyan û nenas e.

Gelo piştî gihîştina li vê qonaxa têgihîştin û zanatiyê, rewşa vê nasnameya otantîk çi dibêje ji bo rewşenbîrên kurd ên dilsoj û dilsozên nasnameya xwe?

Mixabin têkirdetî *(edîlgenî, pasîvîte)*, têkçûyîn û paravîyek mezin û bêhempa! Lewma îro şerm, xem û janek kûr xwe berdane nav dilê her rewşenbîrekî rast û dirust. Bêguman her kurdek ku ji rewş û temtêla xwe ya îro şerm nake, ew hêj negihîştiye wê zanebûnê ya ku şermkirinê hînê wî/wê bike lewma.

Li pêşberî û di nava xwezayê de di nav qelsî, neçarî û hewcetiyan de bûn çawa ku rewşeke xwezayî ye; bi saya hevkarî û bihevkirinan ve xwe bihêzkirin, û hewla xwe

gîhandina pêkarbûnekê jî ewqas halekî mirovî ye. Hawayê herî raser ê vê bihevkirin-organîzasyona ku mirov pê ji xwe re pêkarbûnek layiqê rûmet û abûr/heysiyeta xwe peyda dikin: Dewlet e.

Dewlet, ger wek peymaneke ku ji bo hevrejînekê di navbera mirovan de dihêt kirin ; yan jî wek ew saziya ku çînek, zumreyek pê zumreyek din dişêlîne-dizêrîne, were dîtin ti carê rastiya li hevudu hewcebûna ferdan ji holê ranake.

Li gorî ***Platon****,* ferd ji ber ku tena serê xwe nivîşkan û kêmhêz in ji bo parastin û berdewamiya jiyanê, bi neçarî hewciyê hevûdu bûne û hatine bal hev. Ev kombûn e ku dibe binateya hemû sazbûn û organizasyonên civakî yên ku dê wek dewlet yan jî saziyek din bihên binavkirin. (2)

Çi wek sembola ku dibe îfadeya pêvajoyek derûnî, çi jî wek saziyek madî bihêt dîtin û pênasekirin, dawiya dawî, dewlet berztirîn asta hewl û kiryara hevgirtinek mirovî ye li hember qelsî, hewcetî, nepêkarî, keser, xedarî, hevî û neçariyên ku ji hindir û derva ve xwe disepînin ser mirov...

Li vir, ji rawestîna li ser pênaseyên têgehî zêdetir, dixwazim werim ser mijara etimolojiya peyva berginda Dewletê ya di zimanên ewropî de.

Tiştek seyr e ku maneya peyva ku zimanên Ewropî jê peyva Dewletê çêkirine pirr balkêş e anegorî wateya peyvek bi girîngiyek giran ve di zimanê me de li kar e.

Ji bo peyva dewletê di zimanê Fransî de 'êtat', di yê Ingilîzî de 'state', di yê Italyanî de 'stato'... dihêt gotin. Li gorî ferhenga ***'Larousse étymologique'*** koka van peyvan ji peyva 'status' a Latînî dihêt û ev peyv bi xwe jî ji lêkera 'star' a Latînî derketîye. Wateya vê lêkera 'star' ê ev e «xwe li piya girtin, şiyana mayîna li (ser) piyan.»

Di zimanê Kurdî de ev peyva <star> kîjan wateyê dide? Di ferhenga D. Izolî de waha hatiye hizwartin: 'xwe parastin, xwe hêwirandin û xwe spartin.'
Yanî ew «liv û tevgera ku hemû zindî bê sekin di nav de ne ji bo karbûna li piya mayînê û domandina jîyanê.» Anku ew hewcetiya herî pêwîst, herî jêneger a ku hemû formên zindiyan, ji yên kitşane bigire heta yên herî binyad têkel, li dû ne.

Gava dewlet bi vê wateya xwe ve ev hewcetiya jêneger a hemû zindîyan be, çawa pêkan e ku ji layê hin zindiyan ve bihêt redkirin? Dibe gelo ji zindiyên li ser axa Mezopotamiyayê, cureyek tûşê mûtasyonek nedîtî û sosret bûye, îca pispor û zanistmendên biyolojiyê vê sirê ji me û ji hemû cîhanê vedişêrin?

**Orhan Agirî**
orhanagiri@hotmail.com
12.07.2015

***Çavkanî***

***1-*** *Hubert Reeves, Là où croît le péril... croît aussi ce qui sauve. Edition du Seuil, septembre 2013*
***2-*** *Platon, La République. Flammarion, Paris, 2002.*

Yên tevayî encax weke hilbera ramana nedîtbar û di nav xebateka zanistî de, dikarin derbikevine holê. Ew ne hêla hevpar ya pirraniyê ne, ew bi tenê navên ku li wan têne barkirin in. Ji ber vê yekê jî zanist divê ne li tevahiyê, divê li yên taybet û tekane vekole. Çimku bi tenê rasteqîniya heyînên tekane/yekhejmar heye.

Tişt, ji destpêka xwe ve weke tekane/weke şexs hene û ezmûn bingeha hemû texlîd zanayiya  ye. Yên taybet, heyînên tekane û çêbûna bûyeran, bi tenê bi riya ezmûn û zanayiya ku xwe dispêre sehekan, dikarin werin zanîn.

Herweha yekîtiya Xwedê, bêdawîtiya wî û heta hebûna wî jî, bi awayekî misoger nikare were peyîtandin. Zanayiyên bi vî rengî, encax dikarin bibin babeta baweriyê û bi baweriyê dikarin werin pejirandin. Ev zanayî, ne dikarin werin peyîtandin û ne jî dikarin di peyîtandinê de weke hêmanekî werin dîtin.

**Williamê Okhamî | 1285-1347**

***Williamê Okhamî***, wek ***Wilhelm von Ockham*** û wek ***William of Ockham*** jî tê nasîn. Fîlozofekî navdar yê dewra felsefeya ***Skolastîk*** e. Williamê Ockhamî, wekî damezranerê ***Nomînalîzmê*** tê dîtin. Li gor baweriya wî yên tevayî (tumelî) ne xwediyê çêbûneke rasteqîn in û ew tiştên çêkirî ne. Mirov dikare bibêje ku ramanên wî beriya 300 salan, mizgîniya ***Ronesansê*** didane me.

# Têgeh û Pirsgirêkên Felsefeya Siyasetê

Siyaset, karê birêvebirin û sazkirina dewletê ye. Babeta felsefeya siyasetê, dewlet e. Ji serdema pêşîn ve dewlet mijara lêkolînên fîlozofa ye û fîlozof, herdem li ser bûyera dewletê rawestiyane. Ji ***Platonî*** bigirin, heta ***Arîstotelesî***, ***Macahiavelli, J.J. Rouseau*** û heta fîlozofê ***Hegel***, li ser têgeha dewletê rawestiyane û gelek zanayiyên rexneyî pêşkêş kirine. Armanca wan ya bingehîn ew bûye ku, bûyera siyasetê şirove bikin û di vê babetê de, dozîneyeke ava bikin. Ji beşa felsefeyê a ku dixwaze çêbûn û çavkaniya dewletê û têkiliyên dewletê ya bi şexsan re û sebebê berdewama dewletê fam bike û bizanibe gelo ka ji rêberiya îroyîn rêveberiyeke çêtir heye yan na re, ***felsefeya siyasetê*** tê gotin.

Zanista siyasetê, bala xwe zêdetir dide **<*a ku heye.*>** Lê felsefeya siyasetê, bala xwe zêdetir dide **<*a ku divê hebe*>** û li ser **<*a ku divê hebin*>** radiweste. Dewlet, piştî ku civakan dest bi jiyana bicîhbûyî <*jiyana nekoçber*> kirine derketiye holê.

Mirovan, xwestine ku dewleteka ku heta hetayê bijî ava bikin, lê di vê yekê de bi ser neketine. Çimku her dewleta ku derketiye holê, hilbera şert û mercên wê demê ye û di her serdemê de hindek îde *(raman)* hebûne ku di wê demê de bûne îdeyên serwer û bi vî rengî jî, xwe dane der.
Mesela îdeya serdema navîn ew bû ku dixwest hemû mirovahiyê di bin banekê olî de bicivîne û bi vê yekê jî, xwe bigihîne îdeya dewleteke gerdûnî. Îdeya serdema nû jî, wekhevî û serbestî bû.

***Têgehên Bingehîn yên Felsefeya Siyasetê***

***1- Dewlet:*** *Dewlet rêxistîbûneke siyasî ye û ji aliyê civakên ku li welatekî de dijîn, tê ava kirin. Hêmanên dewletê: gel, welat û serwerî ne.*

***2- Desthilatî [îktîdar]:*** *Livoka ku di rêveberiyê de xwedîhêz e û rêbeberiyê di destê xwe de digre. Ji bo demeke be jî, erka hêzê yan jî rêveberiyê bikar tîne.*

***3- Serwerî:*** *Ji aliyê dewletê ve bikaranîna hêza desthilatiyê ye. Dewlet bi saya vê hêmanê, li hemberî dewletên biyanî, bi awayekî serbixwe tevdigere.*

***4- Meşrûtî [Rewatî, Rewayî, Awiştî]:*** *Rewşa, ku li gor zagona ye. Li hember bandêra hiqûqî, amizgeriya tevgera ye.*

***5- Zagon [Yasa, Qanûn]:*** *Rê û rêzikên nivîskî yên ku xwediyê danekirinê ne.*

***6- Maf [Heq]:*** *Xwestekên şexsan yên ku li gorî rê û rêzikan in.*

***7- Hiqûq:*** *Koma rê û rêzikên nivîskî, ku têkiliyên di navbera mirovan de verast dikin û ku hêza xwe ya danekirinê, ji dewletê werdigrin.*

***8- Civak:*** *Koma mirovên ku li ser axaka hevpar dijîn û ku xwediyê armancên hevpar in. Di civakê de çanda wan hevpar e û li hemberî hevdu xwedîberpirsiyar in.*

***9- Şexs:*** *Mirovên ku civakê pêk tînin, in.*

***10- Civaka Şarwer [Civaka Sivîl, Civaka Ne Leşkerî]:*** *Rêxistîbûna derveyê dewletê. Civaka sivîl li derveyê têkoşîna îktîdarê ye û avahiyeke demokratîk e.*

*Lê ji bo kifşkirin û berhêlîkirina tevgerê dixebite. Di civakên hemdem de şexs, ji bo armanc û berjewendiyên xwe yên şexsî, têne cem hevdu û bi vî awayî têdikoşin. Ev yek jî, bi riya civaka sivîl pêk tê. Ango bi saya civaka sivîl, şexs li hemberî dewletê bi tenê namînin û bi şexsên din re yên ku pêdivî bi hevkariya hevdu*

*dibînin; li hemberê dewletê radiwestin û têdikoşin. Hêza xwe jî, ji bîr û raya giştî digrin.*
***Burokrasî:*** *Rêxistîbûna civakî ya destûrmendên dewletê ye. Burokrat, bi awayekî hiyerarşîk karê xwe dikin.*

***Pirsên Bingehîn yên Felsefeya Siyasetê***

*Felsefeya siysetê dema ku li bersiva pirsên weke* ***<Dewlet çi ye?>****,* ***<Desthilatdarî çi ye?> <Civaka sivîl çi ye?>*** *û hwd. digere û hewl dide ku bi van bersivan bizanibe, rastê hinek pirsên din jî dibe:*

***1-*** *Desthilatî hêza xwe <yan jî çavkaniya xwe> ji kû distîne?*
***2-*** *Pîvana meşrûtiya desthilatiyê çi ye?*
***3-*** *Bi çend şeklan desthilatî tê bikaranîn?*
***4-*** *Maf û serbestiyên bingehîn yên şexsan çi ne?*
***5-*** *Gelo dê mirov bikaribin rojekê dev ji burokrasiyê berdin?*
***6-*** *Wateya civaka sivîl çi ye?*

***Çavkaniya Desthilatdariyê çi ye?***

***1-*** *Desthilatdarî, ji bo parastina şexsan û ji bo ku şexs bikaribin armancên xwe pêk bînin heye. Desthilatdarî ji ramana parastinê der çûye, ku di vê ramanê de li hemberî êrîş û xeteriyên derve û navxweyî, parastin heye.*
***2-*** *Desthilatdarî, çavkaniya* ***<hêza>*** *xwe ji Xwedê digre û desthilatdarî li ser rûyê erdê nûnerê Xwedê ye.*
***3-*** *Çavkaniya desthilatdariyê, îradeya hevpar ya şexsa ye. Yên ku vê ramanê diparêzin;* ***T. Hobbes****,* ***J. Locke*** *û* ***J.J. Rouseau*** *ne.*

Li gor ramanên jorîn çavkaniya desthilatdariyê yan pêdiviyên mirovan, yan ol û an jî, peymana civakî ye. Heke em bi awayekî berfirehtir li babetê mêze bikin; wê demê em dikarin bibêjin ku meşrûiyeta desthilatdariya siyasî, girêdayî wê hêza yan jî ramana ku ew afirandiye, ye.

Mesela ***Arîstoteles*** digot: *<Armanca dewletê ya bingehîn ew e ku ji hêla ehlaqê ve, hemwelatiyên xwe pak û xurt bike. Başî yan jî xirabiya dewletê jî, girêdayî pêkanîna vê wezîfeyê ye.>*
Li gor ramanwerên serdema navîn jî, meşrûiyeta dewletê girêdayî pêkanîna misyonên olî bû û divabû ku dewlet, li ser rûyê erdê nûnertiya Xwedê bike.
Li gor nêrîna ***Karl Marx*** jî; dewlet di destê çînên serwer de alaveke zordestiyê ye û xizmeta çînên serdest dike û meşrûiyeta xwe jî, ji vê xizmetê werdigre.

***Awayên Bikaranîna Serweriyê***
***1- Serweriya Kevnoşopî:*** *Di vê şeklê serweriyê de kar û çalakiyên rêveberan û têkiliyên birêvebirin û hatin birêvebirinê, li gorî adet û kevneşopiyan têne kifşkirin. Îteatiyeka (sitûxwarkirineka) teqez heye. Birêvebirin ji bavê digihêje kur. Guherîn jî, hêdî hêdî pêk tê.*
***2- Serweriya Qarîzmatîk:*** *Serweriya serokek î xwedîhêz e. Di civakê de serok serweriya xwe, ji serkeftinên xwe û karên ku pêkaniye werdigre.*
***3- Serweriya Rasyonel/Zagonî:*** *Serwerî, di çerçoveyeke zagonî de dimeşe. Di civakên hemdem de, tê dîtin ku di vê şeklê serweriyê de pirensîpa* ***<cudatiya hêzan>*** *ango, qanûnçêkirin, birêvebririn û darêzgerî tê cîbicîkirin.*

***Mafên Şexsan Yên Bingehîn û Serbestiyên Wan***
Ev maf, mafên şexsan yên bingehîn in û nikarin werin dewirkirin. Mafê fikirîn, belavkirina fikirînê, mafê bidestxistina milk (malhebûn) û mafê hilbijartin û hilbijirînê û hwd. Ev maf ji aliyê ***Neteweyên Yekbûyî*** (BM) ve di ***10****ê* ***Kanûna 1948****an* de, di ***Daxuyannameya Mafên Mirovî*** de hatine destnîşankirin.
***Dewlet çawa derketiye holê?***

*Di warê derketina holê ya dewletê de, mirov dikare bibêje ku du teoriyên sereke hene:*

***1-*** *Dewlet saziyeka xwazî ye û bi awayekî xwezayî derketiye holê.*

***2-*** *Dewlet saziyeka çêkirî ye û wiha derketiye holê.*

***1- Dewlet Saziyeka Xwezayî ye:*** *Ji aliyê* ***Platonî*** *ve hatiye parastin. Platon dewletê weke organîzmeyeke makro ditiye. Platon, bingeha dewletê di xwezayê de û di tebîeta mirovî de dibîne. Platon dibêje ku ti kes nikare bi serê xwe tenê hemû pêdiviyên xwe pêkbîne û lewma jî, pêdivî bi alîkariya hinekên din heye û di civakekê de, rêveber divê fîlozof bin.*

***Arîstoteles*** jî vê ramana ***Platonî*** ya ku dibêje; <dewlet saziyeka xwezayî ye>, dipejirîne û dibêje ku, mirov xwediyê navgîna/taybetmendiya jiyana civakî ye. Di nav mirovan de û li cem wan, meyla <*jiyaneka bi hevdu re*> heye.

Çimku taybetmendiyên ku xwezayê daye mirovan, ew encax di civakekê de dikarin vê yekê pêk bînin. Ji ber vê yekê ye ku dewlet, li cem mirov digihêje bingehekê û dibe berdewama xwezayê.

***2- Dewlet Saziyeka Çêkirî ye:*** Ji aliyê ***J.J. Rouseau, T. Hobbes*** û ***J. Locke*** ve hatiye parastin. Li gor T. Hobbes, mirov ji tebîetê xwe ve jixwerexwaz <*egoîst, xweperest*> e. Bi tenê, ji bo berjewendiya xwe kar dike. Ji bo ku bi tenê, ji bo berjewendiya xwe têdikoşe; <*mirov, gurê mirov e.*>

Ev yek jî di nav mirovan de rê li gelemşeyan <*şer, pêvçûn, nerazîbûnan*> vedike. J i bo rêliberdadana gelemşeyan, mirov têne cem hevdu û sitûyên xwe, ji otoriteyeke raser re ditewînin. Bi vî awayî organîzasyona siyasî, ango dewlet dertê holê.

***J.J. Rouseau*** jî, di berhema xwe ya bi navê ***<Peymana Civakê>*** de dibêje: <*Dewlet, di encama peymaneka ku mirovan di navbera xwe de çêkirine û ku dixwazin bi saya vê peymanê serbest bijîn, derketiye holê.*> Armanca vê peymanê ew e ku mirov, bi awayekî misoger bigihêjin wekheviyê. Ev peyman, bi saya îradeya şexsan ya serbest, pêk tê.

**Lêgerana Bandêreka Îdeal**

Hinek ramanwerên ku bandêra sîyasî ne bi dilê wan bûye, li bandêreka îdeal geriya ne. Lêgerana vê bandêreka îdeal, rê li du ramanên dijber vekiriye.

***1- Fîlozofên ku ji bandêreka îdeal bawer nakin.***

***A- Fîlozofên Sofîst:*** *Fîlozofên sofîst, dibêjin ku dewlet saziyeke çêkirî/nexwezayî ye. Mirov, pîvanên hemû tiştî ne û her tişt, li gor mirovan diguhere û bandêreka ku ji aliyê hemû mirovan ve were xwestin jî tune. Di xwezayê de çawa ku yên xwedîhêz dikare xwe biparêze û bijî, di civakê de jî yên xwedîhêz divê ku serwer bin.*

***B- Fîlozofên Nihilîst:*** *Nihilîst hemû cure nîrx, armanc û otorîteyê red dikin û dijberê hemû zordestiyên civakî, siyasî û ehlaqî ne. Ji ber vê çendê jî, ji ber ku li dijî xwezaya mirov e; dewlet û hemû celebên bandêra civakî red dikin.*

*Di vê xalê de, mirov dikare bibêje ku bi anarşîzmê re heman ramanê dipejirînin. Çimku li gor anarşîzmê jî, dewlet mîna çavkaniya gelek xirabiyan tê dîtin û ji bo ku civak bikaribe bextewar bijî, divê dewlet ji holê were rakirin.*

***2- Fîozofên ku baweriya xwe bi bandêreka îdeal tînin.***

***A- Yên ku serbestiyê weke bingeheke dibînin:***

*Ji vê ramanê/tevgerê re* ***liberalîzm*** *tê gotin. Takekesîtî, li pêş e. Ji bo hebûna bandêreke îdeal, pêdivî bi serbestiya ferdan heye. Wekhevî jî, encak dikare wekheviya azadiyan be. Serbestiya şexsan,*

*mafê wan yê herî xwezayî ye. Nûnerên vê ramanê* ***A. Smith****,* ***St. Mill*** *û* ***John Locke*** *in.*

***B- Fîlozofên ku wekheviyê weke bingeh dibînin:***

*Ji vê ramanê re sosyalîzm tê gotin. Mafê bingehîn yê şexsan, jiyanek wekhev e. Ji bo avakirina wekheviyê jî, divê hemû haletên (makîneyên) hilberandinê, ji destê şexsan werin derxistin û bibin malê hemû civakê. Serbestî, di rêza duyemîn de tê dîtin. Bandêra îdeal jî, encax di civakeka bêçîn de dikare pêk were. Parastkarê vê ramanê* ***S. Simon****,* ***R. Owen*** *û* ***K. Marx*** *in.*

***C- Fîlozofên ku edaletê weke bingeh dibînin:***

*Ev tevger yan raman, mirov dikare bibêje ku li dijî* ***lîberalîzm*** *û* ***sosyalîzmê*** *weke bertekekî derketiye holê. Edaletê weke pirensibeke bingehîn dibînin û wiha bawer dikin ku, li ser bingeha wekhevî û serbestiyê, civakek îdeal dikare were avakirin. Mafê şexsan yên bingehîn û serbestiya wan, esas e. Pîvanên bandêrek îdeal wiha tê vegotin: Serbestî, wekhevî, edalet, raseriya hiqûqê, serweriya gel û demokrasî. Parastkarê vê ramanê ê sereke,* ***J. Rawis*** *e.*

***Ali Gurdilî***
*felsefevan@hotmail.com*
*18.06.2015*

***Jêder***

***1-*** *Di Sed Pirsan de Danasîna Felsefeyê. Ali Gurdilî. Neçapbûyî.*
*2- http://www.felsefevan.org/legerina-bandereke-ideal.html*
***3-*** *http://www.felsefevan.org/awayen-bikaranina-serweriye.html*
***4-*** *http://www.felsefevan.org/cavkaniya-desthilatdariye.html*
***5****- http://www.felsefevan.org/dewlet-cawa-derketiye-hole.html*
***6-*** *http://www.felsefevan.org/tegehen-bingehin-yen-felsefeya-siyasete.html*
***7-*** *http://www.felsefevan.org/8932.html*

# FELSEFEYA SIYASETÊ ÇI YE?

Beyî ku em li ser felsefeya siyasetê çend şîroveyan bikin divê em di serî de van her du bêjayan (siyaset û felsefe) ji aliyê têgehan ve zelal bikin. Siyaset (polîtîka) û felsefe du têgehên sereke yên mirovahiyê ne. Ji ber ku wisa ye divê li ser van her du têgehan bi berfirehî nîqaş bên kirin. Ji bo vê yekê jî pêwist e pênaseyên van her du têgehan were kirin. Loma li vir em dê bi kurtasî pênasa siyasetê û felsefeyê bikin û piştre jî em dê lêbinêrin ka felsefeya siyasetê çi ye.

Ji bo siyasetê pênaseya herî baş li gor me -ji ber ku wek hemî têgehên din li ser têgaha siyasetê jî hevkirinek tune- ev e: Siyaset hunera rêvebirînê ye û ew têkoşîna ku di navbera dijberan (çîn, hêmanên nîjadî, zayend û hwd.) de ya ku ji bo desthilatdariyê tê kirin diyar dike. Dîroka têgeha siyasetê pir kevn e û bi demê re jî guhertinên naverokî derbas kiriye. Ewil tenê siyaset li ser xwendina ‘dewlet û desthilatdariyê’ diçû lê niha mijarên nû jî lê zêde bûne. Êdî dema em qala têgeha siyasetê dikin ne tenê dewlet û desthilatdarî di heman demê de beşdarbûna civakê ya di pergala rêvebirînê de, têkiliyên civak û desthilatdariyê, guherîn û pêşveçûnên siyasî, di biryardayînê de rola civakê û gelek kirûyên civakî yên din jî dikevin nava mijarên siyasetê.

Felsefe -ya ku herkes dike an jî dixwaze bike!- gelek caran weke hunera ramanî tê binavkirin. Bi berfirehî jî xebat û lêgerînên li ser mijarên wekî dad, ciwannasî (estetîk), hebûn, berahî, ziman, mêparêzî (femînîzm), rastî, aqil, zanîn û sincê tê kirin, diyar dike. Lê li gor me li vir pênaseya ***Giles Deleûze*** ya li ser felsefeyê bêhtir derbasdar e. Felsefe rastî jî afirandin û hilberîna têgehan bi xwe ye.

Piştî ku me têgehên siyaset û felsefeyê -her çend kêm be jî- rave kir em dikarin werin li ser mijara xwe ya sereke û pênaseyekî ji bo felsefeya siyasetê jî bikin. Dema pênase were kirin, êdî em dê bikaribin li ser felsefeya siyasetê ramanên xwe jî bînin zimên.

Felsefeya siyasetê beşek ji zanînên (ji ber ku li ser zanistbûnê nîqaşên kûr û gur hene) civakî ye ku li ser mijarên dewlet, desthilat, desthilatdarî û şêweyên desthilatdariyê, rêvebirin, siyaset, azadî, hiqûq, maf, rewabûn û zagonan bi alîkariya felsefeyê lêdikole û lêgerînê dike. Li vir ya girîng ew e ku felsefeya siyasetê bingeha siyasetê li ser nêrîn û ramanên felsefî şîrove dike û dixwaze ku li gor xwe rave bike. Weke gelek beşên din ên civakî ji bo felsefeya siyasetê jî têgehên sereke hene û di herikîna felsefeya siyasetê de roleke girîng dileyzin. Ew têgeh jî -me li jor jî qala wan kiribû- desthilatdarî, rewabûn, kesayet, dewlet, maf, zagon, rêvebirin, girse, gel û hwd. in. Bi van têgehan ve girêdayî pirs û pirsgirêkên felsefeya siyasetê jî hene û di navenda felsefeya siyasete de cih digrin.

Pirsa sereke ya felsefeya siyasetê ew e ku dixwaze kifş bike ka dewlet û desthilatdarî bingeha xwe ji çi digre. Loma em dê li jêr bi felsefeya siyasete re jî girêdayî li ser dewlet û rewabûnê rawestin. Di destpêkê de ev pirs ji hêla ***Platon***, ***Arîstotales*** û ***Îbnî Haldun*** ve wekî xwestina ewlehiyê ya mirovan hatiye dîtin. Li gor van kesayetan <dewlet> ji bo pêdiviyên civakê yên bingehîn hene. Divê dewlet di serî de wan pêdiviyên civakî pêk bîne. Nerînên din ên ku bingeha desthilatdariyê digere ew in ku xwe dispêrin ‘ol’ê. Li gor wan nêrînan dewlet ‘Berhemeke Yezdanî’ ye. Di nav gelek feylesofên misliman û xwedênasên Heyama Navîn

de nêrîna sereke ew bû ku divabû dewlet li gor zagonên Yezdanî bihatina rêvebirin.

Li gor gelek feylesofên Ewropî bingeha dewletan bi ‘peymaneke civakî’ hatiye avakirin. Vîna hevpar a civakê ji rewşa xwe ya ‘xwezayî’ veguheriye rewşa ‘civakî’ û vê yekê jî rê ber bi dewletbûnê vekiriye. Mirovan bi peymaneke siyasî dewlet avakirine. Li vir teqez divê qala nêrînên ***Thomas Hobbes*** were kirin. Ji ber ku wî bi nêrînên xwe yên di derbarê dewlet û civakê de ne mora xwe (ya nepak) li siyaseta felsefeyê xistiye. ***Hobbes*** bi raman û gotinê xwe bingeha netewe-dewletanan re pêşengî jî kiriye. Li gor ***Hobbes*** firerengî/pir-î-(anî) (multitude) ji bo dewletê neyarê herî mezin e. Ji ber ku ***Hobbes*** dewletê derdixe pêş hemî rêngên civakê ji bo dewletê weke xetereyekê dibîne. Ji bilî van tiştan divê dewlet ji hêla yekî ***(monark)*** ve were birêvebirin. Bi vê yekê ***Hobbes*** bûye parêzvanê rewabûna ‘yekê.’

Piştî ***Hobbes***, ***Spînoza*** xwestiye li ser firerengiya civakê modelekê ava bike. Li gor ***Spînoza*** piranî (multitude) bingeha hemî azadiya şarwer e. Ji ber ku wisa ye jî divê ev firerengî her tim bê parastin. ***Spînoza*** ramana demokrasiyê dîsa aniye rojevê û xwestiye ku bila dewlet ne ji hêla yekî û arîstokratan ve, lê bi demokrasiyê were birêvebirin. Bi vê yekê jî xwestiye nîşan bide ku dewlet bi demokrasiyê kare ravebûna xwe saz bike.

Di destpêka sedsala 19an ve li ser dewletê nêrînên cuda jî derketine holê. Anarşîzma (ajewegerî) ku xwe li hemberî dewlet û hebûna wê sazkiriye ji aliyekê din ve pêwîstiya dewletê aniya rojevê. Li gor wan divê dewlet ji binî ve were hilweşandin, ji ber ku dewlet raste rast hebûna xwe li ser tunebûna azadiya mirovan ava dike. Ji ber ku

mirov beyî ku dewlet hebin jî dikarin xwe bi xwe birêve bibin, divê dewlet werin rûxandin. Li şûna dewletên navendî federalîzmê wekî bingeha modela rêvebirina xwe dipejirînin.

Rewabûn mijareke din a sereke ye ji bo felsefeya siyasetê. *Gelo bi çi awayî desthilatdarî û dewlet rewabûna xwe ava dike, li gor kîjan pîvanî desthilatdar û dewlet rewa ne?* Ev pirs di felsefeya siyasetê de pirsên bingehîn in ku hewceyî bersivên vekirî ne. Bi kurtî em dikarin bibêjin rewabûn ew tişt e ku kirinên desthilatdarî û dewletê di zagonan de digere. Ger kirin li gor zagonên heyî yên destnîşankirî be, ew kar rewa tê dîtin.

Felsefeya siyasetê gelek caran li gor her sê mêlên bingehîn yên ku li jor me nîşandane mijara rewabûnê dinirxîne. Li gor feylesofên Yewnana Kevnarê ger pêdiviyên civakê were dayîn, hingê em dikarin qala rewabûna dewletên bikin. Di Heyama Navîn de rewabûn bi zagonên Yezdanî ve girêdayî bû. Ger karê dihatin kirin ne dijberê olê bûna, ew kar rewa dihatin dîtin. Ev nêrîn li gor serdeman û demê têne guhertin. Li gor hin nêrînên nûjen jî ger kirin li gorî pîvana berjewendiyên civakê b,e hingê ew kirin rewa dibin. Lê di bingeha xwe de, li gor van nêrînên sereke mijar tê nirxandin.

Serdema modernîzmê bi xwe re gelek pîvanên nû jî anîn. Lê piştî modernîzmê pîvanên postmodernîzmê di derbarê rewabûnê de gelek ramanên cuda bi xwe re anî. Êdî ne tenê ***<zagon û dewlet>*** hemî tiştên heyî bûn mijara nîqaşan. Loma êdî her tişt li gor rewabûna xwe wate digre. Çi hebe bila hebe ger rewabûna wan tunebe, êdî em nikarin qala derbasbûna wan ya li ser civakê bikin. Ji bilî vê yekê mijara gerdûnîbûn û heremîbûnê, bûye pirsgirêkekê sereke ji

bo felsefe û felsefeya siyasetê. Êdî em nikarin qala zanîneke gerdûnî û zagonekî gerdûnî jî bikin.

Heya li vir me bi giştî û bi kin qala felsefeya siyasetê, mijarên wê (di serî de her du mijarên sereke, dewlet û rewabûn) kir. Niha divê em hinek qala rewşa kurdistanê û kurdan bikin û ji hêla felsefeya siyasetê ve rewşa heyî şîrove bikin. Îro têgeha dewletê û (bi têgaha dewletê ve girêdayî netewwe-dewlet) rewabûna desthilatdarên kurdistanê herî zêde dibe mijara nîqaşan. Rewşa heyî (bêdewletbûna kurdan), dewletên heyî (rewabûna wan) yên Rojhilata Navîn îro ji her demê zêdetir weke mijarên sereke tên rojevê. Em wisa difikirin ku xwestina dewleteke ji bo kurdan (ji destpêka Ehmedê Xanî vir de) mafeke xwezayî û mirovi yê. Lê rewabûna dewletê bi xwe -di serî de şêweke netew-dewletî- rastî jî mijareke din e. Em di wê nêrînê de ne, ku ji bo kurdan hiqûq û zagonên heyî yên li ser erdnîgariya Rojhilata Navîn (bilî rewşên defacto, Rojava û Başûr), ne rewa ne û divê qet neyên pejirandin. Ji ber ku ev dewletên Rojhilata Navîn raste rast heyîna xwe di tunebûna hebûna kurdan de dibînîn, divê astekî herî jor de ev rewabûn herdem di rojeve de be û nîqaş li ser werin kirin.

Ji aliyên din ve jî dewletên heyî -bi seranser ên Rojhilata Navîn- an divê pergalên xwe ji binî ve biguherînin an jî divê têkçûyîna xwe ya rêvebirînî ragihînin (divê ew wek şirketekê îflasa xwe ragihînin û desthilatdariya xwe radestî firerengiya civakê bikin!). Ji ber ku heya niha felsefeyeya siyasetê li ser duberekirinê çû û di eslê xwe de rêvebirina yekê li ser gelan ferz kir ev alozî heya serdema me hat û niha jî bi awayekî herî tund, xwe nîşanî me dide. Li vir em jî gelek caran dubarekirinê dikin, lê dubarekirina me bangekî dihewîne, bangekî nû. Belê felsefeya siyasetê îwerên

wisa di nava xwe de dihewîne, ku beyî wan jî nikare were ravekirin. Hundirê felsefeya siyasetê çi ye? Hundirê felsefeya siyasetê bersiv in. Bersivên çewa ne? Bersivên siyasî (polîtîk), hebûnî (ontolojîk), zanînnasî (epîstemolojîk), mêparêzî, sincî û hwd. in.

**Kêmzan Bêwar**
elefterya.nc@gmail.com
28.06.2015

***Çavkanî***

***1-*** *Arîstotales, Polîtîka, Weşanxaneya Remzî, Stenbol, 2000*
***2-*** *Balîbar, Êtîenne, Spînoza û Siyaset, Weşanên Otonom, Stenbol, 2004*
***3-*** *Bêwar, Kêmzan, Siyaset Çi Ye? (Destpêka Zanista (?) Siyasetê (Xebata çapnebûyî)*
***4-*** *Deleûze, Gilles, Li Ser Spînoza Yazdeh Wane, Weşanên Kabalci, Stenbol, 2008*
***5-*** *Deleûze, Gilles û Gûatarî, Felîx, Felsefe Çi Ye?, Weşanên YKY, Stenbol, 2009*
***6-*** *Hobbes, Thomas, Bingeha Felsefeya Hemwelatîbûnê (De Cîve), Weş. Belge, Stenbol, 2007*
***7-*** *Negrî, Antonîo û Hardt, Micheal, Piranî (Di Heyama Şahînşahîyê de Şer û Demokrasî), Weşanên Ayrinti, Stenbol, 2011*
***8-*** *Platon. Dewlet, Weşanên Kaynak, Stenbol, 2006*

# Ziman û Hizir: Du Regezên Pêkve Girêdayî

Ziman û hizir, çawa ev herdû têgeh bi hev re? Bersiva wê Eflaton bi hêsanî daye: {'Hizir axaftin e, axaftina giyan bi xwe re ye.' (Sophistes 263e) Di cihekî din de jî dibêje: 'Ji min re weha diyar dibe, dema ko giyan hizir dike, mina ko diaxive, ew pirsan ji xwe dike û bi xwe bersivê dide, erê an na jî dike.' (Platon: Theaiteth 190a)}

*{Hizir, axaftineke di bêdengiyê bi xwe re ye, bi wî zimanê ko her yek dişê çavdêr be. Mînak li ser vê jî, dema mirov nameyekê dinivîse, bê ko nivîser bi xwe jî peyvekê bîne ser lêvên xwe, bi tinê dest û pênivîsa wî karê xwe li ser kaxezê dikin. Em dikarin- eger em bixwazin- ya peyva nivîsandî ji ya hatî bilêvkirin û ya hatî bilêvkirin ji ya tête hizirkirin cuda bikin, lê ne peyva nivîskî, ya bilêvkirî û ne jî ya hizirkirî dikare bi tena serê xwe bijî.}*

Babetek û mijareke wiha, me ber bi pirsekê ve dibe, ew jî ev e: ***Çima em pirsan dikin? Pirs ji bo çi ye? Çi guman li dûv pirsê heye? Gumana me ji çi heye? Ev ne şêweyekî rexnelêgirtinê li hizir û bîrên me, li zimanê me ye?***

Ev gumanek bingehîn e, ko rêka serbestbûna me ji xeleka desthilatdariya zimanê me yê perwerdehiyê, toreyê, ragihandinê derdixe û nîşanî me dike, me ber bi pêrgîbûnekê ve dibe, da ko em rastiyê bizanbin û pêk bînin, ew rastiya ko pêşbahwerî, pêşduruvkirin, pêşhevînasînên me nayête diyarkirin.

Guman, rêya xebatê ye berbi nasîna rastiyê ve û di mercên îroyîn de jî, guman hene, berferehbûna vehesîna hebûna hişmendiya me, berbi paşeroja mirovahiyê ve, ya di tevaya hizira me de, dibin û eger ev guman berdewam bibe, dê pîşesazîkirin û zîrekiya hişmendiya me bi paşerojê ve girê bide û xwe wek guman di hiş, bîr û hizira me de rû bide.
Li vir ev berdewamî û pîşkirina hişmendiya me ya mirovane, cîhan û gerdûna me dike karxaneyek û bi rê ve dibe. Ev têkiliyên di nav sedema rûdana gumanê û gumanê bi xwe de, di hundurê hizirê de wateyê dide mirovahiya me ya rasteqînî, ta bigihê sinorê metirsiyana lixweziyankirinê ko êdî dibe taluke.

*Ne bi me ye, ko êdî pirs xwe li hev rêz dikin û zeviyê jiyanê mişt dikin wek: Erê boçûna me, li hember cîhana me di cihê xwe de ye?! Me çend hukmên nerast, ji dema ziman û serpêhatiyên di gel zimên, wergirtine? Em çendî bi zordarî nêzîkî hev bûne?*

*Çi bi darê zorê li ser me ferz bûye û me çend tişt li ser hinên din ferz kirine, ta ko zimanê me ta roja îro di serpêhatiyên xwe yê dema pêşîn de dijîn?! Em bi xwe ne aloziyek in, di hişmendiyê de, bêy ko em pê bizanin? Li berahîkê û li dawiyê; pirs, bi xwe ne teqezkirineke, ji kêmsûdwergirtinê , an jî, rexnelêgirtine li hişê me? Ne diyalogeke giyanî ye, di gel xwe li ser wan kêmasiyên li def me?*

Pirs û pirs...

Eger weha em berdewam bikin, dê bi xwe bînin der, ko em serpêhatî û qonaxên xwe dubare dikin û dawiyê li jiyana xwe tînin. Dema Kevin û nû dê têkel bibin, dê bibin mîna ko stêrkên komika sêwiyan li hev bikevin û birijin.

Ji van pirsan hemiyan diyar dibe, ka çendî ziman giring e û çend pêdivî ye têkeve nav dan û stendinê, têkeve nav bizavê, bo xwe li derveyî qewar û çarçova xwe bibîne. Ziman weha giring e, ko bûye regezekî sereke ji regezên pêkahtên neteweyekî, weha giring e û kartêkirina zimên li hizir û bîra mirovî heye.

***'Em bi peyvan, hizir dikin.'***
Eflaton di pênasîna bîr û hizrê de weha dibêje: 'Wateya hizrê, hizra tiştekî bikin, wate tiştekî ji xwe re bibêje. Pênasîna Eflaton, dide xuyakirin, ko diyalogeke hundurîn ya giyan (ruh) 'bi xwe re ye.' Hizir xwederbaskirin e, li xwe û bahwerî û zaniyariyên xwe bi guman e. Serederiya di gel hizran, dergehê diyalogeke bêdawî vedike û bi xweşî guhertinên nû dipejirîne û serwext dike.

Tişta mirovê normal ji yê xeyalî cuda dike, ew xeyala wî ya bêdawî ye, ji bo vê yekê, tişta heyî, ew ya rast e û bi çavmiç-belkirinekê, peyda bûye. Jiyan serpêhatiyeke zimanî ye, mezinbûn û perwerdebûna mirovî, di hundurê axaftinê de ye, di hundurê ziman bi xwe de ye. Ev diyalog di demên bi xwe de û beriya niha jî ji hêla hin din, dikete nav guftûgoya hundurîn. Wate em bi xwe re guftûgoyên din, serpêhatiyên mirovên din dikin û parve dikin û di pey re wan rêk dixin.

Aristotalis bi ciwanî diyar dike, 'ku wêneyekî geşdar ji diyalog û serboriyan ber bi têgeh û gelemperiyê ve diçin.'
Di her pesindanê de, Aristotalis derbiriye ko ji gelek liberçavdanîn û jidilhesibandinan serboriyek peyda dibe, serpêhatî gencînekê ji zanînê re peyda dike, xwebahweriyê

peyda dike û berdewamiyê dide jiyanê. Lewra jî Aristotalis pirsê dike: *Em çawa van zaniyariyan bi dest xwe ve tînin?!*
Serpêhatî û tecrubeyên mirovan, roj bi roj pir dibin, pir ji wan diyarokan dubare ne, encama wan wek hev e û wek hev dimînin, ji ber wilo jî pirsek xwe di serê me de dibe û tîne: *Ev çi rewş e? Pêdivî ye bi nav bibe? Kengî kesayetiya pirralî rola xwe dilîze? Kengî ziman û heyanî çi wateyê dikare hizir binivîse?*

Çendî ziman û hizir ji êk birevin, nêzîkî êk dibin. Mînakek ko em bikaribin nêzîkî wê bikin ev e: -Dema desthilatdarek bireve, li şûn xwe temaşe bike, hew dibîne ku nêzîkî dijminê xwe dibe. Weha jî mirov fêrî axaftinê dibe.
Di felsefeya ***Aristotalis*** de, peyva yekem nîne. Mirov bi ziman û di gel ziman mezin dibe.

*Erê eger em werin û pisyarekê ji xwe bikin, em paşeroja xwe parçeparçe nakin?! Di fêrbûna axaftinê de û guft û goyê de, em mezin û perwerde nabin?*

Prosesa ziman û hizirê, di hundurê civakê de, di gel civakê dijî û di gel civakê peyda dibe. Serpêhatî, eger bi peymaneke nepenî di hundurê civakê de peyda bibe û bi rêk û pêk bibe dê baş be? Prosesa hizir û ziman, dibe <îdolojî> weha jî fêrbûna axaftinê di berdewamiya hînbûnê de ye. Guherîna têgeh, hînbûna argumentan, afirandina behweriyan û teqezkirinên me jî di prosesa ziman û hizir de dilivin, buyer û serpêhatiyên berê jî di van prosesan de diçin û tên.

Pirs jî ev e: Çi rastiya wê yekê heye, ko jiyana bi serboriyên çûyî qewarekirî û bi cehkirî bin?

Pirsa li ser reh û makderên têgehan an jî têkiliyên rasteqîne di navbera taybetî û giştî de yên têgehan, pirseke kevnar e.

*Çawa mirov dişe axaftina xwe têxe çarçoveyekê, ko axaftin û mebest hev bigirin?*Ev pirs hemî derdikevin, lê bersiv tim nisbî, rêlatîv in. Jiyan bi xwe jî mîna zimên e.

*Li vir jî pêdivî ye mirov pirsyarê ji xwe bike, erê jiyan jî hizir e? Jiyan hizir e, ziman wî dinivîsê, lewra jî pêdivî ye, her carekê em derbirînê ji hizrên xwe bikin, ji xwe pisyar bikin, tişta me derbirî, mebesta me bû? Mebesta me di rêka axaftinê re gehîşt?Ta çi pêpelûkê encama têgehiştin û prosesa derbirînê êk girt? Derbirîn û têgehiştin di gel êk digunce?*

Ev diyalog ya di navbera têgehîştin *(hizir)* û axaftin 'derbirîn' *(ziman)*, bêdawî ye û dibe sedema pêşdeçûna me.
Di vir de, mebest ne ew e, ko nivîsîn, axaftin û têgehîştin 100 % mîna hev bin. Bi taybetî têgehîştin bi yê din *(peyamwergir)* ve û pileya wî ya zaniyarî û zanînê ve pabend e. Hizir û ziman duayeke berdewam û bêdawî ye, bi xwe re û li ser asteya yê din, vê civakê û civaka din. Ev xal bi xwe taybetmendiya herî giring e, ko mirovayetiyê mecbûrî guft û goyê, dan û stendin, hevpejirandinê û rêzlihehevgirtinê dike. Hizir û ziman hilgirê kultûra mirovayetiyê ne.

***Nivîskarê Elman Gunter Grass*** di hevpeyvîneke xwe de gotiye: *<pêdivî ye kultûr bibe cenga li dijî, hevnepejirandinê. Kultûr dawiyê hev naînin, hev temam û dewlemend dikin.>*
*{Ziman destpê dike û dan û stendina hundurîn ya ruhî -bê ko çu sinoran li pêş xwe deyne- berdewam dike. Hêza ko li dijî ziman*

*radiweste û gumanan ji hêza wî dike, îdolojîkirina ziman bi xwe yeç.}*

Em dikarin her tiştî derbasî zimên bikin, lê em neşên, di her tiştî de wekû êk têbigihin, çimkî şiyan û heyîna me bi dawî dibe, lê axaftin li ser jiyan û şiyanê ezelî ye.

***H.G.Gadamar***, berhingariyê di ber xwesteka universaliuma axaftinê û têgehîştinê dike.
Li vir em dişên pirseke beramber bikin: *Gelo tiştekî li dijî universaliyoma serpêhatiyên zimên heye?!* Ev mijar relatîv <nisbî> ye, ji ber wêneyên zimanî wêneyên cîhanî ne.
*{Em bên li vê teza giring temaşe bikin, dê bibînin ko zaniyarê Amerîkî **Naom Comesky**, wêne û tezên xwe yên li ser zimên ji **Humbold** yê Elmanî wergirtine, li ser kar kiriye û aktîv kirine.}*

Strukturalîstên emerikî û bi taybetî ***Naom Chomesky***, ezmûneyên li ser zimanî, ji wêne, nerîn û dîtinên cîhanî, wek babeteke sereke û giring dibînin.

***Nietzsche***, di aforîzmên ***(pend)*** xwe de, li ser daxwaz û desthilatê çend têbînî li ber destên feylesofan danîne:
*'Faktor û kirdeyên afirandinê ji hêla xwedê ve hatine danî. Xwedê rêziman çêkiriye. Wate, wî berê me da ye şêweyê zorbirin. Serketina li dijî kêşeyan, nîşanî me dide, dako em ji karwanê pêşveçûnê gîro nemînin.'*

Weha dîsan bi pirsekê berdewam dike: *'Ev girêdana me ya bi hizirê ve, ji şiyana zimên e, an jî mercek e, bi zordarî xwe li ser zimanî ferz dike?'*

***Nietzsche*** li wê pirsa xwe ya dirêj û pirralî, bi tundî rexne li hişmendiya rojava digire, ji bilî wî jî, ***Nietzsche*** dixwaze ko bizane: *'Erê çi wateya wê heye, gava em li dora xwe û li cîhanê temaşe dikin?'* 10

*Şiyana me di guherînê de çend e, çaxê nirxên rojavayî yê global û ne mîna yên dema buhurî bin, wekheviya kultûran bête forimkirin, an jî dest bi formekirina çandeyan bibe?!*

Li gor ***Nietzsche***, zimanê felsefeya rojavayî, dubarekirina zimanê felsefa girîkî ye. *'Ev zimanê mêtafîzîk û beşên wê (kategorî), ew in yên em ji rêzimanî dizanin, mîna pirêdikatan <xeber> kirde, nav, lêker, lêkerê bigehîn û lêkerê bi bizav.>*

Di jiyana rojavayî de, ziman kartêkirineke mezin û diyar li hizira mirovî dike, giha ye wê astê ko dema peyvek tête bilêvkirin, di ceh de, mirov *(peyamwergir)* dikare wê peyvê têxe qewareyê taybet bi wê peyvê, li gor hizir û mijarê 'sêmantîk', ya ko di felsefeyeke nepenî de, an jî peymaneke nepenî de, di navbera ziman û hizirê de, cihekî taybet daye wê peyvê.

Lewra dema pisyarek dibe, automatîk derbasî kategoriya di hişê mirovî de dibe, û dûv re bizavê dike, ko di gel wê peyvê di wê kategoriyê de têkeve gengaşiyek e taybet û rûhî de. Bîr û mentiq, li gor wê fenomênê, dikevin nava diyalogeke berdewam û hemdemî.

*Em rûbirû pirsekê dibin: 'Ev tore û kultûra bi hezarên salan, ko ji nifşekî bo yê din hatiye veguhestin û gehîştiye me, -di rêya zimên û avahiya wî de, kartêkirinek, an jî guhertinek di hiş, bîr, mentiqê me de nekiriye?Gelo karekî durust e, ko em bên, van hizir û bîr û mentiqan, yên di rêka ziman, zarave û devokan ve, ji hezarên salan*

*gehîştiye vê qûnaxê, têkbibin û derbasî şêweyekî din ji hizir û bîran bikin, dibe ko di cihê nehişmendiya me de jî cihê wî şêweyê hizirê nebe?*

Di sîstema felesefî ya ***Hume*** û ***Kant***, (diyalekt, absolut nasname ye, ji ziman û hizirê tête afirandin, çendî mirov pêkolê bike, ko xwe jê pak bike nikare, ji ber nasname derveyî sîstemê peyda nabe) pirseke giring li hêrê tête arayê, erê qedexekirin û nebikaranîna, zimanekî, zaraveyekî, devokekê, ne kuştin an jî jinavbirina nasnameya xelkên bi wan ziman, zarave an jî devokan dipeyivin?

Dîsa em dê vegerin xêzên xwe yê destpêkê û pirsa xwe careke din dubare bikin: ***Bo çi em pirsan dikin? Çi ye, ya xwe li pişt pirsan vedişêre?, Çima pirs li def me peyda dibin? Hebûn an jî çêbûna pirsekê, guman e ji hêza hizirê me? Rengek ji rengê jixwenebehweriyê ye, an jî lêpirsîna li 'kirîşna' rastiyê ye?*** *Di qûnaxa teknolojiyayê de, kultûra me ya zimanî di çi radeyê de ye? Zimanê me dikarê li gel vê şaristaniya teknolojî û nîşanên wê, xwe ragire? Hemî diyarok, li dijî ziman in û guman jî ji zimên bi xwe hene, lewra pêdiviye mirov herdem pirsan ji xwe bike, çendî şiyana me heye, ko em jiyana xwe bi rê ve bibin, an jî planan jêre deynin?*

Dîrok kartêkirinê li zimanê me dike û di rêka zimên re jî li hizira me dike û bi kar tîne. *Erê eger em li ber dîrokê ji desthilanînê bikevin, dê jiyan û cîhana me bi destên me neyê roxandin? Pirrbûna gumanan, dergeh li hişmendiya me nagire?*

Giring e, çu sinor li ber axaftina li ser babetan nebe, her weha pêdiviye, ko peyv û axaftin û zelal be, ne di tem û mijê de be.

Pêdiviye, ziman û hizir nêzîkî hev bibin û axaftin di çarçeveya hevgihandinê de bimîne û eger ne weha be dê bibe diyaloga feylesofan, *'hêk ji mirîşkê ye, an jî mirîşk ji hêkê ye?'*

***Martîn Heidiger***, wê behweriya ko dibêje: -*Zanebûn bermayê mirovayetiyê ye*, parve dikir. Herweha 'destpêka teknolojiyê ji felsefeya yewnanî têt, dema diyalektîk di gel hermenuetîkê de. *(= diyalog û têgehîştin û şirovekirin li ser asta zanîna her beşdarekî peyda bû.)*

***Jurgen Habermas***, li dijî bîrdozî û boçûnên ***Hans georg Gadamer***, yê di hêlên ziman, hizir û hişmendiyê de rawestiya û weha di pirtûkeke xwe de nivîsiye: *'tiştek li derveyî şêweyên serboriyên zimên, ko hatibe texmînkirin, nîne! Ziman xwe bi rêka serpêhatiyên cîhanî bi gelemperî li dar dixe!? Wate, pirraliya xwe di zimên de bi cih dike, ne dijberiyek û berovajiyek e.'*

**Habermas** li dijî şêweya relatîv a ***Gadamer*** diparast, derdikeve û dibîne, ko ew şêwe me ber bi xelekeke girtî ve dibe, ko nema dikarin jê derkevin. Mirov in hene, netenê bi zimanê xwe hizir dikin, belê bi zimanekî din, ji ber bîr encamê serpêhatiyên zimên e.

Li vir em dikarin wek nimûne, nivîskarên kurd yên ku bi awayekî sistematîk bi zimanekî din perwerde bûne û bi zimanekî din dinivîsin, bidin. ***Em dikarin pirseke din bikin:*** *Erê, ezmûneyên din, yên rasteqîne, ji bilî şêweyê ziman î nînin? Ev serpêhatiyên desthilatdarî û serboriyên kar bi giştî, ne bersiva pirsa me ye?*

***J. Hebermas*** bi xwe jî şirovekirin û têgehîştina gelemper û hermeneutikî yên kar û desthilatê, mîna dîmenên nû ji serpêhatiyan li qelem dide, ko dişên derveyî zimên kartêkirinê li hizir û bîrê bikin. Ev kultûra ko ji nifşekî bo yê din, di qûnaxên dirêj de, tête veguhestin, ne pitir ji formên desthilatê û hunera wê ne, sercoya wê jî azadiya rastî, armanc û rêbazên bi sîstem û pilan in. Rûbirûbûna me bi desthilatê û neazadiyê re, serpêhatî û hizirê me yê siyasî pirrtir û bi hêztir dike, diyar jî dike, ko kar şiyanê pirrtir dike, êdî em mirovahiya xwe û nasnameya xwe di wê rêkê de dibînin.

Hebûna me wek mirov, di hundurê desthilat û kar de, serboriyên me, yên konkirêt in, em xwe têde dibînin, xwe dinerixînin û dipîvin. Em bi rêka desthilat û kar, diyaloga ruh ya hundurîn, bi xwe re dikin û mirovahiya xwe pêktînin. Rastiyek heye divê em bibêjin, ko em di cîhaneke zimanî de dilivin, ezmûneyên xwe bi form dikin û digel zimên mezin dibin. Şêweyê perwerdehiya bi zimên, dergehê rexneyan vedike, imkanên nû vedike, zaniyariyên me pirrtir dike, jiyana me bi serpêhatiyan dewlemendtir dike.

Di diyaloga ko peyda dibe di navbera ‘EZ, TU, EW, EM, HUN’ de, merc û sinorên avahiyên civakê li dar dikevin, bê ko di bin perdan de, berjewendiyên aborî yên desthilatê bêne jibîrkirin. Ev gengaşiya ku dibe, diyalogeke zimanî ye, funksiyona mirovî bi hêz dike, hêza daddanê û nirxandinê zêdetir dike û ziman, hizir berbi xwe ve tîne, pêkve dikevin nav liv û tevgerê. Ev hostetiya siruştî, ya di nav zimanî de heye, hişmendî û hizir daniye ser rêka bizavê û herdû pêkve bi hêz dibin.

***Piaget*** dibêje: *'şêweyên din ji zimên, mîna îmajê, liv û nîşanên, ko me berbi xwe ve dikêşin û kartêkirinê di hizira peyamwergir û beramber de diket.'* ***H. Plessner*** dibêje: *'girî û ken jî, ziman in.'*

***Plessner***, balê dikişîne, li ser herdû şêwezimanan û bahwer dike ko ev di rêkeke zanistî de hatine avakirin, ji ber ken û girî pêdivî bi atmosifêreke taybet in û pêdivî li hizirpêkirinê ne. Gengeşiya li ser van babetan tiyoriyan diafirîne, şiyanê û asoyên din dide wan simbol û nîşanên zimanî, yên ko êdî dibin barê xwêner bo şirovekirinê. Dan û stendina wan têgehîştin û şirovekirinên cuda, diyaloga giyanî bi xwe re bi hêz dike.

Ziman bi xwe bi civakê re, di peymaneke nepenî de ye, wate di hundurê civakê de mezin dibe. Ziman bi peyvan ve girêdayî ye (bîr), lê di eynî çaxî de jî, ziman wek ziman li qelem dikeve, ji ber ko regezekî çalak û serbixwe ye, ji hemî buyer û diyarokên ragehandinê cuda ye.

***H.G.Gadamar*** nav li vê xwecudabûnê dike: *'nivîsîn û nivîsandin.'* ***Gadamar*** ji şagirtên xwe re digot, *dema hun peyvekê bibînin ser zarê xwe, guhê xwe tûj bikin, ne tenê peyva li guhê we xweş be, ko hun wan bavêjin koşeyekê, ya baş bi rastiyê bigirin, ko berê we bide hizirê.*

***Gadamar*** şirovekirina peyvekê *(hizir)* , wek wergerandinê bi nav dike û dibêje: 'xwendin wergerandin e, wergerandin jî wergerandin e, … erê eger em bi rastî bipirsin: çi wateya wê ye, ko em werdigerênin?.. wate em tiştekî mirî werdigerênin, bo bête xwendin û têgehîştin, an jî têgehîştineke nû ye di zimanî de.'

Di axaftinê de, peyvek ya din dikişîne, û di rêya wê de, hizir mezin û fereh dibe. Gelek caran tête famkirin, ko ziman parçeyek ji peyvan û hevokan e, ji têgeh, nêrîn û dîtina ye.
Ya rast ziman peyveke, şiyanên me berbi bidawînehatina berdewamiya axaftinê û bihevreaxaftinê û azadiya xwegotinê û yêdingotinê vedike. Ziman, organê sereke yê canê ***Evra*** *'Heqîqetê'* hişê me ye.

***Encam:***
***Ziman:*** şêweyekî ragehandinê ye, ko mirov bikaribin dan û stendinê di gel hev bikin û di êkûdu têbigehin. Her zimanek dengên taybet bi xwe hene, ew deng peyvên guncayî diafirînin û xeleka ferquenza her devokekê, ji devoka din di hundurê zimanekî de jî cuda ye.

Li gor lêkolînên li ser deng û lerza wan hatiye kirin, ferquenzên zimên di navbera 300 Hz- 4 kHz de ye. Dirêjahiya phonên zimên bi giştî di navber 10 ms û 50 ms de ne. Karekterê her zimanekî di dirêjiya phonan û sivikahiya lerzê de ye û ev in yên zimanekî ji yê din cuda dike.

Ragehandin erkek ji erkên zimên e, di rêka nivîsîna simbolan û bikaranîna dengan de, wateyên xwe diafirîne, herweha di rêka simbol û dengan de watedar dibe. Ziman, bi armanca ragehandinê sîstema nîşanan e. Ji bilî ko zimanên siruştî hene, niha zimanên hunerî jî mîna, programê zimanan di ***EDV*** û alîkariya zimanan ya cîhanî, herweha zimanê teba û cinaweran jî wek ziman têne hesibandin.

***Hizir, zimanê hişweriyê ye.***

*Em bi peyvên xwe hizir dikin, wek em bi çavên xwe dibînin. Ne niha û ne jî di paşerojê de, ev rastî nayête windakirinin, ko hizir û ziman ji hev cuda nabin û yek di hundurê yê din de xwe bi gewde dike.*

***Hizir prosesekî berhemdar e.***

*Hizir ne axaftin e û axaftin jî ne hizir e. Hizir modeleke hişweriyê ye, wêneyan diafirîne an jî wan di gel hev pêwendidar dike.*

*'Hizir ramana zimanekî cindîtiyane ye, axaftina bêdeng û lal e, axaftina hundurîn ya her mirovekê ye.'*

*Di felsefeya Girekan û ya dema navîn de, hizir zimanê axaftina siruştiya bêdeng a zimanê pîtan bû.*

***Di dawiyê de dibêjim:*** *ziman û hizir peyv e, lewra jî ziman hizirê dinivîse. Ziman regezê wêneya ne, yê Hizran e, neynika rastiya civakê ye.*

**Tengezar Marinî**
tengezarmarini_41@hotmail.com
27.06.2015

***Jêder***

***1.*** *Dörner, D. (im Druck). Sprache und Denken. In J. Funke (Ed.), Denken und Problemlösen (Enzyklopädie der Psychologie, Themenbereich C: Theorie und Forschung, Serie II: Kognition, Band 8). Göttingen: Hogrefe*

***2.*** *Friedrich Max Müller (1823-1900), Philosophie als Sprachkritik im 19. J.hundert. Hrsg. Sigfried J. Schmidt, Stuttgart-Bad Cannstatt 1971*

***3.*** *An Post. B 19 100 a 3ff.*

***4.*** *Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970*

***5.*** *Nietzsche, Willen und Macht*

***6.*** *H.G.Gadamar, Dialektik und Hermenuetik. s. 203*
***7.*** *J. Habermas. Der Universalitätsanspruch der Hermeneutik, 2 Band Tubingen. 1970*
***8.*** *J. Habermas, Die Universalität des hermeneutischen Problêms,*
***9.*** *Jerry Fodor. language of thought*
***10.*** *Giani Vattino, ji H.G.Gadamer, <Wahrheit und Methode> di gotara G. V, bo bîranîna derbasbûna sedsal li ser zêbûna Gadamer <Di cîhanê bigihin> ji <Sein, das verstanden werden kann, ist Sprache> Homage an Hans-Georg Gadamer, edition suhrkamp 2183, erste Auflage 2001.*

# Hevpeyvîn bi Zeynelabidin Zinar re

*'Dibe ku ez, tu, ew û evê hanê ji aliyê biyolojî ve ji dê û bavekî Kurd çêbûbin, lê belê tenê ev ne bes e; ji Kurdan re divê biratî, hevkarî, yarmetî, oldartî, wijdantî û hevgirtina wan çêbibe.'*

***Zeynelabidin Zinar***

Ji pazdeh salan zêdetir e ku ez wekî nivîskar û rewşenbîrekî kurd, kekê Zeynelabidin Zinar ji nêz ve dişopînim û dixwînim. Çi dema ku ez di kovar yan di medyaya sosyal de, li nivîseke mamoste rast têm, yekcar berê xwe didim nivîsê û beyî ku navbereke bidim nivîsa wî dixwînim. Di nav gotarên ***Kovara Nûdemê*** de jî, yek ji wan nivîskarên ku yekser bala min diçû ser gotarên wî, yek jî kekê Zeynelabidin bû. Rastî, her dem bi zimanekî herikbar, zelal û sade dinivîsîne û bi xwendina nivîsên wî meriv qet aciz jî nabe.

Ez bi serbilindî karim bibêjim ku di xebatên xwe de, min ji lêkolînên wî gelek sûd jî wergirtiye, wekî çavkanî min wan bikar aniye û bikar tînim jî. Herweha di hezkirina min ya zimanê kurdî de jî, para xebatên wî gelek mezin e. Lewma jî, hem li ser navê xwe û hem jî li ser navê şopîner (xwendevanên) malpera www.felsefevan.org ê, hem ji bo derfeta vê hevpeyvînê û hem jî ji bo keda wî ya li ser çand, huner û edebiyata kurdî, ez gelekî spasiya cenabê mamoste Zeynelabidin Zinar dikim.

***Ali Gurdilî:*** *Di desta yekem de ez spasiya cenabê te dikim, ku te fersenda vê hevpeyvînê da me, malî ava. Bi destûra te, dixwazim bi pirseke klasîk em dest bi hevpeyvîna xwe bikin. Ji kerema xwe re, bi hevokên xwe tu dikarî hebekî behsa zarokatiya xwe bikî? Yanî heta*

*çend salan tu li gund mayî, jiyana te bajarê Batmanê kengî dest pê kir û çûna te Swêd?*

**Zeynelabidin Zinar:** Ez di 1953an de li gunekî ***Reşkotan*** ê bi navê ***Hedhedkê*** hatime dinyayê, hingê bavê min li wirê meletî dikir. Lê min zarûktiya xwe li ***Gundikê Qêre*** domandiye. Piştre bavê min ji bo meletiyê li gelek herêman geriyaye, weke gundên parêzgeha Mûş, Bedlîs, Erzerom, Sêr û Amedê. Min yazdeh sal Medreseya Kurdî xwendiye.

Di 1968an de li Amedê min dev bi xwendina Îmam-Xetîba tirkî kiriye. Lê piştî Cuntaya Yazdehê Adara 1971ê, bi tawanbariya <Komunîstê Kesk> jê hatime avêtin. Li Batmanê min çend meh li Mekteba Navendî ya Petrolê xwendiye. Piştre min lîseya Şevê li Batmanê beşa edebî domandiye. Ez ketime azmûna zanîngehê jî, lê Cuntaya 1980yî derftet bo min nehêlaye ku berdewam bibim.

Ez bi malîtî 1971ê li Batmanê ci cih bûme. Di 1975 meha heftan de li belediya Batmanê weke karmend (657 sayili) şixulîme. 1981, rojekê Qeymeqamê Batmanê (Hayrulah Yildiz) dema hat daireya ku ez lê dişixulîm û dît ku ez bi yekî re bi kurdî dipeyivim, gote min 'Eşşekçe Konuşma' û piştre hetanî Sibata 1984an, heşt car ji aliyê Cuntayê ve hatime girtin, tevek 178 roj îşkance li min kirine. Yekê Adara 1984an, Dadgeha Leşkerî Nimre 1, pênc sal girtîgeh û 20 meh jî sirgûn seza daye min. Piştre ez reviyam û çûm Swêdê.

Ji sibata 1985an hetanî 1994an li Nexweşxaneya Xaça Sor a li Stockholmê tedawî bûme.

Lê Dadgeha Bala ya Leşkerî li Enqerê, di 1988an de bêrîbûna min ji kiryarên ku Cuntayê dixistin stuyê min daye. Lê ez sala 2001ê pê hisiyame.

Min sala 1985an weşanxaneyek bi navê ‘PENCÎNAR Weşanxaneya Çanda Kurdî’ li Stockholmê ava kiriye û du-sê sal şûnde min çapxaneyek jî ava kiriye. Li dora 35 nivîskar û hunermendên Kurd li ba min ‘kar’ kirine û mûçeya wan dewletê daye.

Min di 1984an de sê proje nivîsîne û danîne pêşiya xwe:

***1)*** *Veguhaztina klasîkên Kurdî bo alfabeya Latênî.*

***2)*** *Berhevkirina berhemên Folklora Kurdî.*

***3)*** *Amadekirina çîrokên zarûkan ji yên rawilan ên Folklora Kurdî.*

Ji 1985 hetanî 12/2014an, 121 pirtûk bi imzeya min hatine weşandin *(www.pencinar.se)*. Ji wan tenê serpêhatiya îşkencê bi tirkî ye. Eger derfet û temen dest bidin, ez ê jimara pirtûkên kurdî bigehînim 178an û hêj rawestim.

***Ali Gurdilî:*** *Dema ku ez kurtegotarên te yên li ser medyaya sosyal dixwînim, ez dibînin ku her dem tu dixwazî berê ciwanên me bidî axaftin û nivîsîna kurdî. Ji xwe pirê caran jî, tu wekî “Ciwanên Hêja!” deng li wan dikî. Gelo beriya 15- 20 salan rewşa ciwanên me çawabû di mijarên xwendin û nivîsînê de? Yanî heke meriv rewşa niha û ya beriya 15-20 salan rûbirû bike çi guhertin pêk hatine?*

**Zeynelabidin Zinar:** Rast e, ez hertim gaziya xwe digehînim Ciwanên Kurd. Ji ber ku tenê serweteke Neteweyê Kurd heye, ew jî Ciwanên Kurd in. Di qetlîama Heleçeyê de min dît, ew kesên ku ji ber jehriya Sedamî difilitîn, tenê zarûkên xwe dibirin. Min zilamekî dît, zarûkek li ser qoqlîka wî bû, du zarûk jî bi du destên wî û bi çiyê ve dibeziya.

Ez cara pêşî 17/05/ 2002 dema hatim welêt, min dît ku zarûk, ciwan hema bêje her kes bi Zimanê Tirkî dipeyive. Ez çûm

serdana gelek dostên xwe jî, min dît ku ew jî bi tirkî dipeyivin. Ez pêrgê çend siyasetmedarên kevn jî bûn, bi tirkî dipeyivîn. Min pirs ji çend dayikan kir ku çima zarûkên wan bi kurdî napeyivin, digotin <bi kurmancî qonişmîş nake.> Ew mesela ku serê mirî li tehtê dikeve hêj bi xwe dihise ku mirî ew e, hat bîra min. Min xatir bi kel û girî ji bajarê xwe xwest û vegeriyam. Ji wê demê ve min zêdetir xaza xwe xurt kir û li ser Çanda Kurdî domand.

Nivşên Kurd ên salên 1960, 70 û 80 berhemên heşifandina Kemalîzmê ne û piraniya wan jî tirsiyane. Pir hindik ji wan çendî ku îro weke Rewşenbîrên Kurd têne binavkirin jî, lê belê çewa ku dostekî min bi telefonê got: <*Me teyarê revand*> û têgeha tirkî bi peyvên kurdî dibêjin. Min jî gotê: <*We balafir revand, bir kurê?*> hêj nû wî fêm kir ku çi gotiye.

Ji ber ku Ciwanên Kurd sermaye û pêşeroja me ne, eger em xwedîtî li wan nekin, ew li maka xwe nabanin. Ji ber hindê, ez jî wek şagirdekî dibistana Ehmedê Xanî hertim umîda xwe didim ser ciwanan, hewara xwe digehînim wan û eger çengek zanîn li ba min hebe, dixwazim ewil pêşkêşê wan bikim.

Nemir Ehmedê Xanî jî gotiye: 'Umîda me ji tifalan…'

***Ali Gurdilî:*** *Beriya çend rojan cenabê te bi sernavê* ***'Kenê Xwe Bi Zimanê Kurdî Nekin!'*** *kurtenivîsek weşand û te bala xwînerên kurd da ser rewşa aloz ya sazî û dezgeyên kurdî, ku bi zimanekî eletewş î nenas weşanê dikin. Bi rastî jî, dema meriv bala xwe dide hinek weşanan, meriv têdigihêjê ku bi mentiqa zimanê tirkî weşana xwe dikin û derdekî wan ê rêzimanî jî qet nîne. Gelo rewşa wan sazî û dezgeyên navborî dikare ber bi başiyê ve biguhere, yan çawa dikare baştir bibe? Pêşniyazên cenabê te çi ne li ser vê meseleyê?*

**Zeynelabidin Zinar:** Ev pirseke têr di cih de ye. Lewra sazî û dezgehên kurdî, hêjî wek têgeha siyasî disêwirin ku ew di hemû karên xwe de li ser rastiyê ne; li xwe danaynin ku pirs ji hin kesên zana jî bikin an alîkarî ji wan bixwazin.

Niha gelek ciwanên me hene ku ew gelek rind bi kurdî dinivîsin, lê yên wisa bêderfet û bê alîkarî ne.

Meriv <nezan> e heta ku meriv xwe <zana> dibîne, lê dema ku meriv nezaniya xwe peyitand, hingê meriv piçekî zana dibe. Di rastiyê de têrbûna ji zanînê tune û meriv herdem birçiyê wê ye. Serpêhatiya wan sazî û dezgehan, wê heta 4-5 salên din jî wisan bidome. Lê belê baweriyeke min a xurt heye ku di demeke nêz de wê Zimanê Kurdî li Bakûrê Kurdistanê bigîje asta xwe ya herî bala.

***Ali Gurdilî:*** *Di gotareka xwe ya bi navê 'Ji 60 Milyonî Çend Kurdên Rasteqîne Hene?' de te bîrîneka me ya xedar destnîşan kiriye û cenabê te wuha gotiye: 'Dema Kurdê jar bête kuştin, piştre dor tê ser Kurdê dewlemend. Gava Kurdê bêol bête şewitandin, piştre dor tê ser Kurdê oldar. Eger Kurdê nezan têxin gêdûkan, piştre dor tê ser yê zana. Eger keça Kurdê Ezdayî wek 'cariye' ji xwe re bibin, sibehê dor tê ser keça min û te.'*

*Dema min vê gotara te xwend, ez wiha fikirim ku ya herî girîng ji bo me 'hevgirtin û xwedîlêderketina naxweyî' ye. Li gor bîr û baweriya cenabê te, gelo hestên milî/netewî li cem me kurdan çima zêde ne xurt in? Yan ez çewt difikirim?*

**Zeynelabidin Zinar:** Rast e, naveroka wê gotarê rind tê bîra min. Lewra min di îşkencexaneya ***<Qurtoglu>*** ya Diyarbekirê de serpêhatiyeke sosret dît. Bi kurtî weha bû:

Em girtî li dora 120 kesî bûn. Şevekê derengiya şevê bû, leşkerên Cuntayê ji me pirsîn?

- ‘Di nava we de ne bisilman hene?’

Kesî deng nekir. Pirsa duyem:

- ‘Di nava we de Elewî hene?’

Çendî ku çavên me girtî bûn, li gor dengê jimartina leşkeran 12 kes Elewî bûn. Leşker bi ço, şiv û copan ew şev li Elewiyan xistin heta ku ew 12 li erdê kirin term.

Piştre leşkeran got:

- ‘Bisilmanino, heçî Henefî ne, bila destên xwe rakir.’

Dîsa li gor dengê jimara wan, yên ji Mezhebê Henefî 6-7 kes bûn. Û leşker bi ço û şivterkan li wan jî xistin û her carê digorin: ‘Dêqehbno, çima hûn wisa hindik in?’

Piştî lêdana pêngava duyemîn, îcar vegeriyane ser me Şafiiyan û li me jî xistin, digotin: ‘Zarûkên hîzan, çima hûn wisa pir in?’

Mesela naveroka wê gotara min jî li ser Şengal û Kobanê bû, ji ber ku terorîstan pêşî digotin: ‘Şengal Êzîdî ne û dînbetal in; mal û jinên wan tev helal in.’ Lê dema êrîş birin ser Kobanê, îcar digotin: ‘Ev Kurd MURTED in (ji dîn vegeriyane) û her tiştê wan ji bo bisilmanan helal e.’ Eger ew hatibûna Amed û Batmanê jî û vegirtibûna, wê eynî atara Şengal û Kobanê li wan jî kiribûna.

Hêvîdar im ku siyasetmedar û hemû bîrewerên Kurd, ders ji Koban û Şengalê wergirtibin.

***Ali Gurdilî:*** *Niha ez li ser gotinên pêşiyan, lêkolînek dikim. Yanî, ji hêla ramanên felsefîk ve dixwazim ku li gotinên pêşiyan hûrbibim. Beriya çend rojan jî, te bala xwînerên xwe daye ser dewlemendiya Çîroka Folklorî. Gelo meriv dikare bibêje ku kurdan,*

*gelek ramanên xwe yên felsefîk jî di çîrokên xwe yên folklorîk de jî vegotine? Çimku tunebûn yan jî kêmasiya zimanê nivîskî û qedexeya li ser zimanê kurdî ya bi sedê salan, her zargotina kurdan xurt kiriye û kurd bêgav mane ku hemû fikrên xwe bi riya stran, pêşgotin, çîrok, metelokan bibêjin. Ji kerema xwe re, tu bikaribî vê meseleyê hinekî zelaltir bikî?*

**Zeynelabidin Zinar:** Pêşiyên me gelek ramanên xwe yên cuda xasma yên felsefî di çîrok û meselokên folklora xwe de eşkere gotine. Peyvika Folklor sal 1846, ji aliyê zanayekî bi navê ***William Tomas*** li Londrayê derketiye holê û demekurtek şûnde li nava tevek neteweyên Arî belav bûye. Lê mixabin Sedsala Nozdeh û ya Bîstî weke du sedsalên reş di ser Kurdan re bihurîne û her tiştê wan ên pîroz û şexsiyeta wan a netewî ku pê eşkere dibû tune kirine. Bi riya hin mele û şêxên hevalbendên serdestan, piraniya berhemên folklorî xasma çîrok û meselok, bi xûta ku gotina wan <heram> e, li Kurdan hatine qedexekirin.

Lê belê Çanda Kurdî pir dewlemend e, berî ez dest bi lêkolîna li berhemên klasîk û yên Folklora Kurdî bikim, çendî ku min dizanibû Çanda Kurdî dewlemend e jî, lê belê ew dewlemendî ji sînorê xwe yê ku dihate gumankirin pir û pir zêdetir derket holê.

Di lêkolîna min a 12 salan de, 1.710 perçe ji Folklora Kurdî bi destên min ketine û min ew bi navê ***XWENÇE*** kirine 10 cild û weşandine. Ev berhemên folklorî ku min bi dest xistine, weke ku meriv çengek av ji deryayê hilde wisan çêbûye. Mînak, Çîroka Gul û Sînem. Kîjan çîrokbêj dema vê çîrokê dibêje, pêşî weha dibêje: ‘Heft şaxên vê çîrokê hene, lê ez tenê vê dizanim.’ Min çar şaxên vê çîrokê bi dest xistine, lê hêj sisê mane.

Folklora Kurdî ji aliyê raman û felsefê ve bi çîrok û çîrovanokên xwe pir fireh e, ji ber ku di wan de gelek babetên cuda hene ku bi xwendina wan, gelek babetên ku bi hêsanî nayên fêmkirin, eşkere dibin. Bi wê yekê, dinyayeke bê sînor li pêşberê meriv vedibe ku mirov di tarîstaneke bêhevî de li rewşen û ruhniya zanistiyê rast dibe. Bi wê hunerê mirov nexşeyeke pir mezin li ser sê parzemînan ku Asya, Ewrûpa û Afrîqa ye jî dibîne.

Li gor wan belge û materyalên Folklora Kurdî ku niha di destên min de ne, hertim Diyarbekir paytexta **Çîrokên** Folklorî bûye û girêdana xwe bi gelek welat û herêmêm cuda (dûr/nêz) re daye çêkirin.

Bi kurtî ger bêjim, Folklora Kurdî, adana jiyana Çanda Kurdî ye. Îcar em ê lê binerin ka çi di vê xizneyê de hene:

***- Gotinên Pêşiyan:*** *Ev e çend ji wan:*

*- Şam şekir e, lê welat şêrîntir e.*

*- Jin û mêr, tevr û bêr.*

*- Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e.*

*- Yek ban e, du zozan e.*

*- Diz ku ji malê be, ga di kulekê re derdixe.*

*- Dixwim nan û avê, hilnadim mineta bavê.*

*- Dîtin ez im, nedîtin diz im.*

***- Stranên Kurdî:*** Temenê strana Kurdî, 5.000 sal e. Berê strana kurdî jî weke helbestên klasîk bi kêş, nikl, kitejmar û qafiye bûye. Lê di pêvajoya demê de ew rewş hatiye guhertin.

Di klam û stranên dîrokî de Mîjûya Kurd heye.

***Ev xal du beş in.***

***Yek:*** Bi kêş û qafiye û nikl in.

***Dido:*** Bi kêş û nik in, lê bê qafiye ne.

Strana kurdî jî dabeşê ser gelek şaxan bûye, hin ji wan ev in:

*- Stranên Dîrokî (Li ser Şêx Seîd, Qazî Mihemed, Îhsan Nûrî Paşa, Mele Mistefa Berzanî û hwd hatine gotin).*

*- Stiranên Şînê hene.*

*- Stiranên Kêf û Xweşiyê hene.*

*- Stiranên Evîniyê.*

***- Heyranok:***

***- Dîlok:***

- ***Bacî:*** *(Lawik li ser keçikê dibêje)*

***- Lawik:*** *(keçik li ser lawik dibêje)*

***- Payîzok:*** *(di karê payîzê de tên gotin)*

***- Meselok**: Ev kurt in: (Mele Elî û limêja gundiyan, tenê limêjek)*

- ***Pêkenok:***

***- Leqemok**: (davêjin hevudu)*

***- Lawij/lawje:***

***- Xweşbêje:***

***- MAMIK:***

***Ev e çend mînak ji Mamikên Kurdî:***

*- Qesreke sipî ya bêderî, melayek tê de bêserî? (HÊK)*

*- Şiva ter, ket guher? (MAR)*

*- Ez çûm bi ha ve, ecêbek hat pêş min ve; sîtil ji kuç e û agir ji av e? (AŞÊ AVÊ)*

*- Şonikê qîrê, ket binê bîrê? (Berika Tivingê ku dikeve xiznê)*

*- Dep e, ne dar e. Serhilû ye, ne mar e. Giya dixwe, ne kar e? (Reqa Bejî)*

***- BWÊJ/biwêj:***

***Ev e du mînak jê:***

*- Adarê, bewrf digîje guliyên darê, lê namîne danê êvarê.*

*- Dar û kulavê min, rehmet li dê û bavê min.*

***- ŞÎRET Û NESÎHET:***

*Ev e çend mînak:*

*- Ol û Ayîn, nesîhet in.*

*- Dûa çeka bawerhuner e.*

*- Lixwetirsîn, perestin e.*

*- Rastbêjtirîn, têgehejtirîn e.*

*- Baştirînê xweperestinê nihênî ye.*

*- Baştirînê marbirînê erzanî ye.*

*- Her gunahik jê re seza heye.*

- ***Serpêhatî:***

*Bûyerek, bobelatek, rûdanek bi serê yekî ve hatiye û wek çîrok hatiye gotin, piştre li nava xelkê belav bûye.*

- ***ÇÛROK (û ÇÎRVANOK):***

*Beşa herî vêjeyî, xweş û ku rewşa jiyana mirovan radixêle ber çavan, Çîrokên Folklorî ne.*

*Ev jî çend şaxên xwe yên cuda hene, ev e çend ji wan:*

*a) Çîrokên Rawilan (fabil).*
*b) Çrokên Mirovan.*
*c) Çîrokên Têkel.*
*d) Çîrokên Kurt.*
*e) Çîrokên Dirêj.*

***- ÇÎRVANOK**:*

*Ev tîp fentezî, derdemî û xeyalî bêsînor û bêber in.*

Dema ku mirov bi têgihîştina folklora xwe rewşen dibe, mirov girêdana reha xwe ya nijadî, saxlem dibîne. Mirov êdî xwe bi bav û kalên xwe serbilind dike. Tiştê herî girîng ev e ku mirov êdî xwe ji kirina xirabiyan dide paş. Herweha bawerîya mirov pir zêde bi mirovî çêdibe. Mirov pir dixwaze ku şexsîyeteke rind bigire. Mirov dixwaze ku di her karê xwe de serkeftî bibe. Mirov hertim xwe berpirsyar dibîne ku destên alîkarîyê dirêjê jar û belengaz bike. Û bi dehan xeysetên baş ên wisa…

Ji ber van giringîyên ku hatin gotin, îro pêdivîya kurdan pir heye ku berhemên folklora xwe bixwînin û bi zarokên xwe bidin xwendin. Xasma jî, dê û bavên kurd, zarokên xwe bi çîrokên Folklora Kurdî mezin bikin.

Ji wan re çîrokên rawilan bibêjin, meselokan bibêjin, pêkenok û serpêhatîyan bibêjin, heyranok û payîzokan bibêjin, şîret û nesîhetên bav û kalan bibêjin, şîroveya Gotinên Pêşîyan bibêjin, klasîkên kurdî bi wan bidin naskirin, herweha xwezaya Kurdistanê jî bi wan bidin naskirin.

Bêguman çi neteweyê ku zimanê xwe neparêze û li gor toreya xwe nelipike, ew netewe di ber mirine de ye.

Herweha çi neteweyê ku folklora wî tune be, ew netewe goristaneke bê kelik e. Lê eger folklora wî hebe û xwedîtî li folklora xwe neke, ew netewe goristaneke bi kelik e. Yanî neteweyê bê tore û bê folklor, her mirî ye û warê wî jî her goristan e. Lê eger ew netewe xwedîtî li tore û folklora xwe bike, hingê ew gulistaneke şên e û di rengê deryayeke be kevî û bê binî de ye.

***Ali Gurdilî:*** *Em dizanin ku gelek xebatên te li ser berhemên Nemir Ehmedê Xanî û Mewlana Melayê Cizirî hene. Bi nêrîneke giştî be jî, mirov derheqê felsefeya wan de dikare çi bibêje gelo?*

**Zeynelabidin Zinar**: Bêguman bingeha felsefeyê pirs û bersiv in. Dîsa bêguman li jiyanê kesê bê felsefe jî tune û felsefe babetê nîqaş û dehkereyan e. Herweha kesên ku di zanistiyê de bûne tevdezan, bi baweriya min tenê yek şop felsefeyê dane ajotin ku ew jî rêbertiya zanistiyê bûye. Wek mînak: Melayê Cizîrî dîwana ku honaye, ji 114 beşan pêk hatiye û her beşek jî naveroka wê, kêş û nikl û kitejmar û qafiyeya wê ji ya din cuda ye.

Em bala xwe didinê ku Qurana pîroz jî 114 Sûret in *(Zeydê katibê Wehyê nivîsiye)*. Herweha Cizîrî beşek ji helbesta xwe bi navî Felsefe ku nivîsiye, 142 çarîne ne. Di wan çarîneyan de çend felsefeyên cuda têne dîtin. Ez bi xwe bawer dikim ku Cizîrî ev hawe tenê wek agahdarî daye xuyakirin. Lê belê babeta Felsefeya Ehmedê Xanî cuda ye, ewî felsefeya xwe li ser xwendin û zanîn û zanistiyê li ser bingeha nijadî ava kiriye.

Di wan sedsalên ku Cizîrî û Xanî tê de jiyane, ol û oldarî yek ji mercên jiyanê bûne.

***Ali Gurdilî:*** *Beriya kurtedemekê, cenabê te di medyaya sosyal de bi navê* <**Dolar çewe digihin DAÎŞê**> *gotareke weşand. Di gotarê de, tu behsa şehîdbûna peşmergeyekî û çûna bavê wî ya Hicê dikî. Lê pereyên bavê peşmergeyê şehîd, ku îşaretkirine û li hicê xerc kiriye, di berîka leşê Daîşiyekî de dertên. Dema min ew nivîs xwend, kûştina Mensûrê Hallacvan û helwesta wî ya derheqê çûna Hicê hate aqilê min.*

*Hallacvan, derheqê çûna Hicê de wiha gotiye: "Dema hêza mirovekê tunebe here Hicê, wê demê ew mirov dikare li mala xwe jî bi awayekî sembolîk vê merasîmê pêk bîne û ev yek jî, di dewsa çûna Hicê de ye." Helbet bi vê nêrîna xwe,, Hallacvan pîroziya arişî/manewî ya hindûrîn, di dewsa pîroziya daringî ya Kabeyê de dîtiye û ziyareta Xwedê ya arişî, derxistiye pêş. Di vir de pirsa min eve e*: *Gelo mirov neçin hicê û pereyên ku di riya çûna hicê de xerc dikin, li feqîr û belengazan belav bikin, dûvre jî bi awayê ku Hallacvan destnîşan kiriye seramoniya xwe pêk bînin, dê hica wan qebûl nebe? Yanî li gor qaideyên dînê îslamê dipirsim?*

**Zeynelabidin Zinar:** Li gor mercên zagona Îslamê, çûna Hecê li ser van kesan deman e: Mal hebe, asteng jê re nebe. Astengî, ger bi stendina pereyekî hindik be jî, dîsa çûna Hecê ne deman e. Kesê ku diçe Hecê, divê di malê wî te bi çu rengî heramî nebe. Ew heramî çi malê mîratxuran be, çi malê xelkê, yan zêdeyî (faiz) û wekî din ji bazirganiya xapandinê be.

Ji ber ku îro Meke û Medîne di nav sînorên dewletekê de ne û sînor ji bo çûnê re asteng in, ne deman e.

Hikûmeta Seûdî jî Wehabî ye, ev wehabîtî jî vajiyê baweriya Ehlê Sunet û Cemaetê ya Suniyan e. Çi suniyekî here wirê mecbûr e ku riayeta hikûmeta Wehabî bike. Ji ber vê be jî, çûna Hecê ne wacib e.

Ya girîng, min bi xwe ji devê jineke Kurd ku bi erebî jî dizane û li Medîneyê çûbû ber gora Pêxemberî (xxl), leşkerekî Seûdî pê re xeyidiye û bi erebî gotiye: 'Mihemed bûye hestiyekî rizî, wê hestî karibe çi ji te re bikin?' Ha ew desthelatiya ku Pêxemberî wek hestiyê rizî bizane, ji ber vê be jî çûna Hecê ne deman e.

Eger feqîrên jar û belengaz, xasma yên xizm û destegîr hebin, eger meriv pereyên ji bo Hecê amade kiriye bide wan, xêrtir e ji çûna Hecê.

Li ser wê nûçeya Dolarê Pêşmergeyê bavê şehîd, divê Kurd heta demekê neçin Hecê. Ka Erebistana Seûdî tewrên xwe li pêşber terora DAIŞê çewan eşkere dike.

Helacê Mensûr (***Abūal-Muxīṭ Husayîn Manṣūr el-Ḥallac** 858-922*) rast gotiye. Ew gotina ku gotiye: <Enel Heq> wê demê şaş hatibû fêmkirin û pê hatiye kuştin. Niha jî û wê demê jî hemû olzanên dinyayê gotine û dibêjin ku <*Xwedê li her derê ye û di her tiştî de ye.*> Madem mirov jî beşek ji heyîn ne, Xwedê di wan de jî heye.

*Herweha Hedîseke cenabê Pêxemberî jî weha heye:*

*'Kiryar bi niyetê ne.'*

Mesela, eger perê te nebe, here Cizîrê serdana Gora Nûh Pêxember.

Salek berê perê min nebûn ku ez herim Hecê, lê ez bi niyeta Hecê çûm serdana gora Ehmedê Xanî.

Erebistana Seûdî hem Wehabî ye û hem jî DAIŞê dişîne ser Kurdan, serê Kurdan jê dikin, malê wan wek <xemînet> dibin û keç û jinên wan jî wek <cariye> dibin û di bazaran de

jî difiroşin. Kurdê ku piştî vê wehşetê jî here pereyên xwe bide wan, tawanbar e.

***Ali Gurdilî:*** *Berî çend rojan, cenabê te bi sernavê 'Sextekariya di ol û îdeolojiyê de' gotarek weşand û bala xwînerên xwe da ser wê xeteriya mezin. Gelo, di serdema me de mirov dikare tundrewiya olî û îdeolojiyên demborî, mîna du xeteriyên mezin bibîne? Û di serdema me de, ji bo mirovahiyê nirxên me yên sereke divê çibin li gor baweriya cenabê te?*

**Zeynelabidin Zinar:** Bêguman, di nava hemû olan de sextekarî çêbûne û çêdibin. Dema Xelîfe Emer ku ferman daye Zeydê Katibê Wehyê da Quranê li ser kaxez binivîse û bike mîna kitêb, demekurtek piştre şeş pirtûkên dî bi navê <quran> ji aliyê eşîrên Ereb ve derketine holê.

Mixabin sextekarî îro di nava Bisilmanan de zêdetir çêdibe, ji ber ku bisilman niha *(Sedsala Bîstûyekê)* xwe gehandine vê teknîka nûjen jî, pir bi hêsanî dikarin sextekariya xwe bi qalîte derxin pêş. Çewa ku di wê gotara min de navê Xwedê li ser şanikê hingiv dane nivîsandin, li aliyê din jî das û çakuça qomunistiyê li ser şanikê hingiv dane nexşkirin. Van herdu aliyan jî xwestine ku bidin zanin ku hunera wan ya nepenî heta ku ji aliyê mêşên hingiv ve jî hatiye peyitandin.

Di vê dema niha de, divê nirxên me yên sereke, xebat û libat ji bo mirovahiyê bêtin kirin. Yanena, ev neteweyên serdest û kevneperest ku xwedanê dewletan in û derfetên wan ên xurt hene, dikarin xirabiyên pir mezin bi kesên bê dewlet bikin.

***Ali Gurdilî:*** *Ji kerema xwe re, pêşniyazên te yên ji bo ciwanên me yên ku nû dest bi xwendin û nivîsîna kurdî kirine çi ne? Çawa dikarin zimanê xwe zêdetir xurt bikin û baş biaxivin?*

**Zeynelabidin Zinar:** Sed sal, dused sal berê, ev dewletên serdest kesên ne ji xwe bi jêkirina seriyan ji holê radikirin. Lê belê niha bi alîkariya teknîka nûjen û pirbûna derfetên aborî, karin pir zû merivan bihelînin û bikin mîna hevîr, piştre jî li gor vîna xwe reng û wêne bidinê.

Çewa ku Xwedayê mezin jî gotiye ku her zimanek ayetek ji ayetên wî ne (Ayet 22, Sûret Rûm), divê her Kurdê bawermend ayeta Xwedê biparêze ku Zimanê Kurdî ye. Lê Kurdên ku ne bisilman in, divê ew ji bo parastina nijada xwe zimanê Kurdî biparêzin.

Ciwanên Kurd ên ji salên 1980yî û bi vir ve, nivşên heşifandina dema teknîka nûjen in. Lê belê ji 2007an û bi vir ve, derfetine zêrîn ji bo bipêşxistina Zimanê Kurdî derketine holê.

Divê her ciwanek, hewl bide xwe heta ku dest dide bi kurdî bipeyive û notên xwe yên rojane bi kurdî binivîse. Herweha divê her ciwanek her roj nîv rûpel bi xameyê li ser kaxez bi kurdî fenteziyên xwe binivîse. Bila her ciwanek her roj bi qederê saetekê nivîsên kurdî yên cuda cuda bixwîne. Bi vî hawayî demekurtek şûnde ciwan fêrî zimanê xwe dibe.

Divê em jibîr nekin ku dema ziman bête bikaranîn zindî ye, lê dema neyê bikaranîn mirî ye.

***Ali Gurdilî:*** *Ji kerema xwe re, tu dikarî çend kitêban pêşniyazê xwînerên me bikî, da ku ciwanên me bixwînin û sûd jê werbigirin.*

**Zeynelabidin Zinar:** Li gor lêkolînên min, nivşên van dewletên nûjen ên dinyayê, hemû ji du cûre pirtûkên xwe zanîn û têgehiştinê wergirtine. Yek berhemên folklora xwe û ya din berhemên xwe yên klasîk. Helbet ev hawe ji bo

ciwanên me jî sufte ye; bila ciwanên me jî Klasîkên Kurdî û berhemên Folklora Kurdî bixwînin.

***Ali Gurdilî:*** *Ji kerema xwe re, tu dikarî hinekî behsa felsefeya xwe ya jiyanê bikî? Jiyan, ji bo te çi ye? Nirxên ku jiyana te watedar dikin çi ne? Çi xewn û xeyalên te hebûn û bicîh hatin gelo yan na û herî zêde tu di jiyana xwe de qîmetê didî çi?*

**Zeynelabidin Zinar:** Bi van çar pirsan dikarim weha bibêjim: Ji ber ku niha ez çendî ku kesek im, lê du jiyanên min hene Yek, Cuntaya Kenan Evrenî ez di 1981ê de kuştim, lê Nexweşxaneya Xaça Sor ez ji mirina lezgîn vegerandim. Jiyana min a berî 1981ê cuda bû, ya piştî wê jî cudatir e. Ez jiyana xwe ya duyemîn çirk bi çirk, deqe bi deqe, kat bi kat, bi kêş û pîvan dinirxînim.

- Jiyan, ji bo min xizmeta Çanda Kurdî ye. Eger ne ev be, jiyan dibe wek ya sewalan û bê wate ye.

- Nirxên ku jiyana min watedar dikin, dîsa xizmeta Çanda Kurdî ye, belavkirina zanîna wan kesên pîroz e ku qewîtiya xwe li min kirin da ez jî weke wan tiştê ku zanibim bigehînim kesên ku nizanin.

- Ez dema 5-6 salî bûme, min gotiye ku <dema ez mezin bibim, ez ê ji xwe re qelemek, defterek û neynikek bikirrim.> Dema ez heştsalî bûme jî, piştî lêdana cendirmeyan li min, min gotiye ku <dema ez mezin bibim, ez ê ji Kurdan re cendirme çêbikim.>

Heta niha gelek vîn û daxwazên min bi cih hatine, lê hinek mane, hinek jî hene lê hêj bi cih nehatine. Hinek tiştên pir girîng jî hene, niha hêj zû ye ku eşkere bikim.

– Herî zêde ez di jiyana xwe de qîmet û giringî didim berhemên Folklora Kurdî û yên Klasîkên Kurdî.

***Ali Gurdilî:*** *Mamosteyê min, spasdar im bo vê hevpeyvînê û vê fersenda ku cenabê te da me. Mala te ava. Li ser navê xwînerên (xwendevanên) malperê, em serkeftin, saxî û silametiya cenabê te dixwazin.*

**Zeynelabidin Zinar:** Ez jî spas dikim ku we ez ji bo hevpeyvînê hilbijartime, serkeftin û serfirazî bo cenabê te û heval û hevriyên te dixwazim. Herweha ez spas dikim ji bo wan xwendevanên ku dema xwe wê bi xwendina vê nivîsa min re dema xwe bibihurînin. Her şad û bextewer bin…

**Hevpeyvîn: Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

**17.01.2015**

Têbinî: Ev hevpeyvîn di malpera www.felsefevan.org ê de jî hatiye weşandin.

# Pênase, Nûve û Taybetmendiyên Dewletê

Dewlet, saziya herî mezin û çalak a civakî ye. Ji aliyê mirovên ku girêdayê desthilatdariyeke raser in ve, li ser axek a ku sînorên wê diyar in tê avakirin. Dewlet, sazûman û serweriya civakê, li hemberî civakên din diparêze û xwediyê yekîtiyeka hiqûqî û sîyasî ye. Dewlet, piştî ku mirov li ser axê bi cîh bûne û di navbera wan de têkiliyeka rêveberiyê destpêkiriye, derketiye holê. Di civakên hoveber de, ji ber ku navendeka hêza serpereştiyê (rêveberiyê) û desthilatdariyeka sîyasî tunebû, dewlet derneketiye holê.

Di eşîretan de ku yekemîn civaka bicîhbûyî ne, prototîpa dewletê derketiye holê. Li bajaran jî, bi hemû saziyên xwe yên bingehîn û erkên xwe re, dewlet derketine holê. Ango, dewletên bajarî.

**Unsûrên (Nûveyên) Dewletê**

**1- Gel**: Civatoka mirovan, a ku li hawirdorê rêveberî û desthilatdariyeke sîyasî top bûne.

2- **Welat**: Ax a ku demekê dirêj, gel li ser jiyaye.

**3- Serwerî**: Desthilatdariya siyasî a ku li ser axa gel, nûnertiya serweriya gel dike, ye. Ev hêz, ji aliyê hiqûmetê ve tê bikaranîn.

**Taybetmendiyên Giştî yên Dewletê**

**1-** Dewlet saziya herî mezin, birêxistî û çalak a civakî ye, ku berdewamî û sazûmana civakê diparêze.

**2**- Serweriya xwe, bi riya bikaranîna sê wezîfeyan pêk tîne. Ev wezîfe jî rêvebirin, zagonçêkirin û darazdanîn in.

**3-** Dewlet li hember xeteriyên ji hindûr û der, dikare hêzeka ku xwe dispêre darêzorê, bikar bîne.
**4-** Dewlet bi nêzîkayîtêdaneke sazgêr; ji hêla sosyo-kulturî, sîyasî, edalet, perwerdehî, pirsgirêkên hawirdorî û hwd. ve, jiyana civakî qontrol dike.
**5-** Dewlet, têkiliyên saziyan sererast dike.
**6-** Endametiya şexsan a dewletê, tiştekî bivênevê ye û ev endametî bi riya gurza hemwelatîbûnê pêk tê. Mafê hemwelatîbûnê dema ku rewş rê didin, bi biryara rêvebirinê tê bidestxistin, yan jî windakirin.

***Texlîdên Dewletê***

***Li Gor Avahiya xwe ya Hindûrîn Dewlet***

***A- Yek (Unîter) Dewlet:*** Di vê cure dewletê de, gel girêdayê desthîlatdariyeke navendî ye û li her devera welêt, heman zagon derbasdar in. Mînak: Yewnanîstan, Tirkiye û Fransa.

***B- Dewleta Federal****:* Di nav dewletekî de, gelek dewlet hene û her yek li gor avahiya xwe, xwediyê zagon û livokên zagonçêkirinê ne. Di karên xwe yên navxweyî de azad, lê di karên derveyî de; girêdayê dewleta navendî ne, ku bi hevdu re wê pêkanîne. Ev cure dewlet, ji gelek dewletên federal pêk tê. Mînak: USA, Îraq, Germanya, Federasyona Rusyayê û hwd.

***Li Gor Têkiliyên Dewlet û Olê***

***A- Dewleta Teokratîk****:* Di vê cure dewletê de desthîlatdariya siyasî, li gor esasên olî pêk hatiye û zagon, xwe dispêrin çavkaniyên olî.

***B- Dewleta Laîk****:* Di vê cure dewletê de, kar û barên dewletê (zagonçêkirin, birêvebirin û darazdanîn) ji ol cuda ne û jê hatine cihêkirin/cudakirin.

***Taybetmendiyên Dewleta Laîk***

**1-** *Oleka ferm a vê dewletê, tune.*

***2-** Dewlet ewlekariya serbestiyên mirovan yên weke bawerî, îbadet, hilbijatina ol û hwd. dike.*
***3-** Hiqûq, ne li ser unsûrên olî; li ser zagonên aqlî û şert û mercên hemdem yên jiyanê hatiye damezrandin.*
***4-** Di dewleta laîk de, di pêşiya her tiştî de perwerdehî, piştra jî malbat, huner, zanist, ekonomî û jiyana rojane; ne li ser esasên olî, lê li gor pêdiviyên hemdem û şaristaniyê têne sererastkirin û birêvebirin.*

***Li Gor Awayê Serweriyê Dewlet***

***A- Dewleta Otokratîk**:* Di vê curedewletê de, erkên bingehîn yên dewletê (zagonçêkirin, birêvebirin û darazdanîn) di destê yek mirovekê de ne (monarşî) yan jî destê komekê <zumreyekê> (olîgarşî) de ne.

***B- Dewleta Demokratîk**:* Hêza zagonçêkirin, rêvebirin û darazdanînê, di destên livokên cuda de ne. Ji vê yekê re, ***'Cudahiya Hêzan'*** tê gotin. Gel, bi îradeya xwe ya azad nûneran hildibijêre û dişeyne parlamentoyê.

Di dewleta demokratîk de, hêza darazdanînê serbixwe ye û hemû kesayetî, di bin parastina dewletê de ne. Dewleta demokratîk, li gor prensîba ***'wekhevîyê'*** rê ji bikaranîna maf û azadiyên şexsî re vedike û wan diparêze.

Dewleta demokratîk, di heman demê de ***dewleta sosyal*** e jî.

Dewleta sosyal ew dewlet e ku li hemberî zagonan, wekheviya hemwelatiyên xwe diparêze û maf û azadiyên wan yên bingehîn jî, di bin parastina dewletê de ne. Dewleta demokratîk, li gor prensîpên bingehîn yên demokrasiyê şekil digre û bi vî awayî, erka xwe bidest dixe.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**Çavkanî: Destpêka Zanista Civaknasiyê**




Xwedê yek e û ew, li her derê ye. Li hemberê Xwedê, mirov ne tu tişt in. Lewra Xwedê derêzeman e û mirov jî, girêdayê demê ne. Xwedê bi îradeya xwe ya azad gerdûnê û mirovan afirandî ye. Di destpêkê de mirov azad hatine afirandin, lê Ademê mirovê yekemîn bi vê azadiya xwe, guneh kiriye. Gunehê wî ku gunehê yekemîn e, bi rêya veguhastinê xwe gihandiye hemû mirovan û mirov êdî nikarin beyî gunehan jiyana xwe bidomînin.

Herweha, beyî Xwedê mirov nikarin ji gunehên xwe, xwe rizgar jî bikin. Ev yek jî, encax bi qenciya/başiya Xwedê dikare pêk were. Çimku, di navbera Xwedê û mirovan de hevrezanek mezin heye û ti kes, nikare ji vê hevrezanê derbas bibe. Xwedê û mirov, ne ji heman hevîrê ne û tiştê girîng ew e ku mirov, bikaribin Xwedê binasin. Lewma jî, ez dixwazim bi tenê Xwedê û Rih binasim, ji bilî wan jî, tiştekî din min eleqeder nake.

**Xoşewîst Augustînus | 354- 430**

# SIGMUND FREUD Û PSÎKANALÎZ

Sigmund Freud (1858-1939), bi eslê xwe cihû ye û hemwelatiyekî Avusturyayê ye, psîkîyatrîst e û wekî damezranerê psîkanalîzmê hatiye dîtin. Psîkanalîz, texlîdek dahûrandina derûnî ye. Rêbazek a başkirinê ye. Bi vê rêbazê re li pevçûn ajoyên di binhişê mirovan de hene, têne vekolandin û piştre jî, ev pevçûn û ajo, ber bi asta hiş ve têne dahfdan/derxistin. Di vê rêbazê de, jiyana mirovan ya zarokatiyê (temenê di navbera salên 0 û 7an) girîng tê dîtin û wisa tê pejirandin ku kesayetiya mirovan, di temenê di navbera 0-7an de bi lewn dibe, bi cîh dibe.

Sigmund Freud, nexweşên xwe hîpnotîze kiriye û wan bi vî hawî daye xeberdan. Girîngiyeke mezin, daye xewnan. Dîsa li gor baweriya wî sebebê nexweşiyên ruhî/derûnî, ***<libîdo>*** ye. Ango, vejena (enerjiya) cinsî ye, şehwet e.

Sigmund Freud heta mijîna zarokan a şîrê diyê jî, bi libîdoyê şirove kiriye. Derheqê jinan de jî gotiye ku *'Min sih (30) salan li psîkolojiya jinan vekola, lê bi rastî ez tênegihêjtimê ku ew çî dixwazin?'*

***Psîkanalîz û Taybetmendiyên Psîkanalîzê***

***1-*** *Di dawiya sedsala 19an de, bi serpereştiya Sigmund Freudî dest pê kiriye. Sigmund Freud û çend hevalên xwe yên doktor, gotine ku nexweşiyên aqlî û ruhî, nexweşiyên psîkolojîk in.*

***2-*** *Di dema vekolana nexweşiyên aqlî de, derhişê kifşkirine.*

***3-*** *Piştra, Freud û hevalên wî wiha bawer kirine ku sebebên nexweşiyên aqlî û ruhî, têrnekirina hest û ramanên me yên zarokatiyê ne, ku ber bi derhişê ve têne dahfdan û wisa tê xwestin, ku bila werin jibîrkirin.*

***4- Li gor Sigmund Freud; hiş, ji sê (3) meretebeyan pêk tê.***

***1- Hiş:*** *A ku em têdigihêjinê.*

***2- Beriya hiş:*** *Tiştên ku li gor xwestekên me, têne hişê mirov in.*

***3- Derhiş/Derhişî:*** *Xwestek û hestên me yên ku me wan bi temamî jibîrkiriye, yan jî me xwestiye ku em wan jibîr bikin.*

***5- Kesayetî/şexsîyet, ji sê (3) mertebeyan pêk tê:***

***1- Îd:*** *Hilika yan jî navenda kesayetiyê û hêla bîyolojîk a ku xwe dispêre zewqê.*

***2- Ego:*** *Rewşa hevsengî (parsengî) a ku rasteqînî lê serwer e.*

***3- Superego:*** *Hêla sosyal/civakî, ya ku nirxdarazî têne pejirandin.*

***6-*** *Derhişî ne pasîf, herdem aqtîv e. Carinan lewnê/şeklê xwe biguherîne jî, di xewn û xeyalan de, xwe dide der.*

***7-*** *Pirraniya tevgerên me, li gor vê yekê (li gor rewşa derhişê) pêktên yan jî çêdibin.*

***8-*** *Freud û hevalên wî; wiha têgihiştine ku sebebên bûyerên ruhî (derûnî), bîyolojîk in jî. Yanî, bandûra biyolojiyê jî, li ser psîkolojiya me heye.*

***9-*** *Di bingeha tevgerên me de, jiyana me ya zarokatiyê heye.*

***Derhişî çi ye?***

*Avahiya ku ji aliyê hest, bîranîn û xwestekên me yên ku hatine dewisandin pêk hatiye, ye. Sebebê dewisandina wan hestan, bîranîn û xwestekên zayendîtiya hov û vajoyên êrîşkar in, ku bi demê re êşê û şermê didine mirovan.*

***10-*** *Ji bo têgihiştina tevgerên mirovî, divê meriv bi zarokatî û rabirdûya wan bizanibe.*

***11-*** *Hinek sebebên tevgerên me jî, bîo-psîkolojîk in.*

***Rêbazên ku tevgera Psîkanalîzê wan bikaranîne.***

***1-*** *Dahûrandina Xewnan*

***2-*** *Hîpnoz*

***3-*** *Bibîrxistina Serbest*

**Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

**Çavkanî: Destpêka Zanista Psîkolojiyê**

# FERHENGOKA FELSEFEYÊ (3)

**1- Aidios / Herhebûnî:** Di felsefeya yewnan ya serdema pêşîn de, di wateya rewşa 'bêdawî, bêmirin û di demê de berdewamiyê' de ye. Di zimanê ingilîzî de ji bo aidios, peyva 'eternal' ku di wateya 'bêdestpêkî û bêdawîtiyê' de ye, tê bikaranîn.
ing: eternal
fr: eternal
tr: sonsuzluk

**2- Aksiyom:** Pêşniyara wiha tê fikirîn ku bi awayekî eşkere (zelal) rast e û bingeha pêvajoya peyîtandinê ye.
ing: axiom
fr: axiome
tr: belit, aksiyom

**3- Arîstotelestî / Geryanperestî:** Di ramana îslamê de, navê ku li felsefeya Arîstotelesî kirine. Arîstoteles di rewşeka geşt û gerê de dersan dida şagirtên xwe. Ev nav ji wir tê, ango meşşaîperestî.
ing: aristotelianism
fr: aristotélisme
tr: aristotelesçilik

**4- Aforîzma:** Gotinên watedar. Wecîze. Navê pirtûka Hîpokrat ya ku gotinên wî yên watedar diguncîne.
ing: aphorism
fr: aphorisme
tr: özdeyiş

**5- Berhema Hunerî:** Afirandina hunermend e, hunermend ji xwe (ji dil, bîr, baweriya xwe) form û spehîtiyeke dayê, ku babeta nîrxandina estetîkî ye.
Madeya hunermend ya ku di dema pêkanînê de bikar tîne, ji bo peykertraş mermer, tunc an jî cas (cils, alçî) e. Ji bo muzîkvanekê deng e, ji bo wênesazekê reng, kaxiz û pênûs e. Hunermend wan madeyan bikar tîne û wateyeke dide wan, di dawiyê de dibin xwediyê weteyeke û bi berhema hunerî tênê binavkirin.
Bi saya afirandina hunermend; mermer dibe peykereke Musa, reng û boyax dibin wêneyek û deng jî weke besteyên Şivan Perwerî dertêne pêşiya me.
***Çend Taybetmendiyên Berhema Hunerî***
***A-*** *Berhema hunerî encama çalakiya mirovî, ya bi bîr û armanc e.*
***B-*** *Berhema hunerî, zewqeke estetîkî û kelecanê dide mirovî. Ango, em nikarin bi tu awayî li bendê bin ku di jiyana me ya rojane de berhema hunerî bi kêrî tiştekî were. Ji bilî vê yekê, berhema hunerî ji bo armancên sîyasî û ehlaqî jî, nikarin werin bikaranîn.*
***C-*** *Berhema hunerî kit û tekan e. Bi gotineka din, orjînal e. Wesfa wê ya herî mezin ya ku mirovî bi saya wê dikare wê ji nesne/hilberên din yên mirovî cihê bike/veqetîne, xweseriya wê ye. Heke Ehmedê Xanî tunebûya wê Nûbihar, yan jî Shakespeare tunebûya, dê Macbeth jî tunebûya.*
***D-*** *Her berhema hunerî, bi heyîneke ku heye re têkildar e. Heyîneke ku kifş/diyar e vedibêje, ji wê heyînê perçeyekê radixe holê.*
***E-*** *Her berhema hunerî hilbera ked, dem û zehmetiyeke dirêj e. Jiber vê çendê jî, ji bo ku ew bibe xwediyê wateyekê, li hemberî wê jî divê heyîneke ku jê hez bike yan jî jê zewq bigre, hebe.*

**6- Brahmanîzm**: Navê bandêra olî û civakî ya ku ji aliyê Brahmanan ve hatiye damezrandin. Berdewama vedaîzmê

ye. Li gor vê baweriyê; ji bo ku rih bikaribe xwe bigihîne ***<mokşayê, rizgariyê>*** gellek rêyên cihêreng hene.
Lê bi taybetî du rê gelek girîng in. Yek ***<yoga>*** ye (çîlekêşiya rih û laş) û ya din jî ***<bhaktî>*** ye ku ev yek jî texlîdek temaşeya mîstîk e.
ing: brahmanism
fr: brahmanisme

**7-Deduksiyon**: Rêbazekê mentiqî a beravajiya enduksiyonê ye û di felsefeyê de jî tê bikaranîn. Di vê rêbazê de, ji pêşniyareke tevayî (tumelî) tê destpêkirin. Di dawiyê de jî, encamên tîkel (qismî) têne bidestxistin. Bi pirranî ji aliyê Arîstoteles ve hatiye bikaranîn û dîsa yê ku delk û şeklên bikaranîna vê rêbazê destnîşan kiriye, Arîstotelesî ye. Deduksiyonê heta dawiya Serdema Navîn jî, girîngiya xwe berdewam û hatiye bikaranîn.
Cihêrengiya deduksiyonê ya ji enduksiyonê ew e ku, encamên ku bi rêya deduksiyonê ve têne bidestxistin, encamên misoger in. Encam, bi awayekî bêgav ji aliyê pêşhatiyan ve têne destnîşankirin.

Mînakek bo vê rêbazê:
Hemû mirov bi mirin in. / pêşniyara tevayî
Sokrates jî mirovek e. / pêşhatî
Nexwe (heke wisa be) Sokrates jî bi mirin e. / encam

Ji mînakan jî tê dîtin ku encam bi awayekî bêgav, ji pêşhatiyan derdikeve. Rewşeka beravajiya vê yekê, ji ber ku wê rê li nakokiya aqil vebike, wê ne derbasdar be.
ing: deduction
fr: déduction

**8- Enduksiyon**: Rêbazeke felsefeyê ye û di vê rêbazê de, yeko yeko ji pêşniyaran, destpêkirin û gelemperîkirin heye. Li ser bûyerekê bi hejmareke pir zêde (n) çavdêrî têne kirin û di dawiyê de pêşniyara herî gelemperî tê bidestxistin.
Enduksiyon di roja me ya îroyîn de, ji aliyê gelek zanistan ve bi armanca bidestxistina zanayiyên eqlî, weke rêbazekî tê bikaranîn. Lê tiştek heye ku divê mirov vê yekê jî bibêje: Encamên ku bi rêya enduksiyonê têne bidest xistin, meriv nikare bibêje ku ew ji % 100 encamên misoger/qutebir in, ixtîmala ku ew encamên dibeyî bin jî heye.
Heta ku pêşniyarên pêşîn rast derkevin, tu pirsgirêk dernakevin holê. Lê dema ku yek pêşniyarek jî çewt be, wê demê encama ku tê bidestxistin jî, dê çewt be.

Çend mînakên vê rêbazê:
**A-** Sifir, lajwerdek/metalek e û dema ku mirov agir bide binê, tê perçivîn.
**B-** Çînko/tûtye lajwerdek e û dema ku mirov agir didê binê, tê perçivîn.
**C-** Alemyon, lajwerdek e û dema ku mirov agir dide binê, tê perçivîn.
**D-** Zêr, lajwerdek e û dema ku mirov agir dide binê, tê perçivîn.
**E-** Hesin, lajwerdek e û dema ku mirov agir dide binê, tê perçivîn.

Temamiya pêşniyarên li jorê, pêşniyarên pêşîn in. Ango, pêşhatî (pêşane) ne.
Encam: Nexwe/heke wisa be, hemû lajwerdekên ku têne germkirin, diperçivin.

Di mînaka jorîn de ger pêşniyarekê pêşîn çewt be, bêguman dê encam jî çewt derkeve. Lê heke tiştekî wiha pêk neyê, wê demê mirov dikare bibêje ku hemû lajwerdek dema ku têne germkirin, diperçivin.
ing: Induction
fr: induction

**9- Ezoterîk:** A ku ji hemû kesan re ne vekiriye, a ku ji bo fêhmkirina hemû kesan re ne hatiye nivîsandin, a ku ji bo mirovên kifş hatiye nivîsandin. Têgeha ku ji bo dazanînên veşartî hatiye bikaranîn.
ing: esoteric
fr: ésotérique

**10- Ehlaqa Xweşiyê / Hedonîzm:** Li gor vê dazanînê, reva ji êşê û qesidîna ber bi xweşiyê (yan jî zewqê) ve û ji tirsê rizgarbûn, bextewarî ye. Li gor vê felsefeyê, tiştên ku li xweşê mirov diçin, ew baş in û tiştên ku êşê didin mirov jî, ew xirab in.
Arîstîppos wiha bawer dike ku mirov bi awayekî xwezayî li pey xweşiyê dibeze. Li gor vê felsefeyê, derheqê baş û xirab de ji bilî xweşiyê tu pîvaneke din tune.
ing: hedonism
fr: hédonisme

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**Çavkanî: Ferhenga Felsefeyê – Ali Gurdilî**